# Çûna li Fînlandê

**Pirtûkçeyek ji bo penaberên kotayê yên li ser rêya Fînlandê**

mof.fi



Maahanmuuttovirasto
Migrationsverket
Finnish Immigration Service

IOM
UN MIGRATION

ASYLUM, MIGRATION AND INTEGRATION FUND
Supported by the European Union

**Dezgeha Koçberiyê ya Fînî (Migri)** saziyeke hikumetê ya ku girêdayî Wezareta Karê Hundurîn e. Ew bi kêşeyên têkildarî koçberiyê, niştecîbûnê, pirsgirêkên penaberiyê û welatîbûna Fînî re eleqedar dibe û biryaran distîne. Migri her wisa biryaran derbarê bûyerên ji nû ve bicihbûnê yên normal, lezgîn û acîl digire ku ji hêla UNHCR'ê ve ji Fînlandê re hatine radestkirin û xwedî berpirsiyarî ye li ser bernameya elimandina çandî ku ji bo wan penaberan e ku hêj hêj li derveyê welêt in beriya ku ew bikevin nav sînorê Fînlandê.

**Rêxistina Navnetewî ya Koçberiyê (IOM)** Rêxistineke Têkildar a Neteweyên Yekbûyî ye, û saziyeke sereke ye di qada koçberiyê de. IOM girêdayî vê prensîbê ye ku koçberiya mirovane û rêkûpêk bi kêrî koçberan û civakê bê.

**WEŞANGER**

**Dezgeha Koçberiyê ya Fînî (Migri)**
Opastinsilta 12 A
P.O. Qotiya postê 10
00086 Maahanmuuttovirasto
Fînland
Malpera webê: migri.fi
Rêveberê Projeyê: Marjo Mäkelä

**Rêxistina Navnetewî ya Koçberiyê (IOM)**
Ofîsa Welêt a Fînlandê
Unioninkatu 13, qata 6'emîn
P.O. Qotiya postê 851
00101 Helsinki
Fînland
Malpera webê: finland.iom.int
Kordînatorê Projeyê: Julia Jänis
Şêwirmend: Akseli Saviranta

Sêwirana grafîkê û bergsazî: Sopiva Design
Wêneya bergê: Sopiva Design

Hemû mafên wê parastî ne. Çi beşên wê weşanê bêyî destûra weşanger a nivîskî nabe ku ji nû ve bê hilberandin, li ser sîstemekê bê tomarkirin, an jî bi çi şêweyê, bi çi navgînî, elektronîkî, mekanîkî, bi qeydkirin an jî bi rêyeke din nabe ku bê veguhastin.

Ev proje (ev pirtûkçe jî tê de) ji hêla Fona Penaxwazî, Koçberî û Entegrasyonê ya Yekîtiya Ewropayê ve tê piştgirîkirin.

KURMANJI

Maahanmuuttovirasto
Migrationsverket
Finnish Immigration Service

IOM
UN MIGRATION

ASYLUM, MIGRATION AND INTEGRATION FUND
Supported by the European Union

# Çûna li Fînlandê

**Pirtûkçeyek Ji Bo Penaberên Kotayê Yên Li Ser Rêya Fînlandê**

mof.fi

Vê belgeyê online li navnîşana jêr peyde bikin
mof.fi/welcome
an jî koda QR a li jêr bidin diyarkirin

# Tabloya Naverokan

**Destpêk** ..... 5
- Hûnê Pirtûkçeya Çûna Li Fînlandê Li Ku Peyde Bikin .5
- Hûnê Pirtûkçeya Çûna Li Fînlandê Çawa Bi Kar Bînin .5
- Hûnê Pirtûkçeya Çûna Li Fînlandê Çima Bi Kar Bînin .6
- Pirsên Piranî Pirskirî ..... 7
- Nîşe ..... 8

**Fînland – Destpêkirina bi Civaka Fînî** ..... 9
- Warên Erdnîgarî û Nifûs ..... 11
- Rewşa Avhewayê ..... 13
- Dewlet û Şaredarî ..... 15
- Çavkaniyên Sereke yên Aboriyê ..... 17
- Edetên Çandî ..... 19
- Cihê Endamên Malbatê ..... 19
- Wek Koçber li Fînlandê ..... 20
- Bersiv ..... 25

**Amadekarî – Amadebûna ji Bicihbûnê re** ..... 29
- Amadekariya ji bo Çûna Mayinde ..... 31
- Belgeyên Rêwîtiyê û Sertîfîkayên Din ..... 33
- Perwerdehî û Pîlana Lêgerîna Kar ..... 34
- Amadebûna Derûnî ya ji bo Çûnê ..... 35
- Elimandina bi Çandeke Nû ..... 36
- Bersiv ..... 49

**Rêwîtî – Hatina li Fînlandê** ..... 51
- Amadekariya ji bo Firînê ..... 53
- Li Balafirgehê ..... 57
- Gehîştin ..... 58
- Bersiv ..... 60

**Jiyana rojane – Pêkanîna Jiyana Rojane** ..... 63
- Avahiyên Kirêkirinê ..... 65
- Meqbûz ..... 66
- Qayde û Rêgezên Giştî ..... 68
- Temîr û Zibil ..... 69
- Kirîn û Firotina li Şaredariya We ..... 71
- Banqe ..... 72
- Veguhastin ..... 73
- Cixarekişandin ..... 75
- Bersiv ..... 76

**Perwerdehî – Dibistan û Fêrbûn** ..... 79
- Xudankirina Rojane û Perwerdehiya Pêş-dibistanê .81
- Dibistana Giştî ..... 81
- Dibistana Navîn a Jortir ..... 85
- Hîndariya Pîşeyî ..... 85
- Perwerdehiya Bilind û Zanîngeh ..... 86
- Hîndariya Entegrasyonê ji bo Koçberan ..... 88
- Perwerdehiya Pîşeyî û Hîndariya ji bo Mezinan û Hîndariya Bazara Kar ji bo Mezinan ..... 88
- Akredîtasyona Tehsîl û Dereceyên li Derveyê Welêt Timamkirî ..... 90
- Pirtûkxane û Çalakiyên Dermufredatê ..... 91
- Bersiv ..... 92

**Kardarî – Karkirin li Fînlandê** ..... 95
- Pîlana Entegrasyonê û Hîndarî ji bo Koçberan ..... 97
- Lêgerîna Kar ..... 100
- Bacdayîn ..... 104
- Mecbûriyet û Mafên We ..... 106
- Çanda Kar a Fînî ..... 107
- Bersiv ..... 110

**Halxweşî – Tendurîstî û Xizmetên Halxweşiya Civakî** ..... 113
- Tenduristî ..... 115
- Ewlehiya Civakî ..... 118
- Alîkariya Entegrasyonê ..... 119
- Bersiv ..... 120

**Ziman – Destpêkirina bi Fînî** ..... 123
- Spartek ..... 125
- Bersiv ..... 136

**Lînk – Malperên Webê yên Zêdetir Kêrhatî ji bo Serlêdanê** ..... 143
- Xizmetên Gel û Agahdarî derbarê Fînlandê ..... 145
- Kardarî û Perwerdehî ..... 147
- Halxweşî û Maf ..... 148
- Malbat, Zarok û Ciwan ..... 149
- Yê din ..... 150

# Destpêk

Ev pirtûkçe ji hêla Dezgeha Koçberiyê ya Fînlandî û Rêxistina Navnetewî ya Koçberiyê, IOM, bi baldariyeke mezin hat amadekirin da ku ji we re wek kesên penaberê kotayê yên pejirandî yên ku li Fînlandê bên bicihkirin bibe alîkar ji bo ku hûn dest bi rêwîtiya xwe bikin. Ji kerema xwe pirtûka xwe ya xebatê bi xwe re bînin Fînlandê; ew dibe ku ji we re di gelek rewşan de pir bibe alîkar her ku hûn li civakeke nû bi cih dibin û hînî jiyana wê dibin.

Ev pirtûkçe bi tenê ji bo penaberên kotayê ye û ji bo kesên ku ji ber sedemên ji niştecîbûnê cudatir difikirin an jî xwe amade dikin ji bo çûna li Fînlandê nehatiye armanckirin. Penaberên kotayê xwedî pozîsyoneke cuda ne ji penaberên din an jî mirovên din ên ku ji ber sedemên cuda diçine Fînlandê, lewre agahiyên di nav vê pirtûkçeyê de li rewşa wan nayên.

## Hûnê pirtûkçeya Çûna li Fînlandê li ku peyde bikin

Ev pirtûkçe bi gelek şiklan berdest e. Ev pirtûkçe dikare bê çapkirin an jî hûn dikarin wek mînak li ser telefon, laptop an jî kompîtira xwe bi kar bînin.

Eger hûn bixwazin pirtûkçeyê vekin an jî wê daxînin, biçin malpera webê ya Çûna li Fînlandê bi nivîsandina navnîşana mof.fi li ser kuncê navnîşanê ya lêgerînera xwe, û versiyona bi zimanê xwe bibijêrin. Hûn dikarin beşên cuda jî daxînin li ser mof.fi bi serlêdana qismê malpera webê ya ku hûn dixwazin bibînin û li wir lînka daxistinê bitikînin. Wek mînak, eger hûn dixwazin modula Jiyana Rojane daxînin, biçin jêra rûpelê û bitikînin li ser şîşika gewr ê vekirî ya lînka daxistinê. Di vê pirtûkçeyê de, li destpêka her yek modulê, lînkek jî heye ku dikare ji bo modula online bê bikaranîn.

Ji bo daxistina modulan, divê girêdana we ya bi înternetê hebe. Eger ji bo girêdana înternetê hewce bi dayîna pereyî hebe, dayîna wê heqê dibe berpirsiyariya we. Dezgeha Koçberiyê ya Fînî dê heqê wan lêçûnan nede. Dema ku hûn li Fînlandê bin, hûn dikarin li pirtûkxaneyên giştî girêdana înternetê ya heyî bi kar bînin.

## Hûnê pirtûkçeya Çûna li Fînlandê çawa bi kar bînin

Ev pirtûkçe bi neh modulan dabeş bûye. Modul ji Fînlandî, Amadekarî, Rêwîtî, Jiyana Rojane, Perwerdehî, Kardarî, Halxweşî, Ziman, û Peywendî pêk tên.

Her yek modul bala xwe dide ser mijareke taybet, û agahiyên sereke yên ku hûn dikarin hîn bin û niqaş bikin dide we. Ew modul ji hev û din serbixwe ne. Ji we re tê pêşniyarkirin ku hindî ji destê we hat hûn zêde modulan bixwînin da ku şixulên entegrasyona xwe baştir bizanin.

Her modul xwedî rengê xwe yê cuda ye. Rûpela yekem a her yek modulê lînkên qismê dersê û beşa spartekan a modulê digire nav xwe; her du jî wek online di malpera webê ya Çûna li Fînlandê de berdest in.

Modul çend spartekan û peywîrên zêdeyî digirin nav xwe. Cureyên cuda yên spartekan hene. Wek mînak, di hin spartekan de divê hûn pirsan bixwînin û bersiva

wan bidin, di hinekan de bersivên zêde vebijark hene, û di hinekan de jî divê hûn li gel yên din bifikirin û niqaş bikin li heyama hînbûna pêş-derketinê. Her yek spartek xwedî ravekirinên hêsan e.

Spartek ê tecribeya we ya hînbûnê û zanînên we yên derbarê Fînlandê kûrtir bike. Peywîrên zêdeyî dê agahiyên pêreyî bidin û dê zanînên we yên derbarê mijaran kûrtir bike. Hûn dikarin spartekan û peywîrên zêdeyî bi serê xwe, bi komê re an jî bi alîkarê xwe çêbikin li heyama hînbûna pêş-derketinê.

Bersivên spartekên modulê dikare li dawiya her yek modulê bê dîtin.

Di her yek modulê de, hûn dikarin kodên Bersivên Zûka (QR) peyde bikin. Koda QR dişibe vê:

Kodên QR lînkên bi şiklê wêneyan in, û dikarin ji bo gehîna malperên webê bên bikaranîn. Ji bo gehîna malperên webê ya bi kodên QR, divê hûn girêdana xwe bi înternetê çêbikin.

Hûn dikarin kodên QR bi kameraya telefona xwe ya jîr bidin nîşandan. Bi hin telefonên jîr, pêwîstiya we bi sepaneke cuda heye ji bo xwendina kodên QR. Li ser Android, hûn dikarin sepaneke nîşandinê ya kodên QR ji dikana Google Play daxînin. Li ser iPhone, hûn dikarin sepaneke nîşandinê ya kodên QR ji dikana App Store daxînin. Li ser Windows Phone, hûn dikarin sepaneke nîşandinê ya kodên QR ji dikana Windows App Store daxînin. Li ser Sailfish OS, hûn dikarin sepaneke nîşandinê ya kodên QR ji Sailfish App Repository an jî ji embarên din daxînin. Sepana nîşandinê ya koda QR bidin destpêkirin û li gor telîmatan bidomînin.

## Hûnê pirtûkçeya Çûna li Fînlandê çima bi kar bînin

Wek penaberek kotayê, hûn dikarin vê pirtûkçeyê beriya, heyama û piştî hînbûna pêş-derketinê bi kar bînin. Em we bi taybetî teşwîq dikin ku hûn wê pirtûkçeyê bi baldarî bixwînin. Ev pirtûkçe di heman demê de wisa hatiye sêwirandin da ku pêvajoya we ya hînbûna serbixwe teşwîq bike. Hûn dikarin çi dema ku hûn bixwazin wek online bi tikandina ser mof.fi a di lêgerînera xwe ya înternetê de xwe bigihînin vê pirtûkçeyê, ku we ber bi malpera webê ya Çûna li Fînlandê dibe. Dema hûn vê pirtûkçeyê bi kar bînin, her tim dêna xwe bidin malpera webê ya Çûna li Fînlandê ku li wir hûn ê zêdetir agahî derbarê Fînlandê peyde bikin.

Hûn bi taybetî tên teşwîqkirin da ku dest bi amadekariyên ji bo bicihbûnê bikin, û ev pirtûkçe yek ji wan amrazan e ku Dezgeha Penaberiyê ya Fînî dide ber destê we da ku derfetên we yên hînbûnê bi pêş bixîne. Piraniya spartekan dikarin ji hêla herkesî ve bên çêkirin bêyî ku temenê wan, zayenda wan, asta wan a perwerdehiyê, an jî faktorên din li ber çav bigire. Hin spartek dibe ku çetîn bin û hin jî hêsan bin – her wekî qonaxên cuda yên rêwîtiya we ya ber bi Fînlandê.

Bînin bîra xwe ku hewldanên we yên hûnbûnê dê bên xelatkirin û ew ê piştgiriyê bidin jiyana we ya nû ya li welatê we yê nû.

De ka em dest bi hînbûna derbarê Fînlandê û zimanê Fînî bikin.

# Pirsên piranî pirskirî

## 1. Li ku ez dikarim Fînî hîn bibim?

Hûn dikarin hinek Fînî di modula ziman de hîn bibin. Her wiha, hûn dikarin biçin mof.fi û piştre serlêdana beşa ziman bikin. Hûn ê gelek lînkan bibînin ku di pêvajoya hînbûnê de alîkariya we bikin. Berî û piştî bicihbûna xwe ya li Fînlandê hûn dikarin serlêdana malpera webê bikin. Tê pêşniyarkirin ku mirov di dema zûtirîn de dest bi hînbûna ziman bike, heta beriya çûna li Fînlandê.

## 2. Li ku ez dikarim agahiyan derbarê kar peyde bikim?

Hûn dikarin agahiyên derbarê kar di modula kardariyê de peyde bikin.

## 3. Ez nikarim lînkên daxistina pirtûkçeyê peyde bikim. Ez çi bikim?

Lînk di destpêka her yek modulê de cih digirin. Hûn dikarin navnîşanê di lêgerînera xwe ya înternetê de binivîsin an jî kodên QR bi kar bînin. Eger ji we re zêdetir agahî lazim bike li beşa pirtûkçeyê Çûna Li Fînlandê Çawa Bi Kar Bînim binêrin.

## 4. Malpera webê berdest nîne. Ez çi bikim?

Girêdana xwe ya bi înternetê venêrin û piştî demekê hewl bidin ku dîsa serlêdana malpera webê bikin.

## 5. Min nekarî ez hemû spartekan çêbikim. Ez çi bikim?

Hûn her tim dikarin hewl bidin ku spartekan dubare çêbikin dema ku wextê we hebe. Gelek tê pêşniyarkirin ku hûn hemû spartekan çêbikin û bersivên hatine dayîn bixwînin. Hûn dikarin li gel hevalekî an jî li gel endamekî malê niqaş bikin û ji wan alîkariyê bixwazin.

## 6. Min hemû spartek çêkirin. Li ku ez dikarim zêdetir peyde bikim?

Serlêdana mof.fi bikin û li beşên ziman û lînkan venêrin. We peywîrên zêdehî jî çêkirin, ku di hin modulan de peyde dibin?

## 7. Ez dikarim vê pirtûkçeyê parve bikim?

Ev pirtûkçe bi tenê ji bo penaberên kotayê ye û ji bo penaberên din û mirovên din ên ku bi sedemên cuda diçin Fînlandê nehatiye amadekirin. Lewre agahiyên di vir de dabînkirî bi kêrî rewşa wan nayê.

# Nîşe

Bêyî ku bi şiklekî din nehatibe diyarkirin, wêneyên di nav vê pirtûkçeyê de heyî ji bo bikaranîna giştî ne. Eger bi şiklekî din hatibe destnîşankirin, wêne malê weşanger in û di vê pirtûkçeyê de bi tenê ji bo armancên hînbûnê xuya dibin.

Pirtûkçe bi rêya mînak û spartekan derbarê Fînlandê agahiyên sereke dide. Bersiv dibe biguherin û mirov nawestînin. Her çiqas gelek xebat hatibin kirin da ku agahî rojane bin jî, Dezgeha Koçberiyê ya Fînî û Rêxistina Navnetewî ya Koçberiyê berpirsiyariya zirarên rasterast û nerasterast ên ji ber xeletiyên naverokê nagire ser xwe. Her wisa, Dezgeha Koçberiyê ya Fînlandî û Rêxistina Navnetewî ya Koçberiyê ji bo materyalên ku ji hêla dezgehên derveyî hatine amadekirin berpirsiyar nîne her çiqas lînkên wan parve bike jî.

Fikrên ku di weşanê de cih digirin yên weşanger in û nêrînên Rêxistina Navnetewî ya Koçberiyê an jî yên Dezgeha Koçberiyê ya Fînlandî nîşan nade. Teswîrên di weşanê de cih digirin û pêşkêşkirina materyalan fikrên IOM an jî fikrên Dezgeha Koçberiyê ya Fînî yê derbarê rewşa fermî ya welatekê, herêmekê, bajar an jî deverekê, an jî derbarê rayedarên wan, an jî derbarê sînor û cirantiya wan rave nake.

Mafên bikaranînê yên vê belavokê aîdî Dezgeha Koçberiyê ya Fînî ye û bi Rêxistina Navnetewî ya Koçberiyê re tê parvekirin. Ev pirtûkçe ji bo jêgirtinek derbarê Dezgeha Koçberiyê ya Fînî dikare bê bikaranîn.

# Fînland

**Destpêkirina bi Civaka Fînî**



Fînland li ku ye? Mirovên Fînî çawa nin?
Maf û mecbûriyetên niştecîyên Fînî çi ne?
Di vê beşe de, hûn ê derbarê wan û zêdetir hîn bibin.

**Di vê modulê de, hûn ê derbarê wan hîn bibin:**

- Warên erdnîgarî û nifûs
- Rewşa avhewayê
- Dewlet û şaredarî
- Çavkaniyên sereke yên aboriyê
- Edetên çandî
- Cihê endamên malbatê
- Wek koçber li Fînlandê

**Derbarê vê modulê li navnîşana jêr bixwînin mof.fi/sections/finland/en an jî koda QR a li jêr bidin diyarkirin**

**Vê modulê online di vê navnîşanê de peyde bikin mof.fi/exercises/finland/en an jî koda QR a li jêr bidin diyarkirin**

# Warên erdnîgarî û nifûs

Fînland li bakurê cîhanê bi cih bûye û dikeve navbera Swêd û Rûsyayê. Li bakur, Fînland li gel Norwêcê xwedî sînor e. Estonia li hêla başûr a Fînlandê ye. Li Fînlandê zimanên fermî Fînî û Swêdî ne. Gelheya Fînlandê derûdora 5.5 mîlyon mirov e. Bi qasî 250 000 axaftvanên bi zimanên biyanî hene li welêt.

1. Ji nav metnê, dorhêla welatên ku cîranên Fînlandê ne xêz bikin?

   Estonia | Rûsya | Swêd | Fransa | Almanya | Kanada | Norwêc

2. Hûn navê parzemîna ku Fînland tê de cih digire dizanin?

   ______________________________

   ______________________________

3. Li rûpela pêş nexşeyek heye. Cihê Fînlandê di nexşeyê de nîşan bidin.

4. Li ser heman nexşeyê, ji cihê ku hûn lê ne ta Fînlandê rêçekê xêz bikin. Li gor fikra we firîneke bi balafirê ji cihê hûn lê ta Fînlandê çiqas wext digire? Vê yekê bi malbata xwe an jî hevalên xwe niqaş bikin.

5. Li ser heman nexşeyê, rêçên din ên welatên din xêz bikin ku hûn di nav re derbas bûne.

!


- Fînland li Bakurê Ewropayê ye.
- Cîranên Fînlandê Swêd, Norwêc, Estonia, û Rûsya ne.
- Zimanên fermî yên Fînlandê Fînî û Swêdî ne; dîsa jî Fînî zêdetir tê axaftin.



# Rewşa Avhewayê


**Fînland çar demsalan jî dibîne: bihar, havîn, payîz û zivistan. Her yek demsal pêwîstî bi cil û bergên cuda dibîne û xwedî çalakiyên derve yên xweserê xwe ye.**

1. De ka em li wêneyên li jêr binêrin. Kîjan ji Fînlandê nehatiye kişandin?
2. Rewşa avhewayê ji welatê we an jî ji welatê hûn niha lê ne cudatir e?
   Li gor fikra we rewşa hewayê dibe ku çawa bandorê li ser jiyana we ya li Fînlandê bike?


a


b


c


d


e


f


g



h


i


j


k


l


m



n



o

# Dever û şaredarî


**1.** De ka em li nexşeyê binêrin. Navên herêm û bajaran li jêr in.

**1** Uusimaa
**2** Varsinais-Suomi
**3** Satakunta
**4** Kanta-Häme
**5** Pirkanmaa
**6** Päijät-häme
**7** Kymenlaakso
**8** Etelä-Karjala
**9** Etelä-Savo
**10** Pohjois-Savo
**11** Pohjois-Karjala
**12** Keski-Suomi
**13** Etelä-Pohjanmaa
**14** Pohjanmaa
**15** Keski-Pohjanmaa
**16** Pohjois-Pohjanmaa
**17** Kainuu
**18** Lappi
**19** Ahvenanmaa






Niha jî em li nîşaneyên herêman binêrin.














Fînland bi herêman ve dabeş bûye, û her herêm jî bi şaredariyan ve dabeş bûye. Di vê spartekê de, hûn ê cih û taybetiyên her yek herêmê û cihê hin bajaran hîn bibin. Hûn ê vê yekê bi xwendina terîfkirinên derbarê herêman ên li jêr û bi venêrîna alên rûpela pêş pêk bînin. Hewl bidin bizanin ka kîjan herêm xwedî kîjan alê ye. De ka em hemû terîfkirinan bixwînin beriya destpêkirinê.

**a.** **Ahvenanmaa**: Ew herêma herî biçûk a Fînlandê ye, û ew der xweser e û bê leşker e. Ala wê ala tekane ye ku di ser de xezal heye.

**b.** **Etelä-Karjala**: Ala wê du şûr in. Lappeenranta li vî herêmê ye.

**c.** **Etelä-Pohjanmaa**: Seinäjoki li vî herêmê ye. Li ser ala wê çend semûr hene li ser zemîneke şîn

**d.** **Etelä-Savo:** Li ser alê tîr û kevanek heye ku hêla we ya rastê armanc dike, û ev herêm cîranê Kymenlaakso'yê ye. Gola herî mezin a Fînlandê, Gola Saimaa, li vir e.

**e.** **Kainuu**: Ev ala dişibe ya Pirkanmaa'yê lê li şûna sor rengê kesk li ser e. Kajaani li vir e.

**f.** **Kanta-Häme**: Hämeenlinna serbajarê vê herêmê ye. Li ser alê sê stêrk, çar kulîlkên spî, û heywanek heye.

**g.** **Keski-Pohjanmaa**: Li ser alê yek semûr heye. Kokkola li vir e.

**h.** **Keski-Suomi**: Li ser alê teyrek reş heye. Jyväskylä li vir e.

**i.** **Kymenlaakso**: Li ser alê masîyek heye. Kotka li vir e.

**j.** **Lappi**: Ev ala bajarê herî mezin û yê herî li bakur e, ku Rovaniemi li vir e.

**k.** **Pirkanmaa**: Rengên li ser vê alê bi tenê sor û zer in. Tampere li vir e.

**l.** **Pohjanmaa**: Li ser vê alê semûrên sor hene. Vaasa li vir e.

**m.** **Pohjois-Karjala**: Li ser vê alê du şûr û tacek heye. Gola Hattuvara, ku warê rojhilat ê herî dûr ê Fînlandê û qada Schengen'ê ye, li vir e.

**n.** **Pohjois-Pohjanmaa**: Li ser vê alê hijmareke du car zêde ya semûran heye li gor cîranê xwe yê li başûr. Oulu li vir e.

**o.** **Pohjois-Savo**: Li ser vê alê tîr û kevanek heye. Kuopio bajarê herî mezin ê herêmê ye.

**p.** **Päijät-Häme**: Li ser vê alê serperî û çivîkek heye. Lahti li vir e.

**q.** **Satakunta**: Li ser vê alê heywanekê şûrek girtiye destê xwe. Pori li vir e.

**r.** **Uusimaa**: Li ser vê alê kelekek heye. Helsinki li vê herêmê ye.

**s.** **Varsinais-Suomi**: Li ser vê alê du nîşaneyên şîn û zer hene. Turku li vê herêmê ye.

**!**

- Fînland welatekî mezin e, û her herêma li Fînlandê xwedî derfetên xwe yên cuda û dîroka xwe ye.
- Hûn ê li şaredariyekê bijîn. Hemû şaredarî ji bo mirovên nûhatî derfetên entegrebûnê çêdikin.

# Çavkaniyên sereke yên aboriyê

Hûn derbarê Fînlandê heya niha çiqas agahî dizanin, derbarê mirovên wê, çanda wê, û aboriya wê? De ka em pirs û bersîvên li jêr bixwînin.

**a.** Fînland û Swêd tekane komar in di nav welatên Bakurî de?

**b.** Fînland wek pere euroyê bi kar tîne?

**c.** Makîne û dar dervefiroşiyên girîng ên Fînlandê ne?

**d.** Daristan wan rojan ji bo piraniya Fînîyan derfetên kar çêdike?

**e.** Qadên teknolojî û xizmetê hijmarên zêde yên gelê Fînî digire li ser kar?

**f.** Li Fînlandê deh milyon însan dijîn?

**g.** Gelê Fînî ji bo Fînlandê naveke cuda bi kar tîne?

**h.** Îngilîzî li Fînlandê zimaneke fermî ye?

**i.** Li Fînlandê werzîşeke bi navê fûtbola çelpaxê heye?

!

- Beşeke mezin a axa Fînlandê daristan e.
- Qadên teknolojî û xizmetê hijmareke zêde yê gelê Fînî digire li ser kar.

# Edetên çandî

De ka em careke din li malpera webê ya dersê binêrin. Lînk li destpêka vê modulê dikare bê dîtin. We ev dît? Ew dişibe mof.fi/sections/finland/en û hûn dikarin gelek zanyariyan bi dest bixin ku dê ji we re bibe alîkar ku hûn peyvên winda yên vê sparteke peyde bikin.

**a.** Desthejandin û ______________________________ edetên slavdayînê ne li Fînlandê.

serhejandin   hembêzkirin   destlêdana li dufinê hev û din

**b.** Fînî piranî bi kesekî nenas re axaftinê dikin bi awayekî ____________________________.

lezgîn   bi baldarî

**c.** Ji ber vê yekê gelê Fînî dibe ku wek şermoke û ______________________ xuya bikin. Gelek caran Fînî di nîqaşên giştî de daxwaza axaftinê zêde nakin û zûka behsa mijarê dikin.

kêfxweş   bêrêz   nekubar

**d.** Wekhevî û edalet ji bo Fînîyan nirxên girîng in. Her wisa, Fînî duristî û girtina ________________________dipejirînin. Xebat û jêhatêbûn gelek tên pejirandin. Demkîbûn û girêdana bi demên biryardayî girîng e.

mesafeya şexsî   bi xwe re   sozan

**e.** Hin mirovên li Fînlandê gelek alkolê bi kar tînin bi taybetî li__________________________ û li betlaneyên taybet ên cejnan, ku ew tişt koçberan dibe şaş û metel bihêle. Bikaranîna zêde ya alkolê dibe bibe sedemê nexweşiyan û kêşeyên nav malbatan.

roja yekem a mehê   roja yekem a hefteyê   dawiya hefteyan

**Peywîra zêdeyî!**
Roja Serxwebûna Fînlandê 6'ê Îlonê ye.

RAST   XELET

**!**

- Di nav nirxên Fînî de wekhevî, edalet, û duristî hene.
- Tawanbarî û tundî qet nayê qebûlkirin.
- Demkîbûn gelek biqîmet e, hem ji hêla pîşeyî û hem jî şexsî ve.

# Cihê endamên malbatê

**Li Fînlandê, karûbarên malbatî û cureyên wan cihê ne û dibe ku ji yên ku hûn pê aşîna ne cudatir bin.**

**1.** Di spartekên jêr de, hûn di ser lînkê re an jî bi diyarkirina koda QR serlêdana malpereke webê bikin û derbarê wekheviya li Fînlandê zanyariyan bixwînin. Rûpela webê li ser malpereke webê ya bi navê InfoFinland e. Serlêdana InfoFinland gelek tê teşwîqkirin ji ber ku ew zanyariyên kêrhatî dide.

infofinland.fi/en/information-about-finland/finnish-society/equality-and-non-discrimination

De ka em tîrekê bikişînin da ku hevokekê saz bikin ku tiştekî hûn ji metnê dixwînin terîf bike.

| | | | |
|---|---|---|---|
| a | Li gor qanûna Fînî, jin û mêr | her tim sûc e. | u |
| b | Meaşeke zêde divê ji mêr re bê dayîn | divê li ber çav bê girtin dema biryarên derbarê wan tên girtin. | v |
| c | Zarok zwedî maf in ku fikrê wan jî hebin | qedexe ye û dibe ku bibe sedemê cezagirtinê. | w |
| d | Tundiya ku li nav malbatê û di têkiliyekê de çêdibe, wek tundiya fîzîkî û cinsî, | xwedî heman mafan in. | x |
| e | Li gor qanûna Fînî, lêdana zarokan | bêyî wekhevî û daxilbûn. | y |
| f | Çareseriyên ji kêşeyên cîhanê re dê peyde nebin | li gor jinekê li ser esasê zayendê. | z |

**Peywîra zêdeyî!**
Kîjan salê Fînland bû yekem welat di cîhanê de ku qanûnek derxist ku destûr da jin hem dengdayînê bidin û hem jî di hilbijartinê de bibin namzet?

1906    1926    1946

!

- Jin û mêr, kur û keç wekhev tên qebûlkirin li Fînlandê.
- Zarok, an jî kesên din bi çi cureyê tundiyê nabe bên cezakirin; nabe bên lêdan, qutan, porkişandin, an jî nabe bibin mijara şêweyeke tundiyê.
- Fînland xwedî sîstema kreşê ye, û hemû zarokên navbera 7 û 17 diçin dibistana seretayî û navîn. Gehîna bi dibistanan û perwerdehiya zaroktiyê ya zû bi qanûnan hatiye misogerkirin.

# Wek koçber li Fînlandê

**Li Fînlandê, koçberên xwedî statuya fermî, wek penaberên kotayê, endamên tam ên civakê ne û xwedî heman mafên sîvîl û mecbûriyetan in wek niştecîyên din ên li Fînlandê.**

1. Ji bo çêkirina vê sparteke, hûn dikarin di ser lînkê re an jî bi koda QR serlêdana rûpeleke webê bikin. Bijartineke vê rûpela webê tê de heye, lê metna tam bi tenê li ser rûpela webê tê gihandin.

   De ka em metnê bixwînin:
   infofinland.fi/en/living-in-finland/settling-in-finland/your-rights-and-obligations-in-finland

Herkes xwedî mafê tevgerandina wekhev e. Çi kes nabe ku bi awayekî cuda bê tevgerandin li gor zayend, temen, dîn an jî kêmasiya xwe, wek mînak. Herkes xwedî maf e ku bi awayekî azad fikrên xwe bi devkî an jî nivîskî îfade bike. Çi kes cezayê îdamê nagire û nabe bê êşkencekirin. Herkes xwedî mafê parastina jiyana xwe ya taybet e. Herkes azad e ku dînê xwe bibijêre. Eger hûn nexwazin, pêwîst nake ku hûn dînekê bibijêrin.

Biyaniyên ku bi şiklekî daîmî li Fînlandê niştecî ne ku temenê wan li jor 18 salî ye xwedî maf in ku di hilbijartinên şaredariyê de dengdayînê bidin. Biyaniyên ku xwedî mafê dengdayînê ne di hilbijartinên şaredariyê de di heman demê de dikarin beşdarî hilbijartinên şaredariyê jî bibin. Hemû mirovên ku li Fînlandê niştecî ne divê li gor qanûnên Fînî tevbigerin.

Dibistana mecbûrî (oppivelvollisuus) ji yek-salê perwerdehiya pêş-dibistanê ji bo zarokên 6-salî û neh-salên perwerdehiya sereke ji bo zarokên navbera temen 7–16 salî pêk tê, ku divê ew mufredata dibistana giştî (peruskoulu) timam bikin. Dêûbav xwedî berpirsyarî ne ku zarokên xwe xudan bikin. Dema qezayek çêbû herkes mecbûr e ku alîkariyê bike.

Piştî ku we metn xwend, de ka em pirsan bixwînin û bersiva wan bidin.

**a.** Hemû koçber dikarin dengdayînê bidin û beşdarî hilbijartinên şaredariyê bibin?

**b.** Hûn mecbûr in li Fînlandê dînekê bipejirînin?

**c.** Perwerdehiya mecbûrî şeş salan didomîne?

**d.** Destûra cezayê kuştinê heye?

**e.** Mafên dînî û axaftina serbest li Fînlandê tê vê wateyê ku civakên Musilman li şûna qanûna Fînî qanûna Îslamî bişopînin?

!

- Li Fînlandê, hûn dikarin bi awayekî azad û şexsî çi tişta ku dixwazin bikin bi şertê ku hûn hurmetê nîşanî qanûnan bidin.
- Li Fînlandê, hûn dikarin baweriya xwe bi rayedaran re bînin.
- Li Fînlandê, herkes xwedî heman maf û mecbûrîyetan e.
- Herkes wekhev e, û mirov hurmetê li hev digirin û alîkariya hev û din dikin.

**2.** Entegrebûna baş a bi civaka Fînî hewldana hînbûna zimanê lokal pêwîst dike. Nêzikî 90% gelê Fînî bi zimanê Fînî diaxive wek zimanê dayîkê. Pêwîstiya we dê bi zanîna zimanên Fînî an jî Swêdî çêbe di xwendin, xebat û jiyana rojane de. Hindî ku hûn di zimanê lokal de zûtir hînî şiyanên sereke bibin, ewqas zûtir hûn ê entegre bibin ji bo civaka Fînî. Di dawiya wê pirtûka xebatê de slavdayîn û peyvên sereke yên bi zimanê Fînî binêrin!

De ka em bêtir derbarê wan du zimanên netewî bixwînin:
infofinland.fi/en/living-in-finland/finnish-and-swedish/why-should-i-study-finnish-or-swedish

De ka em pirsan bixwînin û bersîva wan bidin.

**a.** Her du zimanên netewî yên Fînlandê çi ne?

---

**b.** Eger hûn bixwazin li Fînlandê bixwînin an jî bixebitin, divê hûn destpêkê çi bikin?

---

---

**c.** Çi qenciyên din wê hebin eger hûn zimanê lokal hîn bibin?

---

---

**d.** Zanîna bi Fînî an jî Swêdî ji bo bidestxistina mafê hemwelatîbûna Fînî pêwîstiyek e?

---

**e.** Peywîra zêdeyî: Çend hevokên girîng ên Fînî binêrin û hewl bidin ku wan bibêjin: infofinland.fi/en/living-in-finland/finnish-and-swedish/important-sentences-in-finnish

- Entegrebûn kedê dixwaze: Berpirsyariyeke we ya şexsî heye ku hûn ziman hîn bibin û li firsetan bigerin.
- Tevgerên Fînîyan ên li hember koçberan piranî dostane ne.
- Tawanbarî li gor qanûnê li Fînlandê qedexe ye.

Piştî ku we modul niha xilas kiriye, de ka em bi nivîsîna fikrên girîng wan dubare bikin ku hûn derbarê wan her yek temayên jêr hîn bûn!




- Fînland ê bibe mala we ya nû. Hindî ku zêde zanyarî hûn bizanin, ewqas baştir e. De ka em bala xwe bidin ser hînbûna Fînî û de ka em wextê pêwîst bike pirsan bikin.

# Bersiv

## Warên erdnîgarî û nifûs

**1.** Estonia | Rûsya | Swêd | Fransa | Almanya | Kanada | Norwêc

**2.** Ewropa

**3.** Cihê Fînlandê li ser nexşeyê ya li jêr e.



**4.** Bersiv cihê ne; ji mamosteyê xwe bipirsin an jî motora lêgerînê bi kar bînin.

**5.** Bersiv li gor dîroka we ya şexsî diguherin.

## Rewşa avhewayê

**1.** Wêneyên ku ne ji Fînlandê ne ew in: b, g, l, m, û o.

**2.** Bersiv cihê ne, dîsa jî hûn ê pêwîstî bi xwe amadekirina ji bo hewa sar bibînin. Li demsalên cuda hûn dikarên çalakiyên cihê yên derve bikin, wek li havînê avjenî û li zivistanê xwe şemitandin. Li zivistanê, dereceya hewayê li derve dibe kêm be, lê bi saya serê sîstema germkirinê ya li malan heyî, hewaya hundir seranserê salê germ e, û jiyaneke çalak her wextê mimkun e.

## Dewlet û şaredarî

**1.** Nexşeyek bi nav û alayên herêman dikarin li jêr bên dîtin.



## Çavkaniyên sereke yên aboriyê

**1.** Bersiv li tabloya jêr dikarin bên dîtin.

| | | |
|---|---|---|
| a. | Na | Di nav welatên Bakurî de, bi tenê Fînland û Îzland komar in. Swêd, Danîmark, û Norwêc qraltî ne. |
| b. | Erê | |
| c. | Erê | Elektronîk, kîmyewî, û makîneyên giran jî dervefiroşiyên girîng in. |
| d. | Na | Di paşerojê de, daristan ji bo gelek Fînîyan çavkaniya aboriyê bû, lêbelê li wan rojan ji ber ku cotkarî bûye karekî mekanîk, ew ancax bi tenê hijmareke biçûk a kar dabîn dike. |
| e. | Erê | Gelek Fînî di qada teknolojiyê de dixebitin û gelek şîrketên Fînî daxilî nav sektorên teknolojî û xizmetê ne. Şîrketa navdar a bi navê Nokia li Fînlandê ava bû, û navê şîrketê ji bajarê Nokia tê; ku divê hûn herin serlêdana wê derê! |
| f. | Na | Di sala 2017'an de nifûs 5.5 milyon bû. Binêrin ka çiqas mirov li Fînlandê dijîn bi rêya serlêdana malpera webê ya Dezgeha Xizmeta Daneyên Dîjîtal û Nifûsê ya wê navnîşanê dvv.fi. |
| g. | Erê | Navê Fînlandê yê bi zimanê Fînî Suomi ye. |
| h. | Na | Bi tenê Fînî û Swêdî fermî ne, ku zimanê herî zêde li welêt tê bikaranîn Fînî ye. |
| i. | Erê | We bi wê bawer nekir? Derbarê wê di Wikipedia de bixwînin bi serlêdana lînka han en.wikipedia.org/wiki/Swamp_football. |

## Edetên çandî

**1.** Bersiv li tabloya jêr dikarin bên dîtin.

| a. | b. | c. | d. | e. |
|---|---|---|---|---|
| serhejandin | bi baldarî | bêrêz | sozan | dawiya hefteyan |

**Pirsa zêdeyî:** Xelet. Roja Serxwebûna Fînlandê 6'ê Berfanbarê ye.

## Cihê endamên malbatê

**1.** Bersiv li tabloya jêr dikarin bên dîtin.

| a. | b. | c. | d. | e. | f. |
|---|---|---|---|---|---|
| x | z | v | u | w | y |

**Pirsa zêdeyî:** 1906

## Wek koçber li Fînlandê

**1.** Bersivên pirsên di rûpel 20–21 de

| | |
|---|---|
| a. | Bi tenê biyaniyên ku bi şiklekî daîmî li Fînlandê niştecî ne ku temenê wan li jor 18 salî ye xwedî maf in ku di hilbijartinên şaredariyê de dengdayînê bidin û wek namzet beşdarî wê bin. |
| b. | Herkes azad e ku dînê xwe bibijêre. Eger hûn nexwazin, pêwîst nake ku hûn dînekê bibijêrin. |
| c. | Perwerdehiya mecbûrî ji bo kesên navbera temenê 6–16 ye. |
| d. | Çi kes nabe ku cezayê îdamê bigire. |
| e. | Civakên dînî, Xirîstiyanî, Cihû, Musilman, Hîndû, û yên din jî di nav de serbest in ku ferzên xwe yên dînî pêk bînin, lê divê li gor qanûna Fînî tevbigerin. Li Fînlandê, Qanûnên Fînî di ser qanûnên dînî ne. |

**2.** Bersivên pirsên di rûpel 22 de:

| | |
|---|---|
| a. | Fînî û Swêdî |
| b. | Ziman bixebitin |
| c. | Domandina jiyana rojane û hevaltiya bi Fînîyan re |
| d. | Erê |

# Amadekarî

**Amadebûna ji bicihbûnê re**



Beriya derketina we, hin amadekarî divê bên kirin. Li kêleka çentê xwe, divê hûn ji hêla derûnî ve jî xwe amade bikin ji bo rêwîtiyê.

**Di vê modulê de, hûn ê derbarê wan hîn bibin:**

- Çawa amadekariya ji bo çûna mayinde bikin
- Tiştên herî girîng çi ne ku hûn bi xwe re bibin
- Çawa amadekariya ji bo entegrasyonê bikin
- Şoqa çandî çi ye û mirov çawa dikare xwe jê xilas bike

**Derbarê vê modulê li navnîşana jêr bixwînin [mof.fi/sections/preparing/en](mof.fi/sections/preparing/en) an jî koda QR a li jêr bidin diyarkirin**

**Vê modulê online di vê navnîşanê de peyde bikin [mof.fi/exercises/preparing/en](mof.fi/exercises/preparing/en) an jî koda QR a li jêr bidin diyarkirin**

# Amadekariya ji bo çûna mayinde

De ka em metna jêr bixwînin.

Wek penaberê kotayê hûn û kesên nav dosyeya we ya serlêdanê bûne xwedî statuya penaberiyê, destûra daîmî ya niştecîbûnê, û mafê karkirinê li Fînlandê. Girîng e ku hûn li gel endamên malbata xwe derbarê xasyetên çûna mayinde û wateya wê biaxivin, û ya baş ew e ku hûn bi hev re amadekariya rêwîtiyê bikin. Li pêş we hawirdoreke nû ya jiyanê û mirovên xwedî edet û kevneşopiyên cuda hene, û ew ê bi we re bi zimanekî nû biaxivin.

Derbarê pirsên jêr li gel malbat û hevalên xwe biaxivin. Eger endamekî malbata we nivîsandinê nizane, hûn dikarin alîkariya wan bikin.

**1.** Piştî çûna xwe ya Fînlandê, hûn dixwazin çi tiştê pêk bînin? Hûn dil dikin malbatekê çêbikin? Pere qazanc bikin? Xwedî aramî û hişeke rehet bin? Ji bo xwe û malbata xwe firsetên perwerdehiyê piştrast bikin? Tiştek din?

______________________________

______________________________

______________________________

**2.** Ji bo gihîştina wan armancan hûn dixwazin çi bikin? Hûn dixwazin zimanekî biyanî hîn bibin? Hûn dixwazin tişta herî baş a ji destê we tê bikin da ku entegre bibin civakeke nû? Tiştek din?

______________________________

______________________________

______________________________

**!**

- Ji nû ve bicihbûna we ya li Fînlandê destpêka qonaxeke nû ya jiyanê ye. Tişta herî baş a ji destê we tê bikin da ku jiyana xwe ya nû xweş û biqîmet bikin.

**3.** Li ser esasê bersivên xwe yên li jor, nameyekê ji hevalekî re an jî ji endamekî malbatê re binivîsin da ku jê re bibêjin bê ka çima hûn dixwazin biçin Fînlandê, hûn ê li wir çi bikin, û ji bo serkeftinê hûn dixwazin çi bikin. Hindî ku pêkan be hûrgiliyan binivîsin.



- Mirov diguherin, û hûn jî îstisna nînin. Piştî ji nû ve bicihbûna we ya li Fînlandê, hûn ê jî biguherin. Di hin demên kifşe de, dibe ku hûn xwe tenê hîs bikin û sedemên standina hin biryarên xwe ji bîr bikin; ev name dikare ji we re bibe alîkar ji bo bîranîna hin sedeman.

# Belgeyên rêwîtiyê û sertîfîkayên din

Rûpela dersê, ku bi lînka li destpêka wê beşê dikare bê gihandin, derbarê belgeyên rêwîtiyê, sertîfîkayên dibistan û karkirinê, û heta reçeteyên dermanên ku bijîşk nivîsî jî agahiyan digire nav xwe. Paragrafên li jêr bi tenê jêgirtineke rûpelê ye. De ka em wan bixwînin.

---

Bînin bîra xwe ku hûn hemû belgeyên rêwîtiyê û kaxezên nasnameyê bi xwe re bibin. Belgeyên resen dibin alîkar di pêvajoya qeydkirinê de, û piştre jî, ji bo bidestxistina belgeyên nû yên rêwîtiyê.

Girîng e ku hûn hemû sertîfîkayên resen ên têkildarî perwerdehî û karê xwe bi xwe re bibin. Dê baş be ku hûn sertîfîkayan li ba noter bidin tesdîqkirin, eger mumkin be, li welatên jê vediqetin wan bi Îngilîzî bidin wergerandin.

Di hevpeyvîna yekem a navenda tenduristiyê de, hemşîreya tenduristiya giştî dê pirsa nexweşiyên we, dermanên we, û derzîkirinên we yên berê bike. Lewma, girîng e ku hûn reçeteyên berê, şîroveyên bijîşkan, kartên derzîkirinan ji welatê ku jê vediqetin bi xwe re bibin. Ev dê bibe alîkar ji bo zûtir peydekirina tedawî û dermanên rast di şaredariya nû ya niştecîbûna we de. Divê hûn dermanên xwe yên mecbûrî bi qasî têra mehekê bi xwe re bibin.

---

**1.** Piştî ku we niha metn xwend, tiştekî din ê taybet heye ku hûn difikirin ji cihê xwe yên niha hûn lê ne bi xwe re bibin? De ka em lîsteya li jêr ji bo alîkarbûna bîranînê bi kar bînin. Li eşyayên ku hûn ê bi xwe re bibin venêrin û tiştên din ên wekhev û girîng binivîsin.

| **Eşya** | ☒ | **Nîşe** |
|---|---|---|
| Belgeyên rêwîtiyê | ☐ | |
| Sertîfîkayên dibistanê | ☐ | |
| Sertîfîkayên kar | ☐ | |
| Derman | ☐ | |
| Sertîfîkayên tibî | ☐ | |
| Wêneyên malbatê | ☐ | |
| Belgeyên din ên şexsî | ☐ | |
| | ☐ | |
| | ☐ | |
| | ☐ | |

!

- Belgeyên derbarê dîroka we ya tibî û derbarê dîroka we ya perwerdehî û karkirinê, û her wisa belgeyên din ên fermî gelek girîng in. Piştrast bikin ku hûn wan bi xwe re bînin.

# Perwerdehî û pîlana lêgerîna kar

Wextê gihîştina bi şaredariya xwe ya mazûvan, hûn ê dest bi pîlana xwe ya entegrebûnê bikin. Deka em metnê bixwînin û bersiva pirsan bidin da ku derbarê wê zêdetir hîn bibin.

Ji bo karkirina li Fînlandê, gelek caran pêwîst dike ku koçber ji hîndariya entegrebûnê derbas bibin û zêdetir perwerde bibin li Fînlandê. Ji bo misogerkirina peydekirina perwerdehiya guncav li Fînlandê, divê hûn li cihê xwe yê nû yê niştecîbûnê pîlaneke destpêkê bikin ji bo perwerdehî û karê pêşdetir. Di pîlana xwe de divê hûn bidin diyarkirin ku we li ku, li kengê, û çi xwendiye, we çi derece bi dest xistine, û we li ku kar kiriye. Divê hûn şiyanên xwe yên taybet binivîsin û şîroveya xwe ya derbarê karê ku hûn bi kêr tên jî binivîsin. Her wisa gelek girîng e ku hûn kurteyekê binivîsin ku tê de lîsteya şiyan û tecribeya we hebe. Hûn dikarin li ser înternetê derbarê nivîsandina kurteyê fikrên kêrhatî bibînin.

**1.** Hûn bawer dikin ku hûn amade ne ji bo wergirtina zêdetir perwerdehiyê li Fînlandê? Çima?

___

___

**2.** Di nav pîlana we de dê çi hebe? Pirsên ji metnê bixwînin û bersîva wan bidin.

___

___

**3.** Binivîsin ka kîjan şiyanên we hene û li gor baweriya we hûn bi kêrî kîjan karê tên.

___

___

Di demeke kurt piştî çûna we ya Fînlandê de zarok di polên ji bo zarokên koçberan de tên bicihkirin da ku ew ji bo perwerdehiya giştî bên amadekirin. Dê kêrhatî be eger dêûbav zarokên xwe amade bikin ji bo ketina nav hawirdoreke nû ya dibistanê. Hûn dikarin derbarê sîstema perwerdehiyê ya Fînî zanyariyan bi dest bixin bi rêya beşên ziman û lînkan ên li ser malpera mof.fi.

**4.** We bi malbata xwe re derbarê pîlana her şexsî nîqaş çêkir, zarok jî tê de? We çi nîqaş kir?

___

___

**5.** Ji malpera webê ya Çûna li Fînlandê beşên lînkan binêrin.

**!**

- Her şexs dê bibe xwediyê pîlana xwe ya perwerdehî û kar.
- Pîlana we bi xwe nexşeya we ya serkeftinê ye li Fînlandê.
- Dest bi fikirandinê bikin ka hûn hêviya serkeftina çi dikin.

# Amadebûna derûnî ya ji bo çûnê

**1.** Hûn hêviya qazanckirina çi dikin li Fînlandê? Hûn ji windakirina çi ditirsin? Di sparteka jêr de, çend xal hene ku dibe we eleqedar bikin. Wan bixwînin û wan wek tiştên ku hûn hêvî dikin qezenc bikin, tiştên ku hûn ji windakirinê ditirsin, an jî tiştên ku bi fikra we dê neguherin an jî bala we nakişînin ji hev cuda bikin.

Heval

Dil rehetî

Guherîna edetên rojane

Hînbûna zimanekî

Çêkirina malbateke nû li Fînlandê

Çanda nû

Azadiya dînî

Têkiliya bi malbata li welêt an jî welatê niha

Kardarî

Jibîrkirina zimanekî

Avhewa

Aramî

Tenduristî

Zengînî

| ☺ **Hêvî** | ☹ **Tirs** | 😐 **Tu guherîn nîne** |
|---|---|---|
| | | |
| | | |
| | | |
| | | |
| | | |
| | | |
| | | |
| | | |
| | | |

**2.** Tiştên din lê zêde bikin ku tê hişê we, ku tiştekî qazanckirinê be, windakirinê be, an jî tiştê ku wek xwe bimîne.

**3.** Hûn derbarê tabloyê çawa hîs dikin? Gelo li gor we tirs zêde ne an jî hêvî? Hêviya xwe ya herî girîng û tirsa xwe ya herî girîng dorxêz bikin.

______________________________

______________________________

______________________________

**4.** Hûn difikirin ku hûn amade ne ji bo guherînên ku dê li hawirdora we ya jiyanê pêk bên? Hûn aliyê erênî yên wan guherînan dibînin? Guherînên çawa hûn difikirin ku hûn ê derbas bikin piştî çûna li Fînlandê?

______________________________

______________________________

______________________________

# Elimandina bi çandeke nû

**Li Fînlandê, jin û mêr, ciwan û kal, koçber û Fînî, wekhev tên qebûlkirin.**

Di rûpelên jêr de, çend wêneyên mirovan hene. De ka em pêşiyê li wan rûpelan binêrin û piştre pirsan bixwînin.

**1.** Jin û mêr di wan wêneyan de çi dikin?

**2.** Hûn derbarê wêneyên “a” û “b” çi difikirin?

**3.** Wêneyên ku we temsîl dikin hene? Çima?

**4.** Wêneyên ku we temsîl nakin hene? Çima na?

**5.** Wêneyên ku li gor nêrîna we her yek gotinên li jêr temsîl dikin peyde bikin.

**a.** Malbatek divê ji mêr û jinekê pêk were.

**b.** Malbatek dibe ji dêûbav yekî pêk were.

**c.** Malbatek dikare ji du mirovên bi heman zayendê pêk were.

**d.** Jin dikarin hemû cure karan bikin.

**e.** Mêr karê malê dikin û zarokan xudan dikin.

**f.** Mêr dikarin hemû cure karan bikin.

**g.** Mirov dikarin fikrên xwe bi awayekî azad bibêjin.

**h.** Mirovên bêmal û feqîr jî hene li Fînlandê.

**i.** Mirovên ciwan jî û yên kal jî dikarin jiyaneke xweş derbas bikin.

**j.** Biyanî û Fînî, mêr û jin li heman qadê bi hev re dixebitin.

**k.** Herkes, bêyî ku temen û zayendê wan li ber çav bê girtin, xwedî maf in ku biryarê bidin ka çi li ber xwe bikin û çi bikin bi şertê ku ew tişt di nav sînorê qanûnê de be.

**l.** Hurmeta azadiya dînî tê girtin.

**m.** Herkes dikare werzîşê bike li Fînlandê.

**n.** Mirovên xwedî kêmasî jî hene li Fînlandê.

**6.** Eger hûn rastî kesekî hatin ku nêrînên we yên dînî û siyasî napejirîne, hûn ê çi bikin?


**7.** Wek kesekî biyanî li Fînlandê hûn ê bibin parçeyeke kêmarekê. Hûn derbarê wê çawa hîs dikin? Ji bo ku bi Fînîyan re têkildar bibin hûn ê kedeke çawa bidin?
Ji bo ku bi komên din re têkildar bibin hûn ê kedeke çawa bidin?

**!**

- Wekhevî yek ji girîngtirîn nirxan e di civaka Fînî de.
- Tawanbariya li ser esasê zayend, paşxane, dîn, meyla cinsî, an jî faktorên din, bi qanûnê hatiye qedexekirin.


a


b


c



d


e


f
REFUGEES
WELCOME
Yle.fi


g
Soldiers Of Odin
MIGRANTS
NOT WELCOME
sananvapausjaajatus.blogspot.fi


h


i


j


k


l

m


n


o



p


q


r


s


t


!

- Jin û mêr bi awayekî wekhev dikarin beşdarî hemû qonaxên jiyanê bibin.
- Jinên di her temenê de li derveyê malê xwedî roleke çalak in. Ew dikare derbarê hobîyan, xwendinan, xebat an jî tişteke din be. Jin û malbatên wan divê ji bo rolên nû xwe amade bikin.

**8.** Gotinên li jêr bixwînin û binivîsin bê ka hûn wan dipejirînin an jî na? Sedemê rave bikin.

**a.** Destdirêjiya cinsî sûc e.

**b.** Liberkirina cilûbergên kurt nayê vê wateyê ku destdirêjiya jinan rewa ye.

**c.** Tundiya navmalê dibe ku li hemû cureyên malbatan de çêbibe – zengîn, perwerdebûyî, û feqîr.

**d.** Jin dema ku li derveyê malê dixebitin tevkariya aboriyê dikin.

**e.** Bi tenê hin çand û dîn li hember jinê tund in.

!

- Jin û mêr wekhev in.
- Jin xwedî mafê karkirinê, xwendinê, jiyankirina jiyaneke azad in.
- Destdirêjiya cinsî her tim sûc e.
- Tundî her tim sûc e.
- Çi kes – endamên malbatê jî tê de – nabe ku bê cezakirin ji ber tercîhên xwe yên jiyanê, bi şertê ku ew li gor qanûnên Fînî bin.

**9.** De ka em li peywîrên jêr binêrin û wan bixwînin. Nîqaş bikin ka kî her yek ji wan peywîran li civaka we an jî malbata we pêk tîne? Niha li ser masê binivîsin ka li gor we kî li Fînlandê wan peywîran dike.

- Xwarinçêkirin
- Paqijkirin
- Guhertina pînê bebikan
- Dayîna heqê kirê
- Temîrkirina tiştên xirabûyî
- Vexwarina vexwarineke bi alkol
- Qehweçêkirin
- Karkirina li derveyê malê
- Hilgirtina zarokan ji dibistanê
- Sazkirina karsaziyeke malbatî
- Karkirina wek hemşîre
- Karkirina wek ebe

| Mêr | Jin |
|---|---|
| | |
| | |
| | |
| | |
| | |
| | |
| | |
| | |
| | |
| | |
| | |
| | |


!

- Li Fînlandê, mêr û jin li hundirê malê û li derveyê malê berpirsyariyan parve dikin.
- Hişyekirî bin; amade bin ji bo kirina gelek tiştan ku we berê nedikarî, û gelek tiştên din ku hûn amade nebûn bikin.

**10.** Hûn destê-çepê bi kar tînin an jî destê-rastê? Eger dest-rast bin, pênûsê bigirin nav destê çepê, û eger dest-çep bin, wê bigirin nav destê rastê.

Di her yek kaxezên nîşegirtinê yên li jêr de, yek hevokê sê caran binivîsin. Hûn dikarin hevoka Îngilîzî ya “I can write.” an jî hevoka Fînî ya “Minä osaan kirjoittaa.” binivîsin. Hûn dikarin nivîsandina gotinekê ya bi bikaranîna elfabeya ku hûn pê baş dizanin jî tercîh bikin. Eger hûn nikarin binivîsin, wan sûretên ku dikenin xêz bikin, ☺☺☺, li ser her yek notê.

Niha jî hevokekê bibijêrin û wê sê caran binivîsin li ser her yek notê, an ku bi tevahî panzdeh caran.



Ew ewqas dijwar nebû, ne wisa?


Wê hîsê bînin bîra xwe, ji ber ku **hînbûna zimanê Fînî û entegrebûna bi civaka Fînî destpêkê hîseke wiha dide mirov**. Her wekî we ferq kir, dirêj kişand lê we ev yek pêk anî. Ew hîsa serkeftinê dê bibe tişta ku hûn ê hîs bikin wextê ku we axaftina xwe ya bi Fînî yekemcar kir: Hîseke pir xweş.

!

- Entegrebûn pêvajoyeke dirêj e û amadekariya hişmendî ya ji bo wê pêwîst e.
- Mifteya we ya entegrebûnê zimanê Fînî ye, hişvekirîbûn e, û daxwaza hînbûna tiştên nû ye.

Di vê sparteke de, hûn ê derbarê şoqa çandî û xwe xilaskirina ji wê bixwînin.

**Şoqa çandî çi ye? Şoqa çandî ew stres e ku ji ber zehmetiya têgihîştina bi şêweyên çanda nû çêdibe. Herkes şoqa çandî derbas nake, lê tiştekî baş e ku mirov bizane ka ew çi tişt e û mirov çawa xwe jê xilas bike, eger ku hate serê we.**




**Peywîra zêdeyî!** Hûn dikarin zêdetir derbarê şoqa çandî bixwînin li ser li en.wikipedia.org/wiki/Culture_shock an jî bi diyarkirina koda QR.

**11.** Li ser grafîkê, hûn dikarin navên çar qonaxên şoqa çandî bixwînin. Li jêr, hûn ê çend terîfên kurt ên wan qonaxan bibînin.
Niha de ka em terîfan bixwînin û her yekê bi qonaxa rast re têkildar bikin.

| | |
|---|---|
| **a.** Şîrînmeh | **w.** Hûn fêmkirineke kûrtir pêşde dibin derheqê peywendî çêkirina bi çandê û çawa bi helwesteke erênî dest bi xwe lêanîna bi çandê bikin. |
| **b.** Hêvîşikestin | **x.** Hûn dikarin bi timamî beşdarî çanda nû bibin. Hûn hîn jî aliyên xwe yên berê diparêzin lê di heman demê de hûn derbarê çanda xwe ya nû tiştên nû jî hîn dibin, û bi şêweyeke takekesî pirçandîtiyê tecribe dikin. |
| **c.** Lêanîn | **y.** Hin tiştên kifşe dibe ku bi awayekî ji çanda we cudatir bên têgihîştin û dibe ku hûn jê bixeyîdin an jî wan wek tiştên sosret bihesibînin, dîsa mumkin e ku li şûna kêfxweşiyê hîseke şikestî an jî xemgînî bi we re çêbibe. Li Fînlandê, ev yek dibe ku derkeve holê dema ku we ferq kir ku mirov her tim dixwazin mesafeyeke şexsî bihêlin an jî dema we dît ku hînbûna Fînlandî zor e. |
| **d.** Qebûlkirin û nûbûn | **z.** Li destpêkê, piraniya mirovan derbarê çanda nû xwedî heyecan in û dil dikin xasyetên wê kifşe bikin û dest bi axaftina bi mirovên din re bikin. |

**!**

- Şoqa çandî ew stres e ku ji ber zehmetiya tênegihîştina bi şêweyên pêkhatinê yên di hawirdora nû de çêdibe.
- Hûn dikarin şoqa xwe ya çandî çareser bikin û baş entegre bibin.

**Sana, zarokên wê û birayê wê Sam sala 2015'an wek penaber çûne Fînlandê. Piştî çûna Fînlandê, Sana û malbata wê çend gavên şoqa çandî tecribe kirin. Sana bi hevaleke ji welêt re di nav têkiliyê de ye û jê re behsa bûyerên di jiyana xwe de kiriye. De ka em lê binêrin ka ew û malbata wê tiştên çawa derbas dikin.**

De ka em hemû peyamên ku Sana'yê şandine bixwînin û piştre bersiva pirsan bidin.

Peyam "a"

●●●○○ 9:41 Berî Nîvro 70 %

< Suhbet Mai

Merheba Mai! Ez im Sana! Ev jimareya min a nû ya Fînî ye. Ez sax û selamet gihîştim Fînlandê! Ev der gelek xweş e.

Gelek paqij e! Li her derê dar hene û hewa pir temîz e. Moriv gelek baş in. Avahiya min hîn jî vala ye lê gelek rehet e û supermarket hema pênc deqîqe dûr e!

Ez niha li rawestgeha otobêsê me û di nav 10 deqeyan de ez ê biçim firoşgeha bajêr.

Binêre ew dîmena rawestgeha otobêsê ye.



Ez pir jê hez dikim!

**12.** Di peyama "a" de Sana ji kîjan qonaxê derbas dibû?

Peyam "b"

●●●○○ 10:41 Piştî Nîvro 50 %

< Suhbet Mai

Mai tu li ku bûyî? Hewcehiya min bi te heye. Min gelek bîriya te kiriye. Ez bîriya herkesê li wê derê dikim. Ez her tim digirîm û ez rojên ku mêrê min sax bû difikirim. Ez gelek bîriya wî dikim. Ez bîriya meta Zina û hemû malbata xwe dikim.

Li vir tu kes bi min re qise nake. Her wext baran û berf dibare. Mirovên li vir her tim bi karên xwe re mijûl in û li we nanêrin an jî nabêjin merheba. Çi wextê ku zarok diçin dibistanê ez gelek bîriya wan dikim. Ez dizanim gelek ewle ne lê dîsa jî ez bîra wan dikim û wan difikirim.

Pêncşema çûyî ez gelek aciz bûm. Ez çûm supermarketê û min mîqdarê pereyê xelet da kasîyer. Min fêm nekir ka çi dibêje min ta ku mêrikekî bi Îngilîzî ji min re aşkera kir. Min gelek şerm kir. Ji îro şûn de ez ê bi tenê karta xwe ya banqê bi kar bikim çimkî wisa hêsantir e. Hê jî karê min tune. Vêca bifikire tu mecbûr î ji bo karê paqijkirinê jî bi Fînî biaxivî. Û Fînî jî gelek çetîn û tevlihev e!

Min bîriya te kiriye.

**13.** Di peyama "b" de Sana ji kîjan qonaxê derbas dibû?

Peyam “c”

•••○○ 6:55 Berî Nîvro 50 %

< Suhbet Mai

Mai, malbata te çawa ye? Ew demeke dirêj e em neaxivîne!

Gelek tişt qewimîn heya niha. Ez gelek mijûl bûm, ji wextê ku welêt bûm niha zêdetir mijûl im. Min qursa xwe ya ziman xilas kir û min dest bi hîndariya hemşîretiyê kir. Heftiyê rojekê ez hîn jî diçim qurseke ziman a taybet, û mehê du caran ez diçim vê çalakiya kafeya ziman.

Ji vê tiştê re bi Fînî kielikahvila dibêjin. Gelek mirov diçin vê derê. Min gelek Fînî li wir nas kirin. Min gelek biyanî jî nas kirin.

Gelo te dizanî navê Fînlandê bi Fînî Suomi ye? Fînî wisa Fînlandê bi nav dikin! Ew jê re dibêjin Suomi. Vêca, heya niha min mirovên ji Suomî, ji Arjantîn, ji Vîetnam, ji Îsraîl, ji Rûsya, ji Cezayîr, ji Namibia, ji Tûnis, û heta ji Avusturya nas kirin. Ew hemû jî dixwazin Fînî û zimanên din hîn bibin û pratîkê bikin.

Carinan ez bi şîrketekê re dixebitim ku pêwîstiya wan bi mirovên ku zimanê me diaxivin heye. Min ew tişta wek kar ji xwe re çêkir û jê re toiminimi dibêjin û ew her wekî şîrketa min bi xwe ye. Ew ji min re dibe alîkar ku ez hinek kar peyde bikim.

Zarok! Tu bawer dikî ku ew niha ji min baştir Fînî diaxivin! Ez di asta navîn de Fînî diaxivim niha, lê zarok! Divê tu guhdariya axaftina wan bikî dema em bi mamosteyan re tên ba hev. Hema qey ew li vir hatine dinê.

Niha zêdetir hevalên min hene û ez hêdî bi hêdî hewl didim ku Fînîya xwe bi pêş ve bibim. Ew tişta herî girîng e. Bi xatirê te Mai! Min gelek bîriya te kiriye.

**14.** Di peyama “c” de Sana ji kîjan qonaxê derbas dibû?

___

___

___

Peyam “d”

●●●○○ 7:01 Berî Nîvro 50 %

< Suhbet Mai

Navbera min û Sam nebaşe, ew naçe dibistana xwe ya ziman û jê re hişyarî dan ku eger wisa dewam bike ew ê rastî gelek encamên nebaş bê.

Min jê re got ku tu wextê xwe bêtune derbas dikî. Ev welat gele firsetan dide wî û ew jî wiha wan xerc dike.

Mêrên din ên ku eynî salê bi me re hatin niha xwedî kar in an jî dixwînin da ku bibin tiştek û wî hêj qursa xwe ya ziman xilas nekiriye.

Ew birayê min e, Min jî wek wî li gel zarokan heman tişt jiyan kir û niha hinek Fînî diaxivim û di demeke kurt de hêvî dikim ku staja xwe bikim. Ew hê jî Fînî nikare biaxive û qet hewl nade ku hîn bibe!

Ew dibêje ku nefretê ji gelê Fînî dikim, lê ew nikare bi wan re biaxive jî... Gelo ew wan ji bo çi sûcdar dike? Penaberî dane wî lewma? Qursa ziman a bêpere dane wî lewma? Tedawiya tenduristî ya bêpere? Ew dike ku ji ber xetayê xwe wan sûcdar bike.

Min hewl da pê re biaxivim, lê wisa xuya ye ku kêr nayê. Min heta hewl da ku hin gotinên Fînî hînî wî bikim û bi hev re bixwînin lê ew naxwaze û gelek hêrs dibe dema ez jê re dibêjim ku divê tu hîn bibî.

Tenê tişta ku dike hema geryana li gel kurikên ji welêt e, û wextê bi wan re jî naçe, tê li vir û bi leyîzên vîdeo yên zarokên min dileyîze û di şixulê malê de qet alîkariya min nake! Eger ew birayê min neba min ewqas jê re sebir nedikir.

Ez ji bo wî gelek endîşê dikim!

**15.** Di peyama “d” de Sam ji kîjan qonaxê derbas dibû?

___

___

Peyam "e"

●●●○○ 9:12 Piştî Nîvro 80 %

< Suhbet Mai

Texmîn bikin ka kî bi awayekî fermî dest bi karê hemşîretiyê kir?



Ew rast e! Ez niha wek fermî hemşîre me.

Em derbasî avahiyeke nû ya li navçeyeke biçûk bûn û ne dûrî nexweşxaneyê ye ku min li wir kar bi dest xist.

Ez hewl didim ku zarokan derbasî dibistaneke din bikim. Ez kêfxweş im ku sîstema li Fînlandê firsetê dide min ku ez xwendina zarokan bişopînim.

Min niyet heye ez erebeyekê bikirim. Min li hin reklaman nihêrî û bi çend mirovan re bi Fînî qala vê kir. Bawer bikim gelek mirov min wek Fînî dihesibînin ji ber ku navê Sana nêzikî navê Fînî Sanna ye. Bi rastî gelek mirov li şûna Sana yê ji min re dibêjin Sanna. Ewilî hinek ecêb dihat lê niha ez bi xwe jî wê bi kar tînim.

Tu dizanî zimanê Fînî zor e lê zimanekî xweş e, û carekê hûn bielimin mirov êdî jê têdigihîje.

Ez niha hinek destmalan jî difroşim! Tu dizanî ew ên ku me li malê çêdikirin, lê niha ez wan bi rengên Fînî çêdikim. Xelk jê hez dikin.

Her çiqas ez wan online difroşim jî, divê ez agahiyê bidim ofîsa bacê.

Bac li vir wek tiştekê pîroz e. Niha ez dizanim çawa beyana xwe ya bacê bidim. Gelekî zehmet nîne.

Û axiriyê, bacên ku mirovên din dayî ji min re bûn alîkar ku ez bixwînim û bibim xudanê karê xwe, lewre tiştekî baş e.

A niha jî, ez ê karê xwe bidomînim û kêfa xwe ya jiyanê bikim.

Ez gelek pê kêfxweş im.

**16.** Di peyama "e" de Sana ji kîjan qonaxê derbas dibû?

______________________________________________

______________________________________________

**17.** Li gor we Sana bi awayekî serkeftî bi civaka Fînî re entegre bûye?

**18.** Eger hûn li şûna wê bûna we dê tiştekî cuda bikira?

**19.** Li gor metna we xwendî, kîjan pêşniyaran hûn ê bidin kesekî ku bi awayekî mayinde diçe welatekî din?

!

- Hûn xwedî berpirsiyariyeke şexsî ne derbarê entegrasyona xwe ya li Fînlandê.
- Bi hînbûna Fînî, zêdetir firsetên kar û çalakiyên demên vala ji we re çêdibin.

# Bersiv

## Amadekariya ji bo çûna mayinde

1. Bersiv li gor armancên we yên şexsî diguherin.
2. Hişvekirîbûna derbarê pêkanîna armancên xwe tiştekî pêwîst e. Li kêleka hînbûna Fînî, hûn ê gelek tiştên din jî hîn bibin. Xwe ji bo rêwîtiyeke berhemdar amade bikin.
3. Bersiv diguherin.

## Belgeyên rêwîtiyê û sertîfîkayên din

1. Bersiv diguherin; dîsa jî, divê hûn bînin bîra xwe ku belgeyên rêwîtiyê, sertîfîka, derman yên esasî ne. Eger belgeya we ya rêwîtiyê tunebe, dê yekê bidin we.

## Perwerdehî û pîlana lêgerîna kar

1. Divê hûn ji bo perwerdehiya pêşdetir a li Fînlandê xwe amade bikin. Hûn ê hewcehiyê bi hînbûna Fînî û belkû hewcehiyê bi şiyanên nû jî bibînin.
2. Bersiv diguherin.
3. Bersiv diguherin. Her wisa divê hûn hişvekirî bin derbarê karê ku hûn dixwazin bikin.
4. Bersiv diguherin.

## Amadebûna derûnî ya ji bo çûnê

1. Bersiv li gor xwestekên we yên şexsî diguherin.
2. Bersiv li gor xwestekên we yên şexsî diguherin.
3. Bersiv li gor xwestekên we yên şexsî diguherin. Her çawa be, helwesteke bihêvî dikare ji we re bibe alîkar ku hûn xwe baştir amade bikin ji bo ji nû ve bicihbûnê.
4. Bersiv diguherin. Di her şertê de, xwe amade bikin ku hûn ê biguherin û hûn ê gelek tiştan hîn bibin.

## Elimandina bi çandeke nû

1. Bersiv diguherin. Bi giştî, wêne mirovên cuda yên ji Fînlandê û ji cihên din nîşan dide ku şixulên wisa dikin ku piraniya Fînîyan jî wan dikin.
2. Wêne “a” tîmeke mirovên ji paşxaneyên cuda nîşan dide ku bi hev re dixebitin. Wêne “b” jineke ji paşxaneya koçberiyê nîşan dide ku dixebite.
3. Bersiv li gor xwestekên we yên şexsî diguherin. Bila di hişê we de be ku her şexs azad e ka kîjan wêneyê bibijêre ji bo binavkirinê.
4. Bersiv li gor xwestekên we yên şexsî diguherin. Bila di hişê we de be ku her şexs azad e ka kîjan wêneyê bibijêre ji bo nebinavkirinê.
5. Bersiv li tabloya jêr dikarin bên dîtin.

| **a** | **b** | **c** | **d** | **e** | **f** | **g** |
|---|---|---|---|---|---|---|
| d \| h | i \| j | k | b \| m \| p \| t | i \| j | l \| s | f \| g |
| **h** | **i** | **j** | **k** | **l** | **m** | **n** |
| c | d \| n | a | c \| d \| e \| n | q | o | r |

6. Bersiv diguherin. Bila di hişê we de be ku baweriyên şexsî ji xwe şexsî ne.

7. Bersiv diguherin; divê hûn dîsa jî xwedî helwesteke erênî bin derbarê jiyana we ya li Fînlandê û bizanin ku mafên we bi qanûnê hatine misogerkirin, û entegrebûna we pêwîstî bi têkildarbûna bi Fînîyên din û niştecîyên din ên li Fînlandê dibîne.

8. Bersiv dikarin li jêr bên dîtin.
   a. Destdirêjiya cinsî û tecawiz sûc in û divê qet çênebin.
   b. Jin azad in ku çi bixwazin li ber bikin û çi bixwazin bikin di nav sînorên qanûnê de. Liberkirina tiştekî nayê vê wateyê ku kesek dixwaze rastî destdirêjiyê bibe.
   c. Tundiya navmalê têkildarî qazancên aborî nîne. Tundiya navmalê dibe ku li hemû cureyên malbatan de çêbibe. Tundiya navmalê her tim sûc e.
   d. Jin xwedî maf in ku berjewendiyê ji karkirinê bibînin û berjewendiyê ji civakê bibînin. Ev yek ji malbatê re bêtir hevsengî û qazanca aborî tîne û misoger dike ku, wek mînak dema dê an jî bav bimire an jî êdî ne li mal be, jin êdî girêdayî an jî hewceyê hin pîvanan bin ku bi şiklekî din nikaribin pêk bînin.
   e. Êrîşkariya li hember jinê ji ber çand, dîn û ji nijadê çêdibe, her çiqas berbelaviya wê diguhere. Endamtiya çandeke kifşe û an jî paşxaneyekê çi carî nabe hinceta êrîşkariya li hember jinan, zarokan, an jî mirovên din.

9. Bersiv dibe biguherin li gorî ku kî li mala we çi dike, dîsa jî li Fînlandê, ew hemû peywîr navbera endamên malbatê tên parvekirin bêyî ku zayenda wan li ber çav bê girtin. Bila di hişê we de be ku hindî ku mirovek qanûnan binpê neke, astengkirina daxwaza wan a kirina tiştekî qedexe ye.

10. Em we pîroz dikin ji ber xilaskirina sparteke. Divê hûn xwedî heman helwesta erênî bin derbarê ji nû ve bicihbûna xwe ya Fînlandê.

11. Bersiv li tabloya jêr dikarin bên dîtin.

| a | b | c | d |
|---|---|---|---|
| z | y | w | x |

12. Di peyam “a” de, Sana ji qonaxa mehşîrîniyê ya şoqa çandî derbas dibû.
13. Di peyam “b” de, Sana ji qonaxa hêvîşikestinê ya şoqa çandî derbas dibû.
14. Di peyam “c” de, Sana ji qonaxa lêanîna gav bi gav ya şoqa çandî derbas dibû.
15. Di peyam “d” de, Sam ji rewşeke wisa giran a hêvîşikestinê derbas dibû ku ew ber bi qonaxa jihevqetîna bi timamî ya şoqa çandî dibir.
16. Di peyam “e” de, Sana ji hemû qonaxên şoqa çandî derbas bû û lewma jî derbasî gava pejirandin û nûbûnê bû, û karî ku bi awayekî rêkûpêk tevkariya civaka xwe bike.
17. Sana bi awayekî serkeftî bi Fînlandê û bi civaka Fînî re entegre bûye.
18. Bersiv diguherin. Nimûneya Sana’yê gelek baş e.
19. Bersiv diguherin. Bila di bîra we de be ku hînbûna zimanê Fînî mifteya entegrebûna rêkûpêk a li Fînlandê ye.

# Rêwîtî

**Hatina li Fînlandê**



Rêwîtiya we ya ber bi Fînlandê dirêj e; hûn ê bi rojan amadekariyê bikin û carekê jî bifirin ta ku hûn gihîştin mala xwe ya nû. Bi alîkariya agahiyên li ser rûpelên pêş de, rêwîtiya we dê hêsantir be.

**Di vê modulê de, hûn ê derbarê wan hîn bibin:**

- Gavên rêwîtiya we ya ber bi Fînlandê
- Hûn bi xwe re çi hildin û çi nehildin dema hûn rêwîtiyê bikin
- Hûn ê li balafirgehê çi bikin
- Çi dê biqewime dema hûn gihîştin Fînlandê

**Derbarê vê modulê bixwînin li navnîşana [mof.fi/sections/travelling/en](mof.fi/sections/travelling/en) an jî koda QR a li jêr bidin diyarkirin**

**Vê modulê online di vê navnîşanê de peyde bikin [mof.fi/exercises/travelling/en](mof.fi/exercises/travelling/en) an jî koda QR a li jêr bidin diyarkirin**

# Amadekariya ji bo firînê

**Rêwîtiya ber bi Fînlandê dê wext bigire û divê hûn gelek gavan bavêjin ta ku hûn bigihîjin mala xwe ya nû ya li şaredariya we ya nû.**

**1.** De ka em li gavên li jêr binêrin û wan bixin nav rêzekê.

dawetkirina ji dawetkirna ji bo hevpeyvînê li gel o hevpeyvînê li gel rayedarên Fînî | derketin | pejirandina ji hêla rayedarên Fînî | gihîştina li şaredariyê ku mala we ya nû li wê derê ye | gihîştina li Fînlandê | hevpeyvîna li gel rayedarên Fînî | amadekariya ji bo firînê | elimandina çandî ya pêş-derketinê | destpêkirina hînbûna bi çand û zimanê nû

Dawetkirina ji bo hevpeyvînê ji hêla rayedarên Fînî

Gihîştina li şaredariyê ku mala we ya nû li wê derê ye

**2.** Gavên rêwîtiyê ji we re aşkera ne? Hûn hêvî dikin ku rêwîtiya we çawa bimeşe?

**Peywîra zêdeyî!**
Pêvajoya ji wergirtina pejirandinê ya ji rayedarên Fînî ta rêwîtiya ber bi Fînlandê bi giştî çiqas dem digire?

!

- Hûn ê bi tena serê xwe rêwîtiya ber bi Fînlandê nekin. Dema hûn derketin, derbas bûn û hûn gihîştin Fînlandê dê piştgirî û alîkarî ji we re bê dayîn.

**3.** Metna li pêş bixwînin û timam bikin. Eger ji we re alîkarî pêwîst bike, peyvên li jêr bi kar bînin.



Rêxistina Navnetewî ya Koçberiyê

Seyahata ber bi Fînlandê bi _______________ çêdibe. Derketin li Balafirgehekê pêk tê. Ji ber ku her takekes xwedî __________________ e ku bi tenê _________________ kîlogram bagaj bi xwe re wergire, girîng e ku hûn pêşde __________________ bikin ka hûn kîjan tiştan dixwazin bi xwe re bibin û kîjan tiştan divê hûn li pey xwe bihêlin.

Dema ku we dest bi seyahatê kir divê hûn bi xwe re belgeyên rêwîtiyê û bilêtên firînê bibin. Girîng e ku hûn bi xwe re ____________________ şexsî bibin. Pêwîst nake hûn bi xwe re _______________________an jî ________________________malê bi xwe re bibin. Destûra xwarin an jî ____________________________ tune ku ji dergehê ____________________ ewlehiyê derbas bibe.

vexwarinan | hilberên | pîlan | balafir | destûr | 20 | kontrola | sertîfîkayan | qûşxane

- Seyahata we dê dirêj bidomîne; xwe baş amade bikin.
- Gelek tişt pêwîst nake ku hûn hilgirin, bi awayekî baldar bifikirin ka hûn ê çi bi xwe re bibin û çi nebin.

**4.** Li gor fikra we çi li Fînlandê bi dest nakeve û ji we re lazim e ku hûn bibin? Wê li ser notên-zeliqok binivîsin jêr.

**5.** Li jêr hûn ê terîf û wêneyan bibînin. Taybetiya eşyayê bi cûreyê baholê têkildar bikin.

- 20 kg
- Ji yek lîtreyê zêdetir şilavî
- Li seranserê seyahatê li ba rêwî dimîne
- 8 kg
- Zêdetirîn yek lître şilavî û di bin şertên teqez de
- Li seranserê seyahatê li ba rêwî namîne

bahola destan




bahola edetî



- Bînin bîra xwe ku hûn ê bi tenê çentê xwe yê destan bi xwe bibin, û baholên we yên din dê li Helsinki an jî li cihê dawî yê gehîna we bidin we.

**6.** De ka em li wêneyên jêr binêrin.
Tiştên ku destûra birinê ji we re tune û divê hûn wan nebin balafirgehê xêz bikin.
Tiştên li hêla çepê ne destûra wan a birina li balafirgehê hene. Tiştên ku hûn wek çenteyê destan dikarin bibin dora wan xêz bikin.




- Girîng e ku hûn bi xwe re hemû sertîfîkayên resen û wergerandî yên têkildarî perwerdehî, derece û kar, belgeyên nasname û rêwîtiyê, û her wisa belgeyên têkildarî tenduristiyê bibin.

# Li balafirgehê

**Gelek tişt hene bên kirin beriya suwarbûna li balafirê. Bînin bîra xwe ku di wextê xwe de li balafirgehê bin!**

**1.** Li balafirgehê, hûn ê di gelek gavan derbas bin beriya ku bikevin hundirê balafirê. De ka em fotoyê bi gava eleqedar re têkildar bikin.

**a.** Qeyd-çêkirin
**b.** Gera li dora balafirgehê
**c.** Kontrola pasaportê
**d.** Kontrola ewlehiyê
**e.** Suwarbûna li balafirê


v
Rêxistina Navnetewî ya Koçberiyê



w


x


y
Rêxistina Navnetewî ya Koçberiyê


z
Rêxistina Navnetewî ya Koçberiyê

# Gehîştin

De ka em metnê bixwînin.

Hûn ê di balafirgeha Helsinki-Vantaa re bigihîjin Fînlandê. Ewilî divê hûn belgeyên xwe yên rêwîtiyê nîşan bidin di kontrola pasaportê de. Hûn ê belgeyên xwe bidin karmend. Mirov yek bi yek di konrola pasaportê re derbas dibin. Zarokên biçûk dikarin li ba dêûbavên xwe bin.

Rayedarên Fînî dê agahiyên şexsî, fotograf û destnîşanên we wergirin dema hûn gihîştin Fînlandê an jî piştî demeke nêzik qeyda we ya gihîştinê ya li Fînlandê hat çêkirin. Dibe ku ev yek zêde wext bigire û dibe ku ji we bê xwestin ku hûn guhên xwe û stûyê xwe vekin eger hûn destmalê didin serê xwe da ku wêneya we bê kişandin.

Piştî kontrola Pasaportê, herkes dê derbasî saloneke mezin bibe ku li wir hûn ê li benda baholên xwe bin ku we hiştibû ser banda qeyd-çêkirinê li welatê derketinê. Bahol ê li ser bandên cuda bên li gor firînan. Hûn dikarin li ser panela elektronîk jimareya firîna xwe kontrol bikin. Girîng e ku hûn pê beled bin ku hemû bahol gihîştine. Li salonê erebe hene ku hûn dikarin bahola xwe lê bar bikin. Dema ku bahol hemû gihîştin hûn ê xeta kesk a ku ber bi derketinê diçe bişopînin. Ev tê vê wateyê ku çi eşyayên we tune hûn nîşan bidin. Hîngê hûn qada navnetewî terk dikin û seyahata we ya nav Fînlandê êdî dikare dest pê bike.

Piştî terkirina qada navnetewî, hûn ê dildarên Xaça Sor a Fînî bibînin ku êlekên sor li ber wan e. Dildar dê ji we re bibin alîkar da ku hûn seyahata xwe bidomînin. Hûn ê piştre seyahata xwe bidomînin heya şaredariya ku hûn ê lê bimînin, an bi balafireke nû an jî bi şiklekî din ê veguhastinê. Cureyê veguhastinê her tim ji bo we tê eyarkirin û hûn ê seranserê seyahatê alîkariyê bistînin.



Rêxistina Navnetewî ya Koçberiyê

**1.** Wêneya li jor terîf bikin.

**2.** Kîjan beriyê tê? Hilgirtina baholên xwe an jî derbasbûna ji kontrola pasaportê?

**3.** Hûn dikarin belgeyên xwe yên şexsî bihêlin nav bahola qeyd-çêkirî? Sedemê rave bikin.


**4.** Çima ji we re hat gotin ku guh û stûyê xwe vekirî bihêlin?

**5.** Kîjan eşya divê hûn nîşan bidin dema ku hûn hatin Fînlandê?

> **!**
> - Her daîm belgeyên xwe yên rêwîtiyê bi xwe re bibin! Bi rayedaran re têkiliyeke baş çêbikin lewre ev tişt ê hem ji we re û hem jî ji kesên din re bibe alîkar.

# Piştî gehîştinê

**1.** Piştî ku êdî hûn gihîştine mala xwe ya nû, hûn dikarin bêhna xwe vedin û dest bi sazkirina jiyana xwe bikin. Tiştên ku piştî gihîştina Fînlandê hûn pîlan dikin ku bikin binivîsin.





> **!**
> - Seyahat dirêj û westîner e. Xwe baş amade bikin.
> - Dema hûn gihîştin, jiyana we ya nû dest pê dike. Hingê ya baş ew e ku mirov bala xwe bide ser bicihbûnê û avakirina jiyana xwe ya li Fînlandê.



# Bersiv

## Amadekariya ji bo firînê

1. Dawetkirina ji bo hevpeyvîna ji hêla rayedarên Fînî → hevpeyvîn bi rayedarên Fînî → pejirandin ji hêla rayedarên Fînî → destpêkirina hînbûna derbarê çand û zimanekî nû → elimandina çandî ya pêş-derketinê amadekariya ji bo firînê → derketin → gihîştina li Fînlandê → gihîştina li şaredariyê ku mala we ya nû li wê derê ye
2. Bersiv diguherin, dîsa jî divê hûn xwe amade bikin ji bo seyahateke dirêj.
3. balafir | destûr | 20 | pîlan | sertîfîkayan | qûşxane | hilberên | vexwarinan | kontrola
   **Pirsa zêdeyî:** Pêvajo pirî caran heya şeş mehan dikişîne.
4. Di wan rojan de, hema hemû tiştên lazim ên bikaranînê dikarin li dikanên edetî an jî taybet ên li çar aliyên Fînlandê bên peydekirin. Dîsa jî, bînin bîra xwe ku eşyayên xwe yên şexsî bi xwe re bibin, wek derman, reçete û sertîfîka.
5. Tabloya li jêr bersivên spartekan digire nav xwe.

| bahola destan | bahola normal |
|---|---|
| • 8 kg<br>• Zêdetirîn yek lître şilavî û di bin şertên teqez de<br>• Li seranserê seyahatê li ba rêwî dimîne | • 20 kg<br>• Ji yek lîtreyê zêdetir şilavî<br>• Li seranserê seyahatê li ba rêwî namîne |

6. Tabloya li jêr bersivên spartekan digire nav xwe.

| a. Nayê destûrdayîn | b. Destûr heye lê pêwîst nake | c. Ya baş di nav bahola normal de bê kişandin | d. Divê di nav çenteyê destan de bê kişandin |
|---|---|---|---|
|  |  |  |  |

**a.** Kêr, tiştên radyoaktîf, teqemenî, kîmyewî û qabên gaza guvaştî nayên destûrdayîn.

**b.** Qoşxane, tenîkeyên xwarin tê de, û çeqmaq tên destûrdayîn lê lazim nakin, ji ber ku dema gehînê dikarin bên kirîn. Heywanên xudankirinê tên destûrdayîn, lê divê hûn wê eyar bikin û heqê mesrefên têkildarî-rêwîtiyê bidin; piranî ya hêsantir ew e ku mirov li ba eqrebayan bihêle an jî li welatê ku jê vediqetin bidin xudankerên pêbawer.

**c.** Pêlav, makyaj, xalîçe, cilûberg, û pirtûkan hûn dikarin bixin nav kotaya bahola xwe ya normal.

**d.** Derman, laptop, eşyayên biqîmet ên wek zêr û pere, belgeyên rêwîtiyê, û sertîfîka biqîmet in û lewre divê bi we re bimînin. Pînê zarokan, xwarina bebikan, û eşyayên şexsî yên biçûk, ên wek firçeya diranan, hûn wan jî dikarin hilgirin li ba xwe.

## Li balafirgehê

1. Tabloya li jêr bersivên spartekan digire nav xwe.

| a | b | c | d | e |
|---|---|---|---|---|
| v | w | y | z | x |

## Gehîştin

1. Wêne libendêmayîna ji bo derbasbûna di kontola pasaportê re nîşan dide.
2. Derbasbûna ji kontrola pasaportê beriya hilgirtina we ya baholên xwe çêdibe
3. Eger belgeyên we yên şexsî di nav baholên we de ne, hûn ê nikaribin wan di kontrola pasaportê de nîşan bidin, lewma divê ew her tim li ba we bin.
4. Ji bo ku bi awayekî rêkûpêk nasnameya we bidin îspatkirin, rayedarên Fînî dibe ku ji we bixwazin ku hûn guh û stûyê xwe vekin û her wisa ew ê nîşanên tiliyên we û agahiyên we yên şexsî kontrol bikin.
5. Eger bi we re pereyeke zêde an jî eşya hebe ku we bi armanca firotina wan a li Fînlandê anîbe, divê hûn Gumrikê agahdar bikin. Derbarê vê bêtir bixwînin li ser malpera Gumrikên Fînî tulli.fi an jî koda QR a hane bidin diyarkirin.

## Piştî gehîştinê

1. Bersiv diguherin, dîsa jî xwe amade bikin ji bo naskirina ziman û dest bi pîlana xwe ya entegrasyonê bikin.

# Jiyana Rojane

**Pêkanîna jiyana rojane**



Avahiyên çawa hene li Fînlandê? Hûn li ku fêkî û sebzeyê dikarin bikirin? Hûn çawa dikarin girêdana bi înternetê çêbikin? Erebeyên veguhastina li Fînlandê çi ne? Ev modul ê bersiva wan tiştan bide.

**Di vê modulê de, hûn ê derbarê wan hîn bibin:**

- Avahiyên kirêkirinê
- Meqbûz
- Qayde û rêgezên malê
- Zibil û temîr
- Dikan û market
- Banqe
- Veguhastin

**Derbarê vê modulê li navnîşana jêr bixwînin mof.fi/sections/daily_life/en an jî koda QR a li jêr bidin diyarkirin**

**Vê modulê online di vê navnîşanê de peyde bikin mof.fi/exercises/daily_life/en an jî koda QR a li jêr bidin diyarkirin**

# Avahiyên kirêkirinê

De ka em metnê bixwînin û bersîva pirsan bidin.

Wek penaberê kotayê hûn û malbata we xwedî maf in ku avahiyekê kirê bikin ku dê ji bo we bê eyarkirin di şaredariya we ya niştecîbûnê de.

Mezintiya avahiyê û mîqdara odeyan girêdayî jimareya niştecîyan e, lê ekîpmanên sereke yên di avahiya kirêkirî de piranî wekhev in. Di avahiya kirêkirinê de pirî caran sivderek, mitbaxek, odeyeke rûniştinê, odeyên razanê, serşok û tûwalet hene. Li tûwaleteke Fînî rûniştekek tûwaletê û destşokek heye ji bo destşûştinê. Pirî caran sîstemeke navendî ya germkirinê heye ku avahiyê germ dike di hewaya sar de. Her yek ode xwedî amrazeke germkirinê ya tê eyarkirin e.

Xwediyê malê û kirêdar peymaneke nivîskî îmze dikin ku tê de heqê kirê û dirêjiya dema kirêkirinê tê diyarkirin.

**1.** Wek penaberekî kotayê, kî dê bibe berpsiyar da ku ji we re avahiyekê eyar bike beriya gehîştina we ya li Fînlandê? Mezintiya avahiyê girêdayî çi ye?

**2.** Ekîpmanên sereke yên di avahiyan de wekhev in?

**3.** Şaredarî piştgiriyê dide we di eyarkirina avahiyê de lê kî peymana kirêkirinê îmze dike?

**4.** Di nav peymana kirêkirinê de çi heye?

**5.** Avahiyên kirêkirinê bê eşya ne?

**!**

- Avahiyên kirêkirinê li Fînlandê wek edetî bi tenê hecetên sereke dihewînin. Eger ji we re tiştekî taybet lazim bike, divê hûn vê bi xwe bikirin.
- Hecetên ku dema gihîştina xwe ya li mal hûn peyde bikin dibe ku biguherin. Temsîldarên şaredariya we dê piştgiriya we bikin ji bo bicihbûna we ya li avahiya kirêkirî.

# Meqbûz

De ka em metnê bixwînin.

Kirêya avahiyê bi awayekî mehane ji xwediyê malê re rasterast bi transfera banqê tê dayîn. Nedayîna kirê tê wateya betalkirina peymana kirêkirinê.

Li gel dayîna heqê kirê, meqbûzeke cuda ya avê jî heye. Mîqdara ku bê dayîn girêdayî jimareya rûniştvanên li avahiya we ye. Meqbûza avê bikaranîna avê ya kêmûzêde digire nav xwe. Eger ku av zêde bê xerckirin, hûn ê heqeke cuda bidin.

Kirêdar divê li gel dabînkerê elektrîkê peymanê çêbike. Meqbûza elektrîkê piranî her meh an jî salê çar caran wek transfereke banqê ya bi hesabê dabînkerê elektrîkê tê dayîn. Mîqdara elektrîkê girêdayî bikaranîna elektrîkê ya li avahiyê ye. Girîng e ku mirov bikaranîna av û elektrîkê bişopîne, ji ber ku zêde bikaranîn dê bibe sedemê mesrefên zêdeyî.
Temsîldarên şaredariyê li destpêkê dê derbarê mijarên têkildarî-kirêkirinê de ji we re bibin alîkar.

**1.** Wek “rast” an jî “xelet” bersivê bidin.


| | | |
|---|---|---|
| **a** | Heqê kirê bi transfera bangê tê dayîn. | |
| **b** | Eger heqê kirê neyê dayîn, peymana kirêkirinê dê bi dawî bibe. | |
| **c** | Dayîna heqê avê piranî bi awayekî cuda ji dayîna heqê kirê tê hesibandin. | |
| **d** | Dayîna heqê avê wekhev e bêyî ku jimareya mirovên li malê bên hesibandin. | |
| **e** | Eger av pir zêde bê bikaranîn, hingê divê heqê zêde bê dayîn. | |
| **f** | Meqbûza avê bi transfera banqê tê dayîn. | |
| **g** | Ji dayîna heqê avê cudatir, mîqdara meqbûza elektrîkê girêdayî jimareya mirovên li malê ye, lê li ser bikaranînê. | |

**2.** Di rûpela pêş de mînakek meqbûza elektrîkê heye. De ka em bi hev re lê binêrin:

- **Di Beşa 1 de** agahiyên pêwîst hene ji bo dayînê: “eräpäivä” tê wateya dîroka dayînê û “laskun viite” jimareya referansê ye ku divê hûn daxilî nav bikin dema hûn heqê wê didin da ku dayîna we bikare bê şopandin.
- **Di Beşa 2 de** nav û navnîşana we heye; bi vî awayî hûn her tim dikarin teqez bikin ku meqbûz aîdê we ye. Di wan rojan de piraniya meqbûzan bi rêya înternetê tên şandin.
- **Di Beşa 3 de** agahiyên we yên peymanê hene, wek mînak heyama derbasdariya peymanê û gelo hûn her meh an jî sê mehan carekê meqbûzê werdigirin.
- **Di beşa 4 de** agahiyên ku we li jor xwendine bi kurtî tên nivîsandin. De ka em wê venêrin û agahiyên pêwîst peyde bikin.

!

- Dayîna heqê kirê û meqbûzan a di demê de berpirsyariya we ye. Eger di demê de hûn nedin, hûn encamên wê digirin li ber çav.
- Dema we heqê meqbûzekê da, ji we re jimareya hesabê banqê, bihayê meqbûzê, û jimareya referansê lazim dike.
- Eger pirsên we hebin, bê dudilî li gel rayedariya eleqedar re têkiliyê çêbikin.



HELEN

SÄHKÖLASKU
12.01.2015
1/4

LASKUN TIEDOT 1.
Laskun numero:
12345678
Eräpäivä:
26.01.2015
Laskun viite:
203 12345 12345 12345

Etunimi Sukunimi
Katuosoite 1 A 11
00100 HELSINKI

ASIAKKAAN TIEDOT 2.
Asiakkaan nimi:
Etunimi Sukunimi
Asiakasnumero:
1234567
Käyttöpaikan osoite:
Katuosoite 1 A 12,
00100 HELSINKI
Käyttöpaikkatunnus:
12345678
Plussakortin numero:
123456 456789 123
Mittarinumero:
12345678

Helsingin Energia on nyt Helen Oy

SOPIMUKSEN TIEDOT 3.
Sopimusnumero:
123456789
Laskutustapa:
12 kertaa vuodessa
Sopimus voimassa:
26.08.2016 asti
Sähkötuote:
Yleissähkö

| | | |
|---|---|---|
| KULUTUSLASKUN YHTEENVETO | 4. | |
| KULUTUSLASKU 01.10.2014-31.12.2014 TOTEUTUNUT KÄYTTÖ | | 376 kWh |
| Sähköenergia, Yleissähkö Helen Oy | | 28,29 e |
| Sähkön siirto, Yleissiirto Helen Sähköverkko Oy | | 35,56 e |
| KULUTUSLASKU YHTEENSÄ (SIS. VEROT) | | 63,85 e |
| LASKUN LOPPUSUMMA | | 63,85 e |
| Lasku sisältää arvonlisäveroa 51,48 eurosta 24 % | | 12,37 e |
| Loppusumma ilman alv | | 51,48 e |
| Sähkövero 1.1.2015 alkaen (c/kWh): | 5. | |

Verdiluokassa I vero on 2,79372 sis. alv 24 % ja 2,253 ilman alv.

EDUT Plussaan oikeuttavat ostot 28,29 e.

Tarkemmat tiedot ks. Laskuerittely

Saajan tilinumero

| | | | | |
|---|---|---|---|---|
| IBAN | DANSKE BANK<br>POHJOLA | FI18 8000 1200 3133 60<br>FI17 5000 0110 0000 55 | BIC | DABAFIHH<br>OKOYFIHH |

Saaja
HELEN Oy

Sähkölasku
Laskun numero: 62689082

Maksajan nimi ja osoite
Etunimi Sukunimi
Katuosoite 1 A 11
00100 HELSINKI

Pyydämme käyttämään maksaessanne tämän laskun viitenumeroa.

Allekirjoitus

Viitenumero 203 12345 12345 12345

Eräpäivä 26.01.2015 Euro 63,85

LASKU
LASKUERITTELY
ASIAKASPALVELU
AJANKOHTAISTA

helen.fi/asiakaspalvelu/kodit/laskutus/laskun-lukuohje/

**a.** Dîroka dayînê peyde bikin û dora wê xêz bikin.

**b.** Mîqdara tam a dayînê peyde bikin û dora wê xêz bikin.

**c.** Jimareya referansê ya ku divê hûn dema dayînê daxil bikin peyde bikin û dora wê xêz bikin.

**d.** Peyva “tilinumero” tê wateya jimareya hesabê. Wê peyde bikin û dora wê xêz bikin.

# Qayde û rêgezên giştî

De ka em metnê bixwînin û bersîva pirsan bidin.

Gelek caran penaberekî kotayê û malbata wî an jî wê li aparmaneke hevpar avahiyekê kirê dikin ku ji gelek malên girêdayî şîrketekê maldarkirinê ye. Her yek rûniştvanê şîrketa maldarkirinê divê li gor qayde û rêgezên şîrketa maldarkirinê tevbigere. Ji bo bikaranîna odeya cilşûştinê ya nav bînayê, divê hûn pêşde rezervasyonê bikin. Erebe bi tenê dikare li cihê parqa erebeyê bê danîn. Her wisa, rûniştvan divê li paqijiya giştî ya hawirdorê û cudakirina bermayîyan miqate bibe. Di bûyereke binpêkirina qayde û rêgezan de, cîran ê şikayetê li ba rêveberê şîrketa maldarkirinê bikin.

**1.** Şîrketa maldarkirinê çi ye?

**2.** Hemû qaydeyên şîrketên maldarkirinê wekhev in?

**3.** Hûn dikarin çi wextê ku bixwazin odeya cilşûştinê bi kar bînin?

**4.** Kî li cudakirina bermayîyan miqate dibe?

**5.** Ji kê re hûn şikayetê dikin di bûyereke binpêkirina qayde û rêgezan de?
Ji kê re cîran şikayetê dikin eger hûn qaydeyan binpê bikin?

!

- Avahiya ku we kirêkirî parçeyeke bînaya avahiyan e.
- Divê hûn hurmetê nîşanî qaydeyên bînayê bidin.

# Temîr û zibil

Her şîrketek xwedî xizmeta xwe ya temîrê ye, ku têkilî bi wan re tê çêkirin wek mînak eger temîra henef, legena firaqşûştinê an jî amrazên germkirinê lazim bike. Eger we li avahiyê dilopkirina avê tespît kir, divê hûn zûka gazî xizmeta temîrê bikin. Çi zerera ku li avahiyên kirêkirî bikeve divê ji xwediyê avahiyê re bê gotin. Xwediyê avahiyê mecbûr e ku hecetên malê yên wek sarinc, ocax an jî legena firaqşûştinê temîr bike an jî biguherîne. Eger zirar ji ber kêmasiya rûniştvan çêbûbe, ew mecbûr e heqê zirara xwe bide.

**1.** Beşa pirsan bi beşa bersivan têkildar bikin. Bizanin ku pirsek dikare xwedî gelek bersivan be û bersivek dikare ji bo gelek pirsan derbasdar be.

| | |
|---|---|
| **a** | eger amrazên germkirinê xirab bûbe |
| **b** | eger sarinc xirab bûbe |
| **c** | eger ez niyet bikim ku nûbûnê bikim |
| **d** | eger înternet nexebite |
| **e** | eger boriyên kêzînê tijî bibin |
| **f** | dedektora şewatê |
| **g** | eger ez niyet bikim ku dîwaran an jî binyadê biguherînim |
| **h** | eger av dilop bike |
| **i** | eger mirovekî din bikîşe malê da ku bi min re bijî |
| **j** | eger pêwîst be ku lempe bên guhertin |
| **k** | eger pirseke min hebe derbarê dayîna heqê kirê |
| **l** | eger tiştek bê dizîn |
| **m** | eger ji min re hecetên mitbaxê lazim bike |
| **n** | eger ez tiştekê bavêjim nav tûwaletê û ew bixitime |
| **o** | eger ez niyet bikim ku heywaneke malê xudan bikim |

| | |
|---|---|
| ez ê şîrketa temîrê agahdar bikim. | **v** |
| ew berpirsiyariya min bi xwe ye. | **w** |
| ez ê xwediyê malê agahdar bikim. | **x** |
| divê her tim li nav malê bê bicihkirin. | **y** |
| ez ê polîs agahdar bikim. | **z** |

Li gel pêkanîna hîştina avahiya xwe ya di rewşeke baş de, hûn mecbûr in ku hawirdora xwe ya jiyanê paqij bihêlin. De ka em metnê bixwînin û bibînin ka hûn ê vê yekê çawa bikin.

Pêkanîna paqijiya li dorhêla şîrketa maldarkirinê berpirsyariya her rûniştvanî ye. Hemû tûrikên bermayî û zibilan divê bibin nav zibildankên ji bo wan terxankirî. Li nav hewşa hemû bînayan zibildank hene ku rûniştvan zibilên xwe dibin diavêjin wê derê. Piraniya şîrketên maldarkirinê xwedî zibildankên cuda ne ku ji bo bermayîyên ji hev cihê. Rûniştvan divê bermayîyan ji hev veqetîne û bermayîyê bixe nav zibildanka rast.


2. Em çima vedigerînin?

________________________________________

________________________________________

3. Li tabloya jêr, hûn dikarin zibilên ji hev cuda û wêneyeke nimûne ya her yek cureyê zibilê bibînin. Hilberên li pêş bixin nav zibildankên rast. Qotiya li dawiya rûpelê bixwînin.

Pîsiya heyvanên malê | Gihayên hişkbûyî | Kovar | Pîneyên bebikan | Konteynerên cam | Tenîkeyên Tunayê | Metalên şikestî | Paketên qarton | Tenîkeyên nokan | Konteynerên qarton ên nokan | Pîneyên jinan | Rojname | Bermayên xwarinê | Qalikên mûzan | Badeyên cam | Qavanozên bacanan | Şûşeyên plastîk ên bê depozîto | Cilûbergên diriyayî | Qotiyên plastîk | Qalikên gêzeran | Zibilên din ên nakevin nav çi kategoriyekê

| | | |
|---|---|---|
| Bîo zibil |  | |
| Kaxez |  | |
| Qarton |  | |
| Metal |  | |
| Cam |  | |
| Plastîk |  | |
| Ziblên têkilhev |  | |

4. Serlêdana kierratys.info bikin da ku zêdetir derbarê vegerandinê hîn bibin.

- Şûşeyên plastîk û cam ku depozîtoya wan heye dikarin ji marketê re bên zivirandin û pereyê depozîto dikare bê wergirtin.
- Pirtûkên kevn dibe ku ji pirtûkxaneyê re bên bexşandin û cilûberg dibe ku ji navendên berhevkirinê re bên bexşandin.
- Batarya, lempe, kompîtir, telefon, amrazên elektronîk ên kevn, wêne, û materyalên din ên xeternak nabe ku bên avêtin û divê wan bizivirînin navendên berhevkirinê.
- Vegerandin welêt paqij dihêle; wek niştecîyekî şaredariyê û welatiyekî pêşerojê yê Fînlandê berpirsyariya we ye ku hûn Fînlandê paqij bihêlin.

# Kirîn û firotina li şaredariya we

Metna li pêş ji malpera webê ya dersê hatiye wergirtin. Lînka vê rûpelê li destpêka vê modulê dikare bê dîtin. We ev dît? Ew dişibe wek mof.fi/sections/daily_life/en û hûn dikarin ji wir zêdetir derbarê sernavê bixwînin.
De ka em metnê bixwînin.

---

Mirovên li Fînlandiyayê xwarina xwe û sebzeyên xwe piranî ji dikan û firoşgehên mezin dikirin. Li firoşgehên mezin gelek dikanên cilûberg û pêlavan hene. Dema hûn pê xwe diavêjin nav firoşgehê hûn erebeyeke kirînê an jî selikek kirînê hildidin da ku tiştên we kirî bixin hundir. Li firoşgehê qismên cuda yên tiştên cuda hene. Li qismê sebze û fêkîyan hûn dikarin fêkî û sebzeyên ku dixwazin bikirin bixin nav kîsikên kaxez an jî nav tûrikên plastîk. Piştî ku we hilgirt, tûrikên fêkî û sebzeyan daynin ser makîneya pîvandinê, piştre hûn tiliya xwe li bişkovka jimareya hilberê didin û makîne bihayê wê nîşanî we dide. Hûn etîketa bihayê datînin rexê tûrik. Nan li qulçê ku nan lê ye dikare bê rakirin. Masî û goşt li ser dezgehê ku ji bo wan hatine terxankirin tên xwestin. Cilûberg û pêlavên firotinê jî li firoşgehê peyde dibin û etîketa bihayê wan li ser wan xuya dike. Heqê tiştên hatine kirîn li ber kaseyê bi pere an jî karta banqê tên dayîn.

Li şaredariyên bi mezintiya navîn an jî mezin û li bajaran hûn dikarin firoşgehên ku piranî ji hêla koçberan ve tên bikaranîn peyde bikin. Şaredariyên bi mezintiya navîn û bajar xwedî bazar in jî ku li wir hûn dikarin fêkî, sebze, mêwe, masî û tiştên bikirin, û bi mirovan re hinek dem derbas bikin û qehweyekê vexwin.

Li bazarên erzaniyê gelek cilûberg hene ji bo zarok û mezinan, eşyayên malê, mobîlye, û pêlîstokên zarokan ên di rewşeke baş de. Cilûbergên kêm hatine bi kar anîn ji bo zarokan gelek peyde dibin. Beriya ku hûn tiştekî bikirin biçin û li bazara erzaniyê ya lokal binêrin. Bi kirîna hilberên destê duyem hûn dikarin teserufeke zêde ya xerckirinên malê bikin.

Li Fînlandê hema herkes, çi zarok, ciwan, mezin û mirovên kal û pîr, telefonên berîkê bi kar tînin. Hûn dikarin an karteke SIM a pêşdayînî bikirin ji R-kioskiya xwe ya lokal an jî hûn dikarin ji şîrketeke telefonê karteke SIM bikirin û mehane heqê wê bidin.

---

**1.** Wek "Rast" an jî "Xelet" bersiv bidin.

| | | |
|---|---|---|
| **a** | Fêkî û hilberên paqijkirinê li qismên cuda yên firoşgehê ne. | |
| **b** | Peredayîn dikare bi karta banqê çêbe. | |
| **c** | Li Fînlandê dikan hene ku hilberên biyanî û hilberên ku piranî ji aliyê biyaniyan ve tên bikaranîn difiroşin. | |
| **d** | Hilberên ji bazarên erzaniyê ji hilberên dikanên din bihatir in. | |
| **e** | Bi kirîna ji bazarên erzaniyê hûn dikarin gelek xercaneyên malê teseruf bikin. | |
| **f** | Dikanên R-kioski kartên SIM ên pêş-dayînî difiroşin. | |

**2.** Gelek bazarên erzaniyê dikarin online bên peydekirin. Hewl bidin ji bo lêgerîna malperên webê yên ku xwedî peyva “kirpputori” ne. Hûn dikarin li ser medya civakî li kom û rûpelan bigerin ku peyva “kirpputori” di wan de heye. Encaman bi heval û malbata xwe parve bikin.

**!**

- Piranî li dikanên Fînlandê bazarkirin tune, ji bilî bazarên erzaniyê
- Li navendên vegerandinê hûn dikarin hilberên bi kalîteya baş bi bihayeke erzan peyde bikin.
- Hûn dikarin bi endamtiya karta SIM a pêşdayînî girêdana înternetê bikin, li gel rêyên din. Derbarê vebijarkên cuda yên înternetê û rêya bidestxistina wê bipirsin.

# Banqe

Baş rêvebirina pereyê xwe taybetiyeke girîng a jiyana we ya rojane ya Fînlandê ye. Di vê beşê de, hûn ê derbarê bikaranîna xizmetên banqeyê yên li Fînlandê hîn bibin. De ka em metnê bixwînin.

---

Ji bo her koçberekî temen mezin pêwîst e ku li şaredariya niştecîbûyî an jî li şaredariya herî nêzik hesabeke xwe yê banqê veke. Pasaporteke derbasdar, destûra niştecîbûnê, û qeyda li şaredariyekê ji bo vê pêwîst in. Carekê hesab hat vekirin hûn ê karteke banqê ya şexsî wergirin. Bi karta xwe ya banqê hûn dikarin ji makîneyên perekişandinê pere bikişînin û li dikanan heqî kirînên xwe bidin. Teqez bikin ku jimareya PIN a karta xwe ya banqê di bîra we de be. Jimareya PINê jimareyeke çar-tûş e ku hûn ji banqê distînin.

Hûn dikarin ji makîneyên perekişandinê pereyan wek euro bikişînin, ku li Fînlandê û li gelek welatên Ewropayê diravê fermî ye. Li Fînlandê şêwaza herî berbelav a peredayînê karta banqê ye. Hûn karta xwe ya banqê dixin nav makîneyeke biçûk li firoşgehê û piştre jimareya xwe ya PIN li ser dinivîsin. Heqê kirîna we dê bi awayekî otomatîk ji hesabê ve bikeve. Hûn dikarin bi pere jî dayînê bikin.

---

**1.** Hesabê banqê çi ye?

---

**2.** Hûn çawa dikarin hesabê xwe yê banqê bi kar bînin?

---

**3.** Karta banqê çi ye?

---

**4.** Hûn çawa dikarin karta xwe yê banqê bi kar bînin?

---

Li kêleka karta banqê, banqe dê pênasên banqeyê bide we an jî rêyeke bide we da ku hûn xwe bigihînin wê. Pênasên we yên banqê jimare ne ku ji bo erêkirina peredayînên online an jî ji bo gehîna xizmetên din ên online an jî ji bo erêkirina nasnameya we ya li ser hin malperên webê tê bikaranîn. Pênasên banqê bi zimanê Fînî wek “pankkitunnukset” tê binavkirin.

**5.** Hûn dikarin çi bikin bi pênasên xwe yên banqê?

---

---

**6.** Hûn pênasên xwe yên banqê ji ku distînin?

---

**!**

- Herkes, mêr, jin, zarok xwedî hesabên xwe bi xwe ne. Peredayîn ji hesabê şexs re tê kirin.
- Her tim karta xwe ya banqê û pênasên xwe yên banqê deynin ciheke ewle.
- PIN karta we ya banqê şexsî ye. Wê nedin tu derê.

# Veguhastin

Veguhastin parçeyeke girîng a jiyanê ye. De ka em bi xwendina metnê û bersivandina pirsan erebeyên veguhastinê yên li Fînlandê binasin.

Erebeyên veguhastinê ji otobêsên lokal, trênên lokal, û ji tramwayê pêk tê. Erebeyên veguhastina giştî yên ji bo dûrahiyên dirêj otobês û trênên dûrahî-dirêj in. Bikaranîna veguhastina giştî piranî ji gerîdeyên şexsî erzantir e.

1. Rêwîtiya bi veguhastina giştî erzantir e?

2. Ji bilî yên Fînlandê çi cureyên erebeyên veguhastinê li welatên we hene?

Mirov li rawestgehên otobêsan li benda otobêsên lokal disekinin ku bi îşaretên rawestgehên otobêsan tên nîşankirin, û li wan deran otobês rêwîyan werdigirin. Dema otobês tê digihîje rawestgeha otobêsê, divê hûn îşaretekê bidin ajokar da ku bisekine. Di piraniya şaredariyan de heqê otobêsê bi karteke otobêsê tê dayîn ku rêwî ji pêş de pere tê de radizînin. Eger karta we ya otobêsê tunebe hûn dikarin bi pere heqê xwe bidin. Otobêsên dûrahî dirêj rêwîyan ji rawestgehên otobêsan ên ji bo otobêsên dûrahî-dirêj terxankirî hildigirin. Heqê ji bo seyahatên dûrahî dirêj piranî erzantir in eger hûn bilêtan ji demek berê online bikirin.

3. Veguhastina lokal ewle ye. Zarok dikarin wê bi kar bînin ji bo ku biçin dibistanê, û caran jî ji wan re erzanî tê çêkirin. Ev yek li welatê we çêdibe?

4. Di piraniya şaredariyan de, divê hûn karteke veguhastinê bikirin ku tê de pere hatiye razandin. Eger karta we tunebe, hûn ê çawa heqê xwe bidin?

5. Dema hûn dûrahiyeke dirêj rêwîtiyê dikin, kirîna bilêtê ya di pêş de erzantir e ji kirîna di nav otobêsê de. Carinan tekane derfeta kirîna bilêtekê li beriya seyahatê ye. Ev yek li welatê we jî wisa ye?

6. Di rûpela pêş de sê nexşe hene. Kîjan ji wan nexşeyan rêyên sereke li Fînlandê temsîl dike? Bi malbata xwe an jî hevalên xwe niqaş bikin. Çavkaniya nexşeyê wikipedia.com. e.

!

- Veguhastin ji bo jin, zarok, û mêran ewle ye.
- Kirîna bilêtan ji înternetê û ji pêş de gelek caran erzantir e.
- Koçber pirî caran pêwîstî bi belgeyeke ajotinê ya Fînî dibînin beriya ku bikarin li Fînlandê ajotinê bikin. Serlêdana traficom.fi da ku derbarê belgeyên ajotinê hîn bibin.

Trên bi awayekî berfireh li seranserê Fînlandê digere. Hemû bajarên mezintiya navîn û mezin xwedî rawestgehên trênê ne. Trên li rawestgehên trênê disekinin ku li wan deran rêwî dikarin peya bin û suwarî trênê bin. Bilêt piranî ji rawestgeha trênê tê kirîn, lê dikare ji înternetê jî bê kirîn û carinan jî di nav trênê de.

**7.** Hûn dikarin li ku bilêta trênê bikirin?


**8.** Li jêr sê nexşe hene. Kîjan ji wan nexşeyan rêyên hesin li Fînlandê temsîl dike? Bi malbata xwe an jî hevalên xwe niqaş bikin. Çavkaniya nexşeyê www.vr.fi ye; ji kerema xwe serlêdana malpera webê bikin.

**9.** Nexşeyên mayî çi temsîl dikin? Çavkaniya nexşeyê wikipedia.com. e.

Li Fînlandê mirov gelekî bisîkletê diajon. Gelek mirov bi bisîkletê diçin dibistanê û kar. Bisîklet li qada parqê ya bisîkletan tê parqkirin. Dema hûn bisîkletê diajon, girîng e ku mirov qaydeyên trafîkê bişopîne û serparêzekê bi kar bîne. Kesê ku bisîkletê diajo divê bala xwe bide kesên peya û yên ku li kolanan derbas dibin.

**10.** Mirov li Fînlandê gelek zêde bisîkletê diajon; hem ji bo jin û mêran û hem jî ji bo zarokan ew gelek ewle ye. Li welatê we jî ew zêde tê dîtin? Li gor baweriya we hûn ê li Fînlandê bisîkletê biajon?

**11**. Dema hûn bisîkletê diajon ew sê tişt çi ne ku divê hûn bînin bîra xwe?









# Cixarekişandin

De ka em metnê bixwînin.

Cixarekişandin li hemû qadên giştî; li balafirgeh, rawestgehên trênê, rawestgehên otobêsê, dibistan, ofîs, û li otobês, trên, balafir û derbasokan bi qanûnê hatiye qedexekirin. Li hemû qadên giştî ji bo cixarekişandinê cihên cuda, û bi awayekî kifşe hatine diyarkirin hene. Divê hûn wan cihan hem havînê û hem jî zivistanê bi kar bînin. Binikên cixareyan divê bavêjin nav zibildankên ku ji bo wan hatine terxankirin.

**1.** Li gor fikra we, di kîjan ji wan wêneyan de hûn dikarin cixareyê bikişînin û di kîjanê de hûn nikarin? Li bersivan binêrin da ku qaydeyên li Fînlandê hîn bibin.

| | | |
|---|---|---|
| Otobês | | |
| Hewş | | |
| Avahiya xwe | | |
| Erebeya xwe dema zarok di hundir de bin | | |
| Parq | | |
| Cihên wek qada cixare-nekişandinê îşaretkirî | | |
| Cihên wek qada cixare kişandinê îşaretkirî | | |
| Balafir | | |
| Kolan | | |

Piştî ku we niha modul xilas kir, kêmtirîn pênc fikrên derbarê tiştên ku hûn nû hîn bûne binivîsin. Fikr divê heman tiştên di nav qotiyên jêr de ne nebin li dikare ji wan îlhamê bigire. Fikrên xwe bi malbat û hevalên xwe re parve bikin.

- Wek penaberekî kotayê, hûn ê di avahiyeke kirêkirî de bijîn.
- Di demê de dayîna heqê kirê û meqbûzan berpirsyariya we ye.
- Berpirsyariya we ku hûn avahiyê di rewşeke baş de bihêlin û derûdora xwe paqij bigirin.
- Hema hemû peredayîn bi rêya banqeya we ya înternetê û karta we ya banqê tê dayîn. Dayîna bi pere kêmtir tê dîtin.
- Gelek vebijarkên kirînê hene.
- Tora veguhastina giştî gelek baş e.
- Kişandina cixarê ya li hemî cihên giştî qedexe ye.

# Bersiv

## Kirêkirin

1. Li Fînlandê hûn ê li maleke kirêkirî bijîn ku şaredariya we ji we re eyar dike. Mezintiya avahiyê girêdayî jimareya neştecîyan e.
2. Ekîpmanên sereke yên di avahiyan de piranî wekhev in.
3. Hûn ê, wek rûniştvan, li gel xwediyê malê peymaneke kirêkirinê îmze bikin.
4. Di nav peymana kirêkirinê de heqê kirê û dirêjiya dema kirêkirinê heye.
5. Avahî bê mobîlye tên kirêkirin.

## Meqbûz

1. Bersiv li tabloya jêr dikarin bên dîtin.

| a | b | c | d | e | f | g |
|---|---|---|---|---|---|---|
| Rast | Rast | Rast | Xelet | Rast | Rast | Rast |

2. Bersiv li ser wêneyê dikarin bên dîtin.




## Qayde û rêgezên giştî

1. Şîrketa maldarkirinê xwedî bînayeke avahiyan e ku avahiya we jî tê de cih digire.
2. Her şîrketa maldarkirinê xwedî qaydeyên xwe ne. Her yek rûniştvanê şîrketa maldarkirinê divê li gor qayde û rêgezên şîrketa maldarkirinê tevbigere.
3. Odeya cilşûştinê bi tenê di demên veqetandî de dikare bê bikaranîn.
4. Rûniştvan divê li paqijiya giştî ya hawirdorê û cudakirina bermayîyan miqate bibin.
5. Di rewşeke şikayetkirina binpêkirina qaydeyan de, bi şîrketa maldarkirinê re dê têkilî bê çêkirin.

## Temîr û zibil

1. Bersiv li tabloya jêr dikarin bên dîtin.

| a | b | c | d | e | f | g | h | i | j | k | l | m | n | o |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| v \| x | x | x | w | v | y | x | v \| x | x | w | x | z | w | w | x |

2. Vegerandin pêwîst e ji bo parastina hawirdora we û ji bo paqij hîştina wê. Vegerandin tê vê wateyê ku mirov tiştekê bike materyala xam ku dikare dîsa bê bikaranîn.

**3.** Bersiv li tabloya jêr dikarin bên dîtin.

| | |
|---|---|
| Bîo zibil | Gihayên hişbûyî \| Bermayîyên xwarinê \| Qalikên mûzan \|Qalikên gêzeran |
| Kaxez | Kovar \| Rojname |
| Qarton | Pakêtên qartom \| Konteynerên qarton ên nokan |
| Metal | Tenîkeyên Tunayê \| Metalên şikestî \| Tenîkeyên nokan \| Qavanozên bacanan |
| Cam | Konteynerên cam \| Badeyên cam |
| Plastîk | Şûşeyên plastîk ên bê depozîto \| Qotiyên plastîk |
| Ziblên têkilhev | Pîsiya heyvanên malê \| Pîneyên bebikan \| Pîneyên jinan \| Cilûbergên diriyayî \| Zibilên din ên nakevin nav çi kategoriyekê |

**4.** Malpera webê ya kierratys.info agahiyên girîng dihewîne derbarê vegerandinê û navendên berhevkirinê. Serlêdana wê bikin û yên nêzikî we binasin.

## Kirîn û firotina li şaredariya we

**1.** Bersiv li tabloya jêr dikarin bên dîtin.

| a | b | c | d | e | f |
|---|---|---|---|---|---|
| Rast | Rast | Rast | Xelet | Rast | Rast |

**2.** Bersiv diguherin.

## Banqe

1. Hesabê banqê hesabeke wisa ye ku hûn ji banqê distînin. Jimareyeke hesabê ya hesabê banqê heye.
2. Hesabê banqê dikare ji bo şandin û wergirtina pereyan bê bikaranîn.
3. Karta banqê karteke plastîk e ku hûn ji banqê distînin. Standina karta banqê dibe mesrefa pereyî çêbike. Wêneya li pêş mînakeke karta banqeyê ye.




4. Bi karta xwe ya banqê hûn dikarin ji makîneya perekişandinê pere bikişînin û li dikanan heqê kirînên xwe bidin.
5. Pênasên banqê dikarin ji bo erêkirina peredayînên online an jî ji bo gehîna xizmetên din ên online û carinan ji bo erêkirina nasnameya we ya li ser hin malperên webê tê bikaranîn.
6. Banqe dê pênasên we yên banqê ji we re bişîne. Pênasên banqê dikare bi telefona we jîr jî bên bikaranîn. Wêneya li aliyê rastê mînakeke pênasên banqeyê ye.



## Veguhastin

1. Rêwîtiya bi erebeyên veguhastina giştî piranî erzantir e.
2. Bersiv diguherin.
3. Bersiv diguherin.
4. Eger karta we ya veguhastina otobêsê tunebe hûn dikarin bi pere heqê xwe bidin. Di wan rojan de li hin şaredariyan hûn dikarin bi telefona xwe jî heqê xwe bidin.
5. Bersiv diguherin.
6. Nexşe “a” rêyên sereke li Fînlandê temsîl dike. Rêyên bi rengê sor rêyên asta yekem an jî“valtatiet” in û yên bi rengê zer rêyên asta duyem an jî “kantatiet” in.
7. Bilêt dikare li ji rawestgehên trênê, an jî ji înternetê bên kirîn. Di piraniya trênan de bilêt dikare li nav trênê bê kirîn. Piraniya mirovan di wan rojan de bilêtên trênê li ser înternetê dikirin. Her wisa sepanên mobîl hene ku mirov bi wan bilêtê li ser înternetê bikire. Binêrin ka ew li şaredariya we çawa pêk tê!
8. Nexşe “c” rêyên hesin li Fînlandê temsîl dike. Hûn dikarin bilêtan li ser malpera webê ya vr.fi bikirin.
9. Nexşe “b” balafirgehan li Fînlandê temsîl dike.
10. Bersiv diguherin.
11. Dema hûn bisîkletê diajon, girîng e ku mirov qaydeyên trafîkê bişopîne, serparêzekê bi kar bîne, li kesên ku dimeşin û ji kolanê derbas dibin miqate bibe.

## Cixarekişandin

1. Bersiv li tabloya jêr dikarin bên dîtin.

| Otobês | Hewş | Avahiya xwe | Erebeya xwe dema zarok di hundir de bin | Parq |
|---|---|---|---|---|
|  |  |  |  |  |

| Cihên wek qada cixare-nekişandinê îşaretkirî | Cihên wek qada cixare kişandinê îşaretkirî | Balafir | Kolan |
|---|---|---|---|
|  |  |  |  |

# Perwerdehî

**Dibistan û fêrbûn**



Ez dikarim li ku perwerdehiyê xilas bikim? Zarokên min li ku dikarin bixwînin? Ez demildest dest bi xwendinê dikim dema ez gihîştim Fînlandê? Ew hemû di nav vê beşê de ne.

**Di vê modulê de, hûn ê derbarê wan hîn bibin:**

- Xudankirina rojane û perwerdehiya pêş-dibistanê
- Dibistana giştî
- Dibistana Navîn
- Perwerdehiya pîşeyî û hîndarî
- Perwerdehiya bilind
- Hîndariya entegrasyonê ji bo koçberan
- Perwerdehiya bazara kar ji bo mezinan
- Wekheviya dereceyan
- Pirtûkxane

**Derbarê vê modulê li navnîşana jêr bixwînin mof.fi/sections/education/en an jî koda QR a li jêr bidin diyarkirin**

**Vê modulê online di vê navnîşanê de peyde bikin mof.fi/exercises/education/en an jî koda QR a li jêr bidin diyarkirin**

# Xudankirina rojane û perwerdehiya pêş-dibistanê

Wek neştecîyên şaredariyê, hûn dikarin serlêdanê ji bo ciheke xudankirina rojane ji bo zarokên xwe bikin. Di navendên xudankirina rojane de ew ê zimanê Fînî, karûbarên rojane û şiyanên civakî yên girîng hîn bibin. Karûbarên rojane yên li navendê hem çalakiyên hundir û derve yên wek leyîz, spartek, muzîk, huner û destkarî, û hem jî xwarinên bi hev re digire nav xwe. Heqê xudankirina rojane girêdayî qazanca aborî ya malbatê ye. Zarok di xudankirina rojane de gelek caran li derve dileyîzin, û divê malbat bi liberkirina zarokan a bi cilûbergên li gor rewşa avhewayê wan amadeyî vê yekê bikin. Zarok xwedî maf in ku ji bo yek salî biçin pêş-dibistanê beriya ku perwerdehiya sereke ya mecbûrî dest pê dike, ku bi giştî di temenê şeş de ye. Di perwerdehiya pêş-dibistanê de, zarok ê zanyariyan û şiyanan hîn bibin ku dê ji wan re bibe alîkar di dibistana giştî de.

**1.** Metnê bixwînin û hevokê bi bersiva rast timam bikin.

**a.** Perwerdehiya pêş-dibistanê bi qasî ____________________________ dikişîne.
yek sal | du sal | sê sal

**b.** Heqê xudankirina rojane ________________________________________________________.
ji bo herkesî wekhev e | girêdayî qazanca aborî ya malbatê ye

**c.** Zarok divê cilûbergên rêkûpek li ber bikin ji bo _______________________________.
çalakiyên hundir | çalakiyên derve | hem çalakiyên hundir û hem jî yên derve

# Dibistana giştî

De ka em metnê bixwînin.

Hemû zarokên ku bi awayekî mayinde li Fînlandê dijîn li ser wan ferz e ku perwerdehiya sereke ya mecbûrî wergirin. Ev ferzbûn di temenê 6 salî de bi perwerdehiya pêş-dibistanê dest pê dike. Piştê wê, zarok dest bi dibistana giştî dikin, ku bi qasî 9 salan didomîne û perwerdehiya sereke dide zarokan. Zarok bi gelemperî ku di temenê 7 salî de dest bi dibistana giştî dikin û di temenê 16 salî de dema mufredata wan a mecbûrî xilas dibe jî diqedînin. Dibistana giştî ji perwerdehiya asta seretayî û navîna jêr pêk tê. Asta seretayî ji pileyên 1 ta 6'ê digire nav xwe û navîna jêr jî ji pileyên 7 ta 9'ê digire nav xwe. Dêûbav berpirsyar in ku teqez bikin zarokên wan rojane berdewamî dibistanê bin.

**1.** Wek "Rast" an jî "Xelet" bersivê bidin û sedemê wê binivîsin.

**a.** Bi tenê zarokên Fînî mecbûr in ku perwerdehiya sereke wergirin, ji bo zarokên koçberan ew li gor tercîhê ye.

______________________________________________________________

**b.** Perwerdehiya mecbûrî ji bo pileyên 1 ta 6'ê ne.

______________________________________________________________

**c.** Dêûbav ji bo berdewamiya rojane ya zarokên xwe ya dibistanê berpirsiyar in.

______________________________________________________________

Zarok di dibistana giştî gelek mijarên mecbûrî dixwînin, wek matematîk, Fînî, Îngilîzî, dîrok, bîyolojî, û yên din. Hemû xwendekarên li Fînlandê beşdarî dersên perwerdehiya bedenî û hunerê dibin. Gelek dibistanên huner û destkariyê hene, û materyalên dîtbarî jî bi têrê di hînkirinê de tên bikaranîn. Piranî ji xwendekar re tê gotin ku destê xwe rake dema ku mafê axaftinê di polê de dixwaze. Li dibistanê zimanên cuda tên xwendin.

Zarokên Fînî cilûbergên dibistanê li xwe nakin; lewre dêûbav berpirsyar in ku bi zarokên xwe cilûbergên rêkûpêk û kêrhatî yên li gor demsalê û rewşa avhewayê bidin liberkirin. Ji bo dersên werzîş û perwerdehiya bedenî, zarok divê cilûberg û pêlavên werzîşê li ber xwe bikin. Dersên li dibistanên Fînî kêmzêde 45 deqîqe dirêj in. Di nav dersan de 15-deqîqe navber heye, û rojê carek navbera firavînê heye ku xwarin ji zarokan re tê dayîn.

**2.** Beşa yekê bi beşa duyem a eleqedar re têkildar bikin.

| | | | |
|---|---|---|---|
| **a** | Hemû zarok beşdar dibin | dersên werzîş û dersên hunerê. | **w** |
| **b** | Dêûbav berpirsyar in ku zarokên wan cilûbergên rêkûpêk li ber bikin | bi rakirina destê xwe. | **x** |
| **c** | Daxwaza mafê axaftinê di polê de tê kirin | li gor avhewa û werzîşê. | **y** |
| **d** | Ders 45 deqeyan dikişînin | û piştre jî navberên 15-deqîqe çêdibin. | **z** |

Ji zarokên penaberan ên ku hêj nû gehîştine Fînlandê re hînkirina amadekariyê tê dayîn ku wan ji bo dibistana giştî amade dike. Xwendekar perwerdehiya zimanê Fînî û mijarên din dibînin, û şiyanên xwe yên xwendin û nivîsînê bi hêz dikin. Di dibistana giştî de, zarokek penaber di dereceya herî guncav de tê bicihkirin ku li gor temen, zanyarî, û şiyanên wî an wê yê. Her wiha, hînkirina di mijarên din de jî ji bo yên nûhatî tê eyarkirin. Dîn jî li dibistana giştî û lîseyê ya Fînî de mijarên dersê ne. Mamosteyê wê li gor mezheba piraniya nifûsê tê eyarkirin.

**3.** Zarokên penaberan mijarên hînbûnê yên bi Fînî jî werdigirin. Li gor we ev yek kêrhatineke çawa bi xwe çêdike?

**4.** Hînkirina dînî li gor mezheba piraniya nifûsê tê rêxistinkirin, û dîsa jî dêûbavê zarokekê xwedî maf e ku hînkirina dînî ya li gor mezhebên xwe bixwazin, ew jî dê bê eyarkirin **eger îmkan hebin**. Li şûna hînkirina dînî, zarok beşdarî hînkirina exlaqî jî dibin. Li gor we divê dêûbav bikarin hînkirina dînê ku tercîh dikin ji bo zarokên xwe bixwazin? Li gor we hînkirina dînî ya li Fînlandê lazim e bi çi awayî bûya? Li gor nêrîna we ferqa wê û ya tecribeyên we yên demên berê heye?

---

---

!

- Çi li perwerdehiya pêş-dibistanê û çi jî dibistana giştî, dêûbav xwedî roleke girîng in di piştgirîdayîna perwerdehiya zarokan de.

**5.** Li tabloya pêş, terîfa hin pratîkên kifşe heye. Şîrove bikin bê ka ew pratîk dikare li Fînlandê bên dîtin an jî na, û hûn derbarê wan pratîkan çi difikirin û çima.

| | | **Li Fînlandê tê dîtin** | **Fikr û sedem nîşandan** |
|---|---|---|---|
| **a** | Keçik û kurik bi hev re dixwînin | | |
| **b** | Xwendekar navê yekem ê mamoste bi kar tînin | | |
| **c** | Xwarina firavînê li dibistanê | | |
| **d** | Cezadayîn | | |
| **e** | Dêûbav xwendina zarokên xwe dişopînin | | |
| **f** | Xwendekar radibin li ser piyan dema mamoste tê | | |
| **g** | Liberkirina cilûbergê dibistanê | | |
| **h** | Perwerdehiya rojê ji şeş saetan dirêjtir | | |
| **i** | Dersên avjeniyê | | |

**6.** Wek xwendekar, dibe ku hûn rastî hin rewşan bên ku ji bo tiştên nû bin. Wa ye çend mînak ku dibe pêk werin an jî neyên. Hûn ê çi bikin?

| | | |
|---|---|---|
| **a** | Kesekî hûn aciz kir an jî êrîşî we kir. | |
| **b** | Mamoste dixwaze bi we re hevdîtinê bike. | |
| **c** | Tiştek têkildarî dersê heye ku nayê fêmkirin | |
| **d** | Tiştek li malê qewimî û hûn nikarin spartekên xwe yên malê çêbikin | |
| **e** | Xwendekarekî ji we xwest ku hûn bi hev re xwarinê bixwin. | |

**7.** Wek dêûbav, hûn ê timî li gel mamosteyên zarokê xwe di nav têkiliyê de bin. Wa ye çend mînakên hin rewşan ku dibe pêk werin an jî neyên. Hûn ê çi bikin?

| | | |
|---|---|---|
| **a** | Mamoste dixwaze bi we re hevdîtinê bike. | |
| **b** | Zarokê we dê beşdarî çi çalakiyê nebe ku îtiraza we derbarê wê hebe. | |
| **c** | Zarokê we sparteka xwe ya malê çênekiriye. | |
| **d** | Zarokê we li dibistanê tevgerên nebaş nîşan dide. | |
| **e** | Zarokê we li dibistanê pêşveçûneke gelek baş pêk anî. | |
| **f** | Zarokê we naxwaze here dibistanê. | |

# Dibistana navîn a jortir

Metna li pêş ji malpera webê ya dersê hatiye wergirtin. Lînka vê rûpelê li destpêka vê modulê dikare bê dîtin. We ev dît? Ew dişibe mof.fi/sections/finland/en û hûn dikarin gelek zanyariyan bi dest bixin ku dê ji we re bibe alîkar ku hûn bersivên vê sparteka jêr peyde bikin.

> Kesek dikare serlêdana dibistana navîn a jortir bike bi sertîfîkaya xilaskirina-dibistanê ya ku ji dibistana giştî standî. Xwendin dikare di nav 2 ta 4 salan de bê xilaskirin. Armanca xwendinê ezmûnên dawî yên netewî ne, ku di wir de bi awayekî berfireh zanyariyên giştî tên testkirin. Piştî xilaskirina dibistana navîn a jortir xwendekar dîplomayekê distîne. Piştî bi awayekî serkeftî timamkirina ezmûnên ketina zanîngehê, xwendekar sertîfîkayeke ezmûna ketina zanîngehê distîne. Dibistana navîn a jortir ji bo xwendinên perwerdehiya bilind pêwîst dike.

1. Dibistana navîn a jortir kengê ye?

___

2. Dibistana navîn a jortir çiqas wext dikişîne?

___

3. Kîjan asta perwerdehiyê pêwîst dibîne ku dibistana navîn a jortir bê xilaskirin?

___

# Hîndariya pîşeyî

Li jêr du paragraf hene derbarê perwerdehiya pîşeyî, de ka em wan bixwînin.

| Perwerdehiya pîşeyî û hîndarî | Hîndariya perwerdehiya pîşeyî ji bo ciwanên koçber |
|---|---|
| Gelek zêde hejmarên enstîtuyên pîşeyî li Fînlandiyayê bijartinên fireh ji bo perwerdehiya pîşeyî û bernameyên hîndariyê pêşkêş dikin, ku kêrdariyan ji bo pîşeyên pratîkî didin. Di perwerdehiya pîşeyî de şexsekî ciwan dikare perwerde bibe û kêrdariya pîşeyî qazanc bike, ku kêmzêde 2 ta 3 salan dikişîne. Perwerdehiya pîşeyî gelek pratîk e. Xwendekar beşdarî pardemên hînbûnê û xebatên pratîkî dibin di kargehên cuda de. Kesek dikare serlêdana hîndariya pîşeyî bike yan bi sertîfîkaya xilaskirina-dibistanê ya ji dibistana giştî standî yan jî bi sertîfîkayeke wekhev ya perwerdehiyê. Ji ber ku zimanê hîndariya pîşeyî ya bernameyan Fînî ye, girîng e ku mirov di qonaxa destpêkê de zimanê Fînî hîn bibe. | Piştî xilaskirina perwerdehiya giştî kesek dikare dibistana pîşeyî yan jî dibistana navîn a jortir bibijêre. Eger ciwanekî koçber pêwîstî bi perwerdehiya zêdetir bi zimanên Fînî û Swêdî an jî mijarên din bibîne, dibe ku ew beşdarî pileya 10'em a perwerdehiya giştî an jî salek di hindariya pîşeyî de be. Di hîndariya pîşeyî ya amadekariyê de xwendekar şiyanên xwe yên zimanî pêşde dibin. Xwendekar di heman demê de şiyanên jiyana kar û pîşeyên cuda jî hîn dibin, û xwe amade dikin ji bo xwendinên pîşeyî yên bilindtir. Di heyama hîndariya amadekariyê de xwendekar dê xwedî firset bin ku hêz û daxwazên xwe yên şexsî yên pîşeyî bi nav bikin. |

**1.** Dibistana pîşeyî kengê ye?

**2.** Ferqa navbera perwerdehiya pîşeyî û dibistana navîn a jor çi ye?

**3.** Hîndariya amadekariya pîşeyî çi ye ji bo ciwanên koçber?

**4.** Li jêr hûn lîsteyeke taybetiyan dibînin. Bi nav bikin ka kîjan xasyetên hîndariya pîşeyî ya ji bo ciwanên koçber in û kîjan zêde edetî ne?

- **a.** Ji bo pîşeyekê amade dike
- **b.** Jiyanên zimanê Fînî bi hêz dike
- **c.** Dikare bi sertîfîkaya xilaskirina dibistana giştî an jî ya wekhev qeyd çêbe
- **d.** Ji bo perwerdehiya pîşeyî amade dike

**5.** Piştî perwerdehiya pîşeyî, hûn dikarin demildest dest bi karkirinê bikin an jî ji we re xwendina zêdetir lazim dike?

# Perwerdehiya bilind û zanîngeh

De ka em vê jêgirtina ji rûpela dersê bixwînin.


Li Fînlandê, perwerdehiya bilind dikare an lî zanîngehên zanistên sepanî an li zanîngehan bê standin. Xwendin dikare di nav 3 ta 4 an jî 5 salan de bê xilaskirin. Pêwîstiya ji bo qeydbûnê an sertîfîkaya dibistana navîn a jortir an jî sertîfîkaya perwerdehiya pîşeyî ye. Piraniya dereceyên zanîngehan ji dereceya lîsansê pêk tê, piştre jî dereceya masterê tê. Dibe ku ji bo bernameyên perwerdehiya bilind ezmûnên ketinê hebin.

**1.** Rast an jî xelet?

- **a.** Hûn dikarin bi tenê ji dibistana navîn a jortir derbasî perwerdehiya bilind bin.
- **b.** Perwerdehiya bilind bi tenê di zanîngehên zanistên sepanî de heye.
- **c.** Piraniya dereceyên zanîngehê dereceya lîsans û masterê digire nav xwe.

- Piştî dibistana giştî, kesek dikare tercîh bike ka biçe dibistana navîn a jortir an jî dibistana pîşeyî. Her du jî xwedî avantajên xwe ne.
- Dibistana pîşeyî ji bo kesên ku dixwazin jiyaneke pîşeyî bidin destpêkirin heye. Dibistana navîn a jortir ji bo wan kesên ku dixwazin zêdetir bixwînin heye. Ji we re tercîhek tê dayîn.
- Eger pêwîstiya we bi ziman û şiyanên din hebe, hûn dikarin saleke din a zêdeyî ji bo amadekariyê hilbijêrin. Li şaredariya xwe derbarê vebijarkan bipirsin.

**2.** Piştî ku hûn niha dizanin ka sîstema perwerdehiyê ya Fînî çawa dişixule, rêka ku hûn, zarokê we an jî eqrebayê we dikare bişopîne xêz bikin. Eger pirsên we hebin li gel mamosteyê xwe niqaş bikin an jî bipirsin.




- Rêka perwerdehiya pîşeyî di normalê de ji rêka perwerdehiya bilind zûtir e, dîsa jî her du xwedî avantajên xwe ne. Li gel dibistan, kargeh an jî xebatkarên ofîsa xizmetê derbarê vebijarkên xwe niqaş bikin.

# Hîndariya entegrasyonê ji bo koçberan

Piştî ku niha hûn dizanin ka sîstema perwerdehiyê ya Fînî bi giştî çawa dişixule, gelo em bala xwe hinekî nedin ser rewşên din dema ku koçberek temen mezin bi xwendinên pêş an jî bêyî xwendinê pêş ên li welatekî din tê Fînlandê? Hûn pê bizanin, dîsa jî beriya destpêkirina we pirseke gelek girîng heye ku divê hûn bersiva wê bidin.

**1.** Kîjan armancên têkildarî-perwerdehiyê an jî têkildarî-kardariyê hûn dixwazin li Fînlandê bi dest bixin?

De ka em metna jêr bi hev re bixwînin.

Piştî hatina wan a li welêt, koçberan di bernameyeke entegrasyonê ya hîndariyê de qeyd dikin, ku xwendinên bi zimanê Fînî, xebatên civakî, şiyanên jiyana rojane, zanyariyên çandî, û her wekî pêşniyarên xwendinê û şêwirmendiya derbarê perwerdehiya zêdetir û kardariyê digire nav xwe. Her wiha, bername pardemên hînkirinê yên li kargehê jî dihundirîne.

**2.** Li gor nêrîna we çi pêwîst e da ku hûn bigihîjin armanca xwe? Ew ên ku li gor pêwîst dikin dora wan xêz bikin.

Zimanê Fînî | xebatên civakî | şiyanên jiyana rojane | zanyariyên çandî | şêwirmendiya derbarê perwerdehiya zêdetir û kardariyê | şagirtî | pîlana şexsî ya ji bo perwerdehiya zêdetir

**3.** Tişteke din heye li gor nêrîna we pêwîst dike da ku hûn bigihîjin armanca xwe?

# Perwerdehiya Pîşeyî û hîndariya ji bo mezinan û hîndariya bazara kar ji bo mezinan

Her wekî koçberên ciwan, koçberên temen mezin jî dikarin serlêdanê ji bo perwerdehî û hîndariya pîşeyî bikin da ku kêrdariyeke pisporane bi dest bixin ku di bazara kar a Fînî de pêwîst dike. Serlêdar dikare serlêdanê bike eger ku ew xwedî sertîfîkaya dibistana giştî an jî sertîfîkayeke wekhev a perwerdehiyê be. Şiyanên bi têrê yên bi zimanê Fînî jî tê xwestin. Bila di bîra we de be ku hûn sertîfîkayên xwe yên perwerdehiyê bi xwe bînin eger ku li ba we hebin. Xilaskirina dereceyeke pîşeyî ya li Fînlandê tê pêşniyarkirin, ji ber ku ew pozîsyona koçber a di bazara kar de bi hêz dike.

Koçberên bêyî kar, yên ku hîndariya elimandinê xilas kirine û asta pêwîst a zimanê Fînî ya ku ji bo perwerdehiya pîşeyî tê xwastin bi dest xistine, xwedî heq in ji bo hîndariya bazara kar. Hîndariya bazara kar ji bo jiyana kar e û ji çendîn mijaran pêk tê, û gelek caran rêya kêrdariyeke tam an jî qismî ya pîşeyî vedike.

1. Her du pêwîstiyên ji bo serlêdana perwerdehiya pîşeyî li Fînlandê kîjan in?

2. Çima timamkirina perwerdehiya pîşeyî tê pêşniyarkirin?

3. Kî ji bo hîndariya bazara kar xwedî heq e?

4. Hîndariya bazara kar gelek caran rêya çi vedike?

5. Li jêr hûn dikarin lîsteyeke armancan peyde bikin. Ew ên ku bala we dikişînin bibijêrin û texmîn bikin ka ji bo bidestxistina wan çiqas dem dixwaze.

   **a.** Hînbûna Fînî | ______ meh(an) / sal(an)

   **b.** Hînbûna Swêdî | ______ meh(an) / sal(an)

   **c.** Qeydbûna li bernameya pîşeyî ya amadekarî | ______ meh(an) / sal(an)

   **d.** Qeydbûna li bernameyeke dereceyeke pîşeyî | ______ meh(an) / sal(an)

   **e.** Qeydbûna li bernameyeke lîsansê | ______ meh(an) / sal(an)

   **f.** Qeydbûna li bernameyeke masterê | ______ meh(an) / sal(an)

   **g.** Wergirtina şagirtiya min a yekem | ______ meh(an) / sal(an)

   **h.** Wergirtina kardariya min a yekem | ______ meh(an) / sal(an)

   **i.** Destpêkirina şîrketa min | ______ meh(an) / sal(an)

# Akredîtasyona tehsîl û dereceyên li derveyê welêt timamkirî

Eger dereceyek we hebe ku we ji welatekî din standibe, hûn dikarin ji bo akredîtasyonê wê serlêdanê bikin. Hûn dikarin derbarê Dezgeha netewî ya Fînî ya ji bo Perwerdehiyê bixwînin, ku hûn ji bo akredîtasyona xwe serlêdanê dikin li navnîşana oph.fi/english/services/recognition an jî bi diyarkirina koda QR a hane.

1. Tam li vê niqteya ku hûn lê ne, tiştekî pir girîng heye ku mirov bîne bîra xwe derheqê derece û sertîfîkayan. De ka em wê hîn bin bi timamkirina paragrafa pêş bi peyvên winda.

Girîng e ku hûn hemû belgeyên __________________________ an jî kopiyên tesdîqkirî

yên perwerdehiya sereke, ______________________________________pîşeyî, bernamey

ên____________________________________ û __________________________ kar li gel xwe bînin

Fînlandê. Ya baştirîn ew e ku ji niha we wan kopiyan bidin ______________________________

û wergerandin bi zimanê _________________________________.

tecribeya | perwerdehiya | derece | resen | Îngilîzî | tesdîqkirin

!

- Koçberên temen mezin xwedî hîndarî û şêwirmendiyê ne ji bo perwerdehiya zêdetir û kardariyê, her wekî ji bo şagirtiyê jî.
- Gehîna bi perwerdehiya pîşeyî ya ji bo ku hûn şiyanên xwe pêşde bibin da ku kêrdariyên bazara kar pêşwazî bikin, ji bo koçberên temen mezin jî berdest e.
- Eger sertîfîkayên we hebin, wan wergerînin û bi xwe re bînin Fînlandê.

# Pirtûkxane û çalakiyên dermufredatê

Piraniya şaredariyên li Fînlandê xwedî pirtûkxaneyeke gel in, ku ji hemû niştecîyan re vekirî ye. Hûn dikarin pirtûkan deyn bistînin an jî wek mînak kovarên cuda bi zimanên cuda bê pere bixwînin. Hûn dikarin înternetê bi kar bînin û li pirtûkxaneyê ders bixebitin jî. Divê hûn ji bo karta pirtûkxaneyê serlêdanê bikin da ku bikarin ji pirtûkxaneyê pirtûkan deyn bistînin.

**1.** De ka em hîn bin ka hûn dikarin li ku derê Fînlandê pirtûkxaneyan peyde bikin. Herin malpera webê ya hakemisto.kirjastot.fi an jî serlêdana malpera webê bikin bi diyarkirina koda QR a hane.

**2.** Kîjan hobîyên we hene? Li gor fikra we hobîya we li Fînlandê tê pêkanîn? Eger hobîya we li Fînlandê an jî li şaredariya we ya nû peyde nebe, hûn amade ne ku klûbekê bi xwe bidin destpêkirin?


___________________________________________

___________________________________________

___________________________________________




Piştî ku niha we modul xilas kir, de ka em tiştên ku hûn hîn bûne kurtebir bikin.



**Peywîra zêdeyî!**
Hîn bin ka hûn li ku dikarin hobîya xwe pêk bînin li navnîşana harrastushaku.fi an jî bi diyarkirina koda QR. Eger pêwîstiya we bi alîkariyê ya zimanê Fînî hebe, ji mamoste, hevkar, an jî şêwirmenên xwe alîkariyê bixwazin.

- Sîstema perwerdehiyê ya li Fînlandê wek perwerdehiya herî baş a li cîhanê tê qebûlkirin. Armancên xwe yên şexsî diyar bikin û baş bixebitin da ku hûn serkeftinên ku di jiyana xwe de hêvî dikin bi dest bixin.

# Bersiv

## Xudankirina rojane û perwerdehiya pêş-dibistanê

**1.** Bersiv li tabloya jêr dikarin bên dîtin.

| a. | b. | c. |
|---|---|---|
| yek sal | girêdayî qazanca aborî ya malbatê ye | hem çalakiyên hundir û hem jî yê derve |

## Dibistana giştî

**1.** Bersiv li tabloya jêr dikarin bên dîtin.

| | | |
|---|---|---|
| a. | Xelet | Perwerdehiya sereke ji bo hemû zarokan mecbûrî ye ku bi awayekî mayinde li Fînlandê ne. |
| b. | Xelet | Perwerdehiya mecbûrî ji bo pileyên 1 ta 6'ê û 7 ta 9'ê ye. |
| c. | Rast | Dêûbav mecbûr in ku teqez bikin ku zarokên wan bi berdewamî biçin dibistanê. |

**2.** Bersiv li tabloya jêr dikarin bên dîtin.

| a. | b. | c. | d. |
|---|---|---|---|
| w. | y. | x. | z. |

**3.** Bersiv diguherin, dîsa jî bila di hişê we de be ku hînkirina bi Fînî piştgiriyê dide pêşveçûna şiyanên ziman û xwendekaran amade dike ji bo derfetên baştir ên perwerdehiyê.

**4.** Bersiv diguherin. Derfetan li gel rayedarên dibistanê niqaş bikin. Bi gelemperî, hînkirina dînî ya li Fînlandê giraniyê dide li ser hînkirina objektîf a dîrok û pratîkên dînî. Hînkirina rewîştî jî bi gelemperî heye.

**5.**

**a.** Keçik û kurik bi hev re dixwînin li Fînlandê. Ev yek ji ber gelek sedeman tiştekî baş e. Bi gelemperî, di navbera zayendan de çi cudatî tune di civaka Fînî de.

**b.** Xwendekar navê yekem ê mamoste bi kar tînin li Fînlandê. Ev tiştekî baş e ji ber ku ew hîyerarşiyê ji holê radike, ku bi gelemperî di civaka Fînî de kêm tê dîtin. Bikaranîna navê yekem ê mamoste nayê vê wateyê ku hûn bêhurmetiyê dikin.

**c.** Li Fînlandê xwendekar firavînê li dibistanê dixwin dema navbera xwarina nîvro. Ev piranî tiştekî baş e ji ber gelek sedeman. Di hin dibistanan de, xwarin tê dayîn û qalîteya xwarinê jî baş tê teqîbkirin. Eger pirsgirêkên we yên derbarê xwarinê hebin, rêveberiyê agahdar bikin.

**d.** Cezakirina bi şiklekî fîzîkî li Fînlandê qedexe ye. Ev qedexe tiştekî baş e ji ber ku mafê tu kesî tune bi awayekî zererdayînê destê xwe li yekî din bide. Encamên wê li gor rewşê û cureyê muameleya xirab diguhere.

**e.** Dêûbav pêşveçûna perwerdehî ya zarokên xwe li Fînlandê dişopînin. Ev yek tiştekî baş e ji ber ku destûrê dide dêûbavan derbarê hûnbûna zarokên xwe agahdar bin û alîkariya wan bikin.

**f.** Xwendekar ranabin li ser piyan dema mamoste dikeve hundir. Ev tiştekî baş e ji ber ku hîyerarşiyê ji holê radike. Hûn dikarin ji mamosteyên xwe hurmetê nîşan bidin bi rêya hînbûnê û alîkarbûnê di dema dersan de.

**g.** Xwendekar cilûbergên dibistanê li ber nakin li Fînlandê. Ev tiştekî baş e ji ber ku nekarîna mirov a kirîna cilûbergên dibistanê nabe astengî da ku mirov neçe dibistanê, û ji ber ku xwendekar azad in da ku biryara derbarê cilûbergên xwe bidin bi şertê ku ew li gor hawirdora dibistanê û rewşa avhewayê be.

**h.** Rojên xwendinê li dibistana giştî bi gelemperî rojê şeş saetan zêdetir nîne. Ev tiştekî baş e ji ber gelek sedeman, ji ber ku ji xwendekaran re ji bo çalakiyên dermufredatê wext jî çêdibe.

**i.** Avjenî piranî parçeyeke mufredatê ye li Fînlandê. Ev tiştekî baş e ji ber ku çalakiya fîzîkî teşwîq dike. Şiyanên avjeniyê li Fînlandê girîng in ji ber hijmara golan û hebûna deryayê. Eger fikarên we derbarê vê yekê hebin, li dibistanê niqaş bikin.

**6.**
**a.** Zûka mamosteyê xwe agahdar bikin. Li bendê nesekinin an jî hêvî nekin ku rewş baştir bibe.
**b.** Ji bo hevdîtinê xwe eyar bikin û di dema xwe de amade bin.
**c.** Her tim bipirsin dema ku tiştek neyê fêmkirin.
**d.** Mamosteyê zûka xwe agahdar bikin.
**e.** Her tim baş e ku mirov mirovên nû nas bike. Eger kêfa we bi hev re xwarinê tê hîngê wisa bikin, eger na vê çaxê bi awayekî kubar û bi rêzdarî red bikin.

**7.**
**a.** Ji bo hevdîtinê xwe eyar bikin û di dema xwe de amade bin.
**b.** Ji bo zarokê xwe beşdarbûnê qedexe nekin. Rayedariyê agahdar bikin derbarê fikarên xwe.
**c.** Cezayê nedin zarokê xwe. Bi zarokê xwe re biaxivin. Li gel mamoste derbarê fikarên xwe biaxivin.
**d.** Cezayê nedin zarokê xwe. Bi zarokê xwe re biaxivin. Li gel mamoste derbarê fikarên xwe biaxivin.
**e.** Zarokê xwe xelat bikin û wî teşwîq bikin.
**f.** Cezayê nedin zarokê xwe. Bi zarokê xwe re biaxivin. Li gel mamoste derbarê fikarên xwe biaxivin.

## Dibistana navîn a jortir

1. Dibistana navîn a jortir piştî dibistana giştî ye.
2. Dibistana navîn a jortir ji 2 ta 4 salan dikişîne.
3. Dibistana navîn a jortir ji bo xwendinên perwerdehiya bilind pêşmercek e.

## Hîndariya pîşeyî

1. Piştî xilaskirina perwerdehiya giştî kesek dikare dibistana pîşeyî yan jî dibistana navîn a jortir bibijêre.
2. Perwerdehiya pîşeyî gelek pratîk e. Xwendekar beşdarî gelek pardemên hînbûn û xebatên pratîkî dibin di kargehên cuda de.
3. Eger ciwanekî koçber pêwîstî bi perwerdehiya zêdetir bi zimanên Fînî û Swêdî an jî mijarên din bibîne, ew dibe ku beşdarî pileya 10'em a perwerdehiya giştî an jî salek di hindariya pîşeyî de be.
4. Bersiv li tabloya jêr dikarin bên dîtin.

| | a | b | c | d |
|---|---|---|---|---|
| Perwerdehî û hîndariya pîşeyî ji Fînî û koçberan re | × | | × | |
| Hîndariya perwerdehiya pîşeyî ji bo ciwanên koçber | × | × | × | × |

5. Her du jî; piştî perwerdehiyên pîşeyî hûn an dikarin demildest dest bi kar bikin an jî bêtir xwendinê bikin.

## Perwerdehiya bilind û zanîngeh

1. Bersiv li tabloya jêr dikarin bên dîtin.

| a. | b. | c. |
|---|---|---|
| Xelet | Xelet | Rast |

2. Bersiv li gor xwestekên we yên şexsî diguherin.

## Hîndariya entegrasyonê ji bo koçberan

1. Bersiv li gor xwestekên we yên şexsî diguherin.
2. Bersiv diguherin. Di hişê xwe de bigirin ku gelek ked pêwîst dike û şiyanên ziman mifteya xwendin û karkirinê ye li Fînlandê.
3. Bersiv li gor xwestekên we yên şexsî diguherin.

## Perwerdehiya pîşeyî û hîndariya ji bo mezinan û hîndariya bazara kar ji bo mezinan

1. Di nav pêwîstiyan de sertîfîkayeke ji dibistana giştî an jî sertîfîkayeke wekhev a perwerdehiyê, û her wisa şiyanên bi têrê yên bi zimanê Fînî hene.
2. Xilaskirina dereceyeke pîşeyî ya li Fînlandê tê pêşniyarkirin ji ber ku ew pozîsyona koçber a di bazara kar de bi hêz dike.
3. Koçberên bêyî kar, yên ku hîndariya elimandinê xilas kirine û zimanê Fînî baş dizanin xwedî heq in ji bo hîndariya bazara kar.
4. Hîndariya bazara kar gelek caran rêya kêrdariyeke tam an jî qismî ya pîşeyî vedike.
5. Bersiv li gor xwestekên we yên şexsî diguherin.

## Akredîtasyona tehsîl û dereceyên li derveyê welêt timamkirî

1. resen | perwerdehiya | derece| tecribeya | tesdîqkirî | Îngilîzî

## Pirtûkxane û çalakiyên dermufredatê

1. Bersiv li gor cihê hûn lê diguherin.
2. Bersiv li gor xwestekên we yên şexsî û cihê hûn lê diguherin.
   Bizanin ku destpêkirina we ya klûbeke nû ji bo hobîya xwe tê teşwîqkirin.
3. Bersiv diguherin.

# Kardarî

**Karkirin li Fînlandê**



Li Fînlandê lêgerîna kar cuda ye? Taybetiya kar cuda ye? Di vê dersê de hûn ê hîn bibin ku xebata li Fînlandê pêwîstî bi zanîna zimanê lokal û keda şexsî dibîne.

**Di vê modulê de, hûn ê derbarê wan hîn bibin:**

- Pîlana entegrasyonê
- Hîndarî ji bo koçberan
- Lêgerîna kar
- Bacdayîn
- Mecbûriyet û mafên we
- Çanda kar


**Derbarê vê modulê li navnîşana jêr bixwînin mof.fi/sections/employment/en an jî koda QR a li jêr bidin diyarkirin**

**Vê modulê online di vê navnîşanê de peyde bikin mof.fi/exercises/employment/en an jî koda QR a li jêr bidin diyarkirin**

# Pîlana entegrasyonê û hîndarî ji bo koçberan

Girîng e ku mirov di hişê xwe de bigire ku zimanê hawirdora kar a Fînî piranî Fînî ye. Kargehên ku zimanê kar Îngilîzî an jî zimanekî din ê biyanî be pir bi sînor in. Ji bo ku li Fînlandê bên kardarkirin, divê hûn ziman hîn bibin. Dê bi kêrî we bê eger hûn ji niha ve dest bi hînbûna ziman bikin beriya çûna Fînlandê da ku entegrasyona xwe leztir bikin.

1. Karên ku hûn dixwazin û derbarê wan karan pênaseyeke kurt binivîsin li ser wan nîşeyan.
2. Kîjan şiyan ji we re pêwîst in da ku hûn bigihîjin wan armancan? Wan şiyanan binivîsin.



!

- Peydakirina karekê li Fînlandê hînbûna ziman, hînbûna şiyanên nû, û keda şexsî pêwîst dike.

Ji bo ku hûn karê ku dixwazin bi dest bixin, hûn rastî gelek zehmetiyan bên.
Ji bo ku hûn wan zehmetiyan têk bibin, ji we re şiyan û zanyariya derbarê sîstema kardarkirinê ya Fînî, û tiştên din lazim in.

**3.** Li jêr hûn dikarin hin pêwîstiyên sereke bibînin da ku karekê li Fînlandê peyde bikin. Wan pêwîstiyan bi şiyanên ku we di pirsa beriyê de nivîsî bidin li ber hev.

| **Pêwîstî** | X |
|---|---|
| Şiyanên zimanê Fînî | |
| Sertîfîkayên fermî yên noter tesdîqkirî | |
| CV ya ku tê de şiyan û tecribe û serlêdana kar a Fînî hebe | |
| Perwerdehiya fermî ya di qada têkildar an jî xweserê wî karî de | |
| Tecribeya kar a di qada têkildar an jî xweserê wî karî de | |
| Torên civakî | |

**4.** Li gor nêrîna we, hûn çiqas hêsan dikarin karê ku dixwazin peyde bikin? Hûn ê destpêkirina bi karên din bifikirin ku dê şiyanên nû bide we û hûn ê karîyera xwe ji wir ava bikin?

______________________________

______________________________

______________________________

Pirsên we yên zêdetir hene derbarê karên din û pêwîstiyên wan?
Bê dudilî ji mamosteyê xwe bipirsin.

!

- Beriya ku hûn karê ku dixwazin bi dest bixin, dê pêwîst bike hûn baş perwerdehiyê bibînin û gelek xebatê bikin. Pîlana entegrasyonê dê ji we re bibe alîkar.

De ka em metna li jêr bixwînin û bersiva hin pirsan bidin. Versîyoneke dirêjtir a vê metnê dikare li malpera webê ya dersê bê peydekirin, û lînka ji bo vê malpera webê dikare di rûpela yekem a vê modulê de bê dîtin; ew dişibe vê mof.fi/sections/employment/en.

Dema hûn li şaredariya xwe bi cih bûn, qeyda xwe li Ofîsa Kardarî û Pêşveçûna Aborî (ofîsa TE) wek kesekî kar lêger çêbikin. Wek penaberê kotayê hûn xwedî mafê pîlana entegrasyonê ne ji bo sê salên pêşîn ên niştecîbûna we ya li Fînlandê. Di nav wê de perwerdeya ziman, şagirtî, hîndariya amadekariyê ji bo jiyana kar, û hîndariya pîşeyî hene. Yekemîn, nirxandineke destpêkê dê li ser paşxaneya we ya perwerdehiyê, tecribeya we ya kar, û şiyanên ziman bê çêkirin. Koçberên temen mezin piranî bi pardemeke hîndariyê dest bi bernameya xwe ya entegrasyonê dikin, ku giraniyê dide ser ziman. Eger li malê zarokên biçûk hebin, bernameyeke entegrasyonê ya hîndariyê ya sist dikare ji bo dayîkê bê çêkirin.

**5.** Navê ofîsa kardariyê çi ye?

**6.** Navê pîlana ku hûn ê di amadekariyê de beşdar bin çi ye? Behsa kêmtirîn du beşên vê pîlanê bikin.

**7.** Dê derbarê çi ji we bê pirsîn dema amadekirina pîlanê?

**Peywîra zêdeyî!**
De ka em serlêdana malpera ofîsa-TE bikin di te-palvelut.fi de an jî bi diyarkirina koda QR a li pêş.

# Lêgerîna kar

Di vê spartekê de, hûn ê CV'yekê çêbikin. De ka em bi xwendina metnê dest pê bikin.

Lêgerîna kar li Fînlandê çalakbûneke şexsî û têkiliyên torê pêwîst dike, û koçber jî di vê pêvajoyê de tên destegkirin. Fînî û koçber bi şiklekî wekhev karîyera xwe didin destpêkirin bi xebata di karê xwe de ku ji wan re qazancekê çêdike û ji hêleke din ve jî têkiliyên torê çêdikin û şiyanên xwe pêşve dibin. Beriya ku hûn biçin hevpeyvîna xwe ya kar û karê xwe yê yekem bi dest bixin, dê pêwîst bike ku hûn bi CV'yekê serlêdanê bikin.

Di nav CV'yekê de agahiyên derbarê perwerdehiya we, dîroka we ya karkirinê, û her wisa şiyanên we hene. Eger çi dîrokeke we ya karkirinê ya fermî tunebe, hûn dikarin tecribeya xwe ya kar ya ne-fermî jî daxil bikin, tecribeyên wek xudankirina zarokan an jî pêkanîna karên malê. Kurteya we nivîsî divê bi Fînî be. Hin herêmên Fînlandê, lazim e hûn bi Swêdî bizanin. Hûn dikarin gelek mînakên nivîsandina CV'yê ya bi zimanê Fînî peyde bikin eger hûn lêgerînê bi peyva "ansioluettelo" an jî bi Swêdî peyva "meritförteckning" bikin li ser înternetê. Di vê sparteke de, mînakek ji ansioluettelo.net hatiye wergirtin da ku em bibînin ka CV'yek basîd bi Fînî çawa ye.

Di rûpela pêş de CV'yek nimûne heye. De ka em li wê binêrin û pirsan bixwînin da ku wê dagirin.

**1.** Bi nivîsandina agahiyên şexsî dest bi nivîsandina CV'yê bikin. Di nav wan de nav, dîroka jidayîkbûnê, navnîşan, û agahiyên têkiliyê hene.

**2.** Di beşa bi navê "työkokemus" de, dîroka xwe ya kar binivîsin. Di mînakê de, ew şexs ji bo Nakkikioski Ry di navbera Sibat 2002 û Hezîran 2007'an de wek firoşkar, an jî bi Fînî wek "myyjä" kar kiriye.
   - Ka derbarê we çi hene? Çi tecribeyên we yên kar hene?
   - Dîroka wê, navê karsaz, xebata ku we dikir, û eger mimkun be pênaseyeke kurt a peywîrên xwe binivîsin. Hewl bidin bînin bîra xwe ka kîjan tecribeyên we yên kar çêbûne her çiqas girîng xuya nekin jî, wek mînak çiraxtiya li ba berber, ji weqfekê xebata xwarinçêkeriyê ya bi dilsozî ya bi çend mehan, an jî tiştek wek wan.
   - Eger çi tecribeyên we yên kar ên berê tunebe, xem nekin. Hûn ê di demeke nêzik de stajyerî û kargehên ku hûn ê li mala xwe ya nû bi dest bixin bikarin lê zêde bikin.

**3.** Beşa "koulutus" ew beş e ku hûn dîroka xwe ya perwerdehiyê dinivîsin. We çi perwerdehî dît? We li ku perwerdehî dît? Navên dibistanên ku hûn çûnê û dereceyên we standî binivîsin.
Di CV'ya nimûne de, ev şexs di navbera Tebax 2007 û Gulan 2010 de çûye lîseya Mallila, yanî "Mallilan lukio" yê û wek mezûnê lîseyê an jî wek "ylioppilas" xilas kiriye.
Eger çi perwerdehiya we ya fermî tunebe, hûn dikarin vê beşê vê gavê vala bihêlin.

!

- Kardarên Fînî dê qîmetê bidin zanyariya we ya Fînî ya hem nivîskî û hem jî devkî.

**Etunimi Sukunimi**
Syntynyt 1.1.1900
Esimerkkitie 1
00000 KUNTA
Puh. 000 123 4567
etunimi.sukunimi@email.com

**ANSIOLUETTELO**

05.05.2015

---

**PROFIILI**

**TYÖKOKEMUS**

| | |
|---|---|
| 09/2014 - | **Yritys Oy**<br>Titteli / työtehtävä<br>Tarkempi kuvaus työtehtävistä. Voit myös kertoa saavutuksistasi tai työssä hankkimastasi erityisosaamisesta. |
| 02/2002 - 06/2007 | **Nakkikioski Ry**<br>Myyjä |

**KOULUTUS**

| | |
|---|---|
| 08/2010 - 05/2014 | **Oppilaitos**<br>Tutkinto |
| 08/2007 - 05/2010 | **Mallilan lukio**<br>Ylioppilas |

**KURSSIT**

Hygieniapassi, myönnetty 1.1.2008

**KIELITAITO**

| | |
|---|---|
| suomi | äidinkieli |
| englanti | erinomainen |
| ruotsi | perusteet |

**IT-TAIDOT**

| | |
|---|---|
| Microsoft Word | Hyvä |
| Microsoft Excel | Perusteet |
| AutoCAD | Erinomainen |

**HARRASTUKSET**

Kuntosali, lenkkeily

**SUOSITTELIJAT**

**Erkki Esimerkki, Esimies, Yritys Oy**
Erkki toimi esimiehenäni työskennellessäni Yritys Oy:ssä ohjelmistokehittäjänä.
Puh: 040 123 4567, sähköposti: erkki.esimerkki@yritysoy.fi

4. Li Fînlandê, “Hygieniapassi” an jî Pasaporta Hîjyenê, ku dikare di beşa “kurssit” a CV’ya nimûne de bê xwendin ji bo herkesê ku dil dike li restoranekê û karê xwarinê çêkirinê bixebite tiştekî mecbûrî ye, li gel tiştên din.
   - Ka derbarê we çi hene? Ji bilî dibistanê, hûn beşdarî qurs an jî hîndariyên din bûne? Wan binivîsin.

5. Beşa “kielitaito” ji bo zimanan e. Hûn dikarin texmîn bikin ka kîjan ziman kîjan e?

| | |
|---|---|
| suomi | Îngilîzî |
| englanti | Fînî |
| ruotsi | Swêdî |

   - Destpêkê zimanên ku hûn dizanin binivîsin.
   - Aliyê rastê hûn peyvên “äidinkieli”,”erinomainen”, û “perusteet” dibînin. Peyva “äidinkieli” tê wateya zimanê dayîkê, û ji “äidin” û “kieli” pêk hatiye. Di beşa nav,“kielitaito”, de hûn peyva “kieli” jî dikarin bibînin, ku tê wateya “şiyanên ziman”. Peyva “erinomainen” û “perusteet” bi dorê tên wateyên “gelek baş” û “sereke”.
   - Niha jî binivîsin ka hûn çiqas baş wan zimanan dizanin.

6. Di mînakê de hûn dikarin peyvên “Microsoft Word” û “MicrosoftExcel” bixwînin. Ew bernameyên kompîtirê ne ku ji bo nivîsandin û serastkirina tiştên nivîskî li ser kaxezê û tabloyan tên bikaranîn, li gel yên din. Zanînan wan li Fînlandê gelek berbelav e. Ji hêla din ve jî, AutoCAD bernameyeke sêwirandinê ye. Li ser esasê wan zanyariyan hûn dikarin texmîn bikin ka IT-Taidot çi ye? Ew derheqê şiyanên têkildarî-kompîtirê ye. Bînin bîra xwe ku di hemû rewşan de nebe jî di piraniyan de, hûn ê mecbûr bimînin CV’yê bi emaîlê bişînin.
   - Niha jî şiyanên xwe yên têkildarî-kompîtirê binivîsin.

   Li hêla rastê, hûn peyvan dibînin ku dinirxînin ka hûn çiqas baş dizanin. Li gel peyvên ku we beriyê xwendibûn, peyva “hyvä” jî tê wateya baş.
   - Niha jî binivîsin ka hûn di her şiyanê de çiqas baş in.

7. Hobî an mijûliyên we hene? Hûn ji rîstinê an jî leyîza setrencê hez dikin? Hûn ji temîrkirina makîneyan û xwendinê hez dikin? Wê di nav “harrastukset” de binivîsin.

8. Dawiyê, di beşa“suosittelijat” de navên mirovên ku karê we dinasin an jî mirovên ku hûn ji bo wan xebitîne an jî hûn bi hev re xebitîne binivîsin.

9. Pîroz be! Niha CV’yeke we ya nimûne heye.

**Peywîra zêdeyî!**
Li gel CV’yê, gelek caran nameyeke motîvasyonê tê şandin. De ka em serlêdana ansioluettelo.net bikin û li peyva “työhakemus” bigerin da ku hîn bin ka nameya motîvasyonê çi ye. Hewl bidin ku di înternetê de lê bigerin ji bo dîtina mînakên din.

!

- Ji bo dîtina karekê dibe ku ji we re pêwîst bike ku hûn şiyanên nû hîn bin an jî şiyanên xwe yên beriya hatina Fînlandê rojane bikin. Dibe ku ev yek wext bigire, lê her ked dê we nêziktirî kargehekê bike.

Li kêleka xwedîbûna şiyanên rojane, çend faktorên din hene ku dikarin ji we re bibin alîkar dema nêçîra we ya kar. De ka em hîn bibin ka hûn çawa dikarin lêgerîna xwe ya kar pêşde bibin.

**10.** Hûn li welatekî din ê ji bilî Fînlandê li kar geriyan? We karek dît? We çawa ew dît?

______________________________

______________________________

**11.** Li gor nêrîna we, rêya zûtirîn a peydekirina kar çi ye?

- **a.** Ofîsa kardariyê
- **b.** Heval
- **c.** Reklamên kar
- **d.** Înternet
- **e.** Saziyên taybet ên kar

**12.** Li gor baweriya we peydekirina kar a li cihê niha hûn lê û li Fînlandê bi heman awayî ye?

______________________________

**13.** Hûn çi rêyên din ên peydekirina kar dizanin? We an jî kesekî hûn dinasin beriya niha karê xwe bi xwe daye destpêkirin?

______________________________

**14.** Çiqas kar li gor baweriya we bi rêya têkiliyên torê tên dîtin?

- **f.** 5%
- **g.** 25%
- **h.** 45%
- **i.** 65%
- **j.** 85%

**15.** Eger ji we re bihata gotin ku rêje 85% e? Li gor nêrîna we ew dane derbarê têkiliyên torê ji we re dê bihata çi wateyê?

______________________________

______________________________

**16.** Hûn li welatê xwe yê nû tora xwe ya têkiliyan çawa ava bikin ku hûn li wir ziman baş nizanin? Bi hevalên xwe niqaş bikin.


______________________________

**!**

- Tora têkiliyê yek ji navgînên herî alîkar e dema hûn li karekî digerin.
- Tora têkiliyê dê ji kesên din re bibe alîkar ku taybetiya karê we bizanin û di hînbûna Fînî de bibin alîkar.
- Gelek mirov li Fînlandê rêya xwe-kardarkirinê tercîh dikin: Tora têkiliyê di vî warî de jî kêrhatî ye.

# Bacdayîn

Li Fînlandê, beriya destpêkirina karê xwe, lazim e hûn karteke Bacê bidin kardarê xwe. Di vê sparteke de, hûn derbarê vê bêtir hîn bibin. Yekem, de ka em li mînakê binêrin.



VERO SKATT
VEROHALLINTO

540A

MUUTOSVEROKORTTI 2013
ÄNDRINGSSKATTEKORT 2013

1(2)

Päiväys / Datum
06.11.2012

Verovelvollisen nimi
Den skattskyldiges namn

Henkilötunnus tai Y-tunnus
Personbeteckning eller FO-nummer

Kotikunta / Hemkommun 31.12.2012
475 MAALAHTI

Veronumero / Skattenummer

Tämä muutosverokortti korvaa 01.02.2013 voimaantulleen ja/tai aikaisemmin päivätyn verokortin
Det här ändringsskattekortet ersätter skattekortet som trädde i kraft 01.02.2013 och/eller tidigare

Ennakonpidätysprosentit voimassa 01.01.2013 - 31.12.2013
Förskottsinnehållningsprocent gäller 01.01.2013 - 31.12.2013

| | |
|---|---|
| Määräys koskee<br>Förordnandet gäller | palkkaa<br>lön |

| Perusprosentti<br>Grundprocent | Tuloraja<br>Inkomstgräns | Lisäprosentti<br>Tilläggsprocent |
|---|---|---|
| **12,5** | **9 800,00** | **26,5** |

Tulorajaan asti käytetään perusprosenttia. Ylimenevästä osasta ennakonpidätys toimitetaan lisäprosentin mukaan.
Grundprocenten används upp till inkomstgränsen. För den överskjutande delen verkställs förskottsinnehållningen enligt tilläggsprocenten.

Työnantajan merkinnät maksetuista suorituksista. Seuraavan työnantajan käytettävissä oleva tuloraja on verokorttiin merkitty tuloraja vähennettynä aikaisempien työnantajien maksamilla palkoilla.
Arbetsgivarens anteckningar om de betalda prestationerna. Inkomstgränsen som den följande arbetsgivaren kan använda är den på skattekortet antecknade inkomstgränsen minskad med lönerna som de tidigare arbetsgivarna utbetalat.

| Ajalta<br>För tiden | Työnantajan nimi<br>Arbetsgivarens namn | Bruttopalkat<br>Bruttolöner |
|---|---|---|

☐ Merkinnät ovat erillisellä liitteellä
Anteckningarna finns på en separat bilaga

Ohjeet kääntöpuolella
Anvisningar på baksidan

VEROH 0103a_T 11.2011

www.vero.fi
www.skatt.fi

Niha de ka em metna kurt bixwînin û bersîva pirsan bidin.

Îro ji min re telefonek hat ku ji min re got ku ez ji bo kar hatime bijartin. Ji min re hat gotin ku CV'ya min baş bû, hevdîtina min a kar baş derbas bû, û referansên min ez pêşniyar kirim. Ji min re hat gotin ku gava pêştir ew e ku ez ji ofîsa bacdariyê an jî ji malpera webê ya ofîsa bacê vero.fi, karteke bacê bistînim, û wê li gel hesabê xwe yê banqê ji kardarê xwe re bişînim. Ji min re hat gotin ku eger ez karta bacê dabîn nekim, ofîsa bacê dê bi şiklekî otomatîk mehaneya min 60% bibire. Min standina karta bacê ya ji malpera webê tercîh kir ji ber ku ew ê teserufa dem û mesrefa veguhastinê bike. Di malpera webê de, min hesabeke texmînî ya mehaneyê diyar kir û piştre jî karta bacê da nivîsandin; ne zehmet bû.

Ez bi mereq bûm, lewma ez li ofîsa bacê geriyam û min ji wan pirsî ka çawa rêjeya bacê dihesibînin. Wan got ku rêje hesabeke texmînî ye û bi awayekî otomatîk ji mehaneya min tê wergirtin, lê piştî dawiya salê dê ji min bê xwestin ku ez hemû pereyên xwe yên qazanckirî dîsa binêrim û ofîsa bacê agahdar bikim, û hîngê ew ê mîqdara dawî ya bacê bihesibînin. Wan got ku eger baca ku min heya hîngê dayî ji mîqdara baca ku divê ez bidim zêdetir be, ew ê şûnde bidin min, berovajî wê be dê ji min re meqbûzekê bişînin, lê ji ber ku min her meh bi jêbirîna mehane bac daye, her çiqas ferqek hebe jî ew ferq ê mezin nebe; ku bi fikra min jî ev yek tiştekî baş e. Ev yek ji ya welatê min gelek cihê xuya dike, lê kêfa min bi şêweya wê ya baş rêxistinkirî hat.

**1.** Em çima bacê didin?

**2.** Hûn Karta Bacê ji ku distînin?

**3.** Di mînaka Karta Bacê de, rêjeya baca ku bê dayîn ê li destpêkê çiqas be eger qazanc ji 9800 euroyê kêmtir be?

**4.** Di mînakê de, rêjeya baca ku dê di ser ya destpêkê de bê dayîn çiqas be eger qazanc ji 9800 euroyê zêdetir be?

**5.** Rêjeya baca jê derxistî ya destpêkê dê çiqas be eger karker nikaribe karta bacê dabîn bike?

**6.** Mîqdara dawî ya bacê çawa tê hesibandin?

!

- Bac parçeyeke girîng a sîstema sîgorteya civakî ya Fînî ye.
- Hemû niştecîyên Fînlandê bacê didin. Bac ji we re wek penaber rêya piştgiriya entegrasyonê vedikin.
- Dayîna we ya bacê rêya tevkariya we ya avaker e ji civakê re.

# Mecbûriyet û mafên we

Dema hûn dest bi karê xwe yê nû dikin, girîng e ku hûn bizanin ka mafên we çi ne û kardarên we ji we çi hêvî dikin ku hûn bikin. Serlêdana rûpela dersê bikin da ku terîfeke fireh derbarê maf û mecbûriyetên xwe bixwînin. Metna li jêr jêgirtinek e ji rûpela dersê.

---

Dema hûn dest bi karê xwe yê nû dikin, peymaneke nivîskî navbera kardar û karker tê çêkirin, ku tê de li ser peywîrên kar, şert û merc, û peredayînê tê lihevkirin. Cureyê peymanê dikare daîmî be an jî ji bo demeke kifşekirî be. Peyman divê kêmtirîn mehaneyê, saetên xebatê, pardema kardariyê, û agahiyên derbarê peywîrên kar bigire nav xwe.

Her wisa girîng e ku ew li gor pîlansaziya Fînlandê be. Bi gelemperî, mirovek her tim di wextê biryardayî de tê li ser kar. 8:00 tê wateya 8:00'ê û nabe ku 8:10 be. Dereng hatin wek tiştekî şerm tê dîtin, ji ber ku mirovên din mecbûr dimînin ku li benda yê derenghatî bimînin.

Erîşkarî, cudaxwazî an jî destdirêjiya cinsî ya di kar de li Fînlandê qedexe ne. Eger hûn bi şiklekî êrîşkariyê hîs bikin, wê tiştê ji gerînendeyê xwe re an jî ji bijîşkê tenduristiya pîşeyî re zûka bibêjin.

Divê hûn gerînendeyê xwe agahdar bikin eger hûn ji şert û mercên karê xwe ne razî bin. Eger hûn wisa hîs dikin ku guhê xwe nadin gotinên we, hûn dikarin amadebûnê ji karmendê kargehê an jî temsîldarê ewlehiya kar bixwazin di niqaşa li gel gerînende de.

Heyama civînê, piştî silavdayîneke kurt, hemû beşdar zûka derbasî mijara li pêş xwe dibin. Kardar dibe ku nepirse ka halê karker çawa ye. Ji ber vê sedemê, danûstandina Fînî ewilî dibe ku li gor nêrîna koçberan hinek bê rêz xuya bike.

---

Bersiva pirsan bidin bi rêya jêderxistina bersiva xelet. Dibe ku ji yekê zêdetir bersivên rast ên pirsekê hebe. Hemû bersivên pirsan dibe ku di metnê de peyde nebe; hin ji wan di rûpela dersê ya li ser malpera webê de tên dîtin.

| | |
|---|---|
| **1.** Karkerek piranî heftiyê çend saetan dixebite? | **a.** 40 saet: 5 rojan rojê 8 saet<br>**b.** 42 saet: 6 rojan rojê 7 saet<br>**c.** 48 saet: 6 rojan rojê 8 saet |
| **2.** Peymana kar piranî meaş kifşe dike. | **d.** Rast<br>**e.** Xelet |
| **3.** Peymaneke kar a li Fînlandê dikare ji bo | **f.** heyameke kifşekirî be<br>**g.** heyameke domdar a bê dawîbûn. |
| **4.** Eger hûn wisa hîs dikin ku bûne qurbaniyê destdirêjiya zorbetiyê, divê hûn | **h.** zûka kardarê xwe an jî bijîşk agahdar bikin.<br>**i.** bisekinin û hêvî bikin ku destdirêjî raweste. |
| **5.** Danûstandina kar a Fînî dibe ku ji gelek mirovên ji çanda cihê bê rêz xuya bike: Li kargeheke Fînî û heyama civînan, | **j.** mirov wek edetî bi awayekî rasterast derbarê kar diaxivin.<br>**k.** wek tiştekî bê rêz tê dîtin ku mirov bi awayekî rasterast derbarê kar biaxive.<br>**l.** kardar her tim teqez dikin ku derbarê rewşa karkirinê halê karkeran bipirsin. |

**Peywîra zêdeyî!**
Serlêdana youtu.be/T9J6hY0Un4U bikin an jî koda QR a li pêş bi kar bînin da ku zêdetir tiştan hîn bin derbarê jiyana kar a Fînî.

- Koçber û Fînî xwedî heman maf û mecbûriyetên kardariyê ne.
- Eger hûn derbarê tiştekî têkildarî maf û berpirsyariyên xwe xwedî zanînên teqez nebin, rêya herî baş pirskirin e.

# Çanda kar a Fînî

Terîfeke berfireh a çanda kar a Fînî dikare li malpera mof.fi/sections/employment/en bê xwendin. Di vê sparteke de hûn ê derbarê rîtuelên dînî û cihê wan di çanda kar a Fînî de bixwînin.

Rîtuelên dînî parçeyeke kêmdîtî ya kargehên Fînî ne. Ji bo Fînîyan, dîn wek tiştekî şexsî ye divê li derveyê kargehê bimîne. Eger karkerek di nav dema xebatê de bixwaze dua bike, divê ew rastî demên kifşe yên bêhnvedanê bê. Destûra sembolên dînî yên aşkera wek turban li Fînlandê heye, lê kodên cilûbergên kargehê yên têkildarî ewlehî û hîjyenê divê li ber çav bên girtin. Ew hemû tişt mijar in ku hûn dikarin li gel kardarê xwe bi şiklekî maqûl niqaş bikin.

**1.** Li gor nêrîna we divê destûra hemû sembolên dînî li kargehê hebe?

**2.** Li gor nêrîna we divê liberkirina turbanê li kargehê bê qedexekirin?


**3.** Li gor nêrîna we duakirin di dema xwarina nîvro de tê destûrdayîn?



**4.** Di hişê we de mijarek heye ku hûn dixwazin li gel kardarê xwe yê pêşerojê niqaş bikin? Bê dudilî ji mamoste û hevkarên xwe bipirsin.


!

- Li gor welatên din, çanda kar a Fînî giraniyê dide ser wekhevî û serbixwebûnê.
- Dîn mijareke şexsî ye û aîdî qada şexsî ye.
- Di pêş de li gel şêwirmendê xwe li hev bikin derbarê mijarên şexsî ku dibe bandorê li ser we bikin.

**5.** Eger hûn kardar bûna, kîjan sembolên dînî yên di lîsteya jêr de we dê destûr bida li kargeha xwe? Kîjan sembolên dînî we dê qedexe bikira û çima?







Piştî ku hûn derbarê kardariya li Fînlandê bûn xwedî gelek zanîn, niha jî dema kurtebirkirinê ye ya tiştên we heta niha dîtine. De ka em gavên li jêr bixwînin û wan li gor rêzê bi cih bikin da ku hûn wêneyê tam bibînin.

| | |
|---|---|
| | Ez karteke bacê û agahiyên xwe yên banqê didim kardar. |
| 1 | Ez pîlana xwe ya entegrasyonê didim destpêkirin, ku tê de perwerdehî û hîndariya min heye. |
| | Ez pejirandina xwe werdigirim û peymanekê îmze dikim. |
| | Ez li gel kardarê xwe eyarkirinên kar niqaş dikim, wek demên karkirinê, cilûbergê fermî, û tiştên din. |
| | Ez şiyanên xwe pêşde dibim û yên nû hîn dibim, û ez hewl didim ku li gel pisporên din têkiliya torê çêbikim. |
| | Ez Fînî hîn dibim. |
| | Ez diçim hevpeyvîna xwe ya kar. |
| | Ez li kar digerim. |
| | Ez CV’ya xwe amade dikim. |
| | Ez xwe amade dikim ji bo hevpeyvîneke kar. |
| | Ez dest bi kar dikim. |
| | Ez serlêdana kar dikim. |

Eger pirsên we yên din an jî notên we hebe, wan li jêr binivîsin û derbarê wan pirsan li mamoste an jî kesên di tora xwe têkiliyê de bipirsin.



# Bersiv

## Pîlana entegrasyonê û hîndarî ji bo koçberan

1. Bersiv li gor xwestekên we yên şexsî diguherin.
2. Bersiv li gor bersivên we yên beriyê diguherin. Li gel şiyanên ku we nivîsîne, bila di hişê we de be ku ji we re şiyanên xurt ên ziman lazim e li Fînlandê û gelek jî keda şexsî.
3. Bersiv li gor bersivên we yên beriyê diguherin.
4. Bersiv diguherin. Divê hûn yekser xwedî helwesteke hişvekirî bin dema mijar tê ser kardariyê û amade bin ku karên li derveyê qada xwe jî qebûl bikin da ku li Fînlandê tecribeya kar qazanc bikin.
5. Navê Ofîsa Kardarî û Pêşveçûna Aborî ofîsa TE ye an jî bi Fînî TE-toimisto ye.
6. Pîlana entegrasyonê perwerdehiya zimanê Fînî, şagirtî, hîndariya amadekariyê ji bo jiyana kar, û hîndariya pîşeyî digire nav xwe.
7. Dema amadekirina pîlana entegrasyonê dê derbarê paşxaneya we ya perwerdehiyê, tecribeya we ya kar, û şiyanên we yên ziman ji we bê pirsîn.

## Lêgerîna kar

1. Bersiv diguherin.
2. Bersiv diguherin.
3. Bersiv diguherin.
4. Bersiv diguherin.
5. Peyva “suomi” tê wateya Fînî, peyva “englanti” tê wateya Îngilîzî, û peyva “ruotsi” maneya Swêdî dide. Bersivên we yên din li gor dîroka we ya şexsî dê biguherin.
6. Bersiv diguherin.
7. Bersiv diguherin.
8. Bersiv diguherin.
9. Em we pîroz dikin ji ber xilaskirina kurteyê.

10. Bersiv diguherin, dîsa jî peydekirina karekê her tim pêwîstî dibîne bi zanîna mirov a bi qada xwe û bi nasîna mirovên di qada xwe de, ku jê re tora têkiliyê tê gotin.
11. Rêya zûtirîn ya peydekirina kar piranî bi alîkariya heval û mirovên hûn nas dikin çêdibe, ku dikarin an we hildin ser kar, ji we re behsa derfetên karên heyî bikin, an jî kardarên heyî pêşniyarî we bikin, li gel ên din. Avakirina toreke têkiliyê dê pêvajoya we ya kardariyê lezgîn bike.
12. Heman rêyên peydekirina kar hema di her derî de derbasdar in. Heta li Fînlandê jî, naskirina mirovan û avakirina toreke têkiliyê bi kêr tê, û dê ji bo berjewendiya we be. Xaleke din ku dibe ji ya li cihê hûn lê cuda be têkildarî pêvajoya kardariyê ye ku bi taybetî di ser înternetê re çêdibe; dê pêwîst bike ku hûn şiyanên xwe yên kompîtirê bi kar bînin û yên nû hîn bibin ku hûn hêj nizanin.

13. Eger hûn rêyeke dîtir dizanin, divê hûn wê biceribînin. Peydekirina kar ji bo herkesî bi heman awayî çênabe û zanînên we yên şexsî biqîmet in. Ji bo gelekan tercîha herî baş destpêkirina karê xwe bi xwe ye. Derbarê vê ji ofîsa kardariyê ya lokal bipirsin û ew ê ji we re bêtir agahiyan dabîn bikin.
14. Li gor nivîskar Lou Adler ku nivîsek bi Îngilîzî li Sibata 2016'an weşandiye li navnîşana, linkedin.com/pulse/new-survey-reveals-85-all-jobs-filled-via-networking-lou-adler, 85% ê karan bi rêya tora têkiliyê tên bidestxistin. Her çiqas rêje li Fînlandê biguhere jî, dîsa jî bilind e, û tora têkiliyê gelek girîng e.
15. Her ku li dora 85% ê karan bi rêya tora têkiliyê tên bidestxistin, ev yek divê bibe îspata girîngiya nasîna pisporên din û avakirina têkiliyan li gel mirovên din.
16. Avakirina tora we ya têkiliyê bi gelek rêyan dikare çêbe. Beşdarbûna nav çalakî û rêxistinên ku xwedî heman xwestekan in ne bi tenê derfetê dide we ku hûn mirovên xwedî heman xwestekan nas bikin û her wisa şiyanên we yên zimanê Fînî jî pêşde dibe. Dildariya nav bûyerên ku bala we dikişînin rêyeke baş e ku hûn nîşan bidin ku hûn dikarin tevkariyê bikin û mirovên nû nas bikin. Her wisa hin bûyer hene ku yekser ji bo koçberan in, wek kafeyên ziman, ku tê de mirovên ku dixwazin zimanê we hîn bin û zimanê xwe jî hîn bikin tên li ba hev. Her wisa sendîka hene, bi Fînî ammattiliitot, ku dikarin bi pirsên taybet ji we re bibin alîkar têkildarî pêkanîna we ya karê xwe li Fînlandê. Bi gelemperî, bila di hişê we de be ku avakirina tora têkiliyê ta bi mirovên ku wek we heman zimanî diaxivin an jî xwedî heman paşxaneyê ne dirêj dibe, lê Fînî û koçberên din jî digire nav xwe.

## Bacdayîn

1. Bac tevkariya her yek takeksî ya bi civakê ye. Bêyî bacdayînan, nexweşxane, rê, qereqolên polîsan, dibistan, û piraniya xizmetên gel dê bi rê ve neçin.
2. Malpera webê ya ofîsa bacê, vero.fi, an jî ofîsa bacê.
3. 12.5%
4. 26.5%
5. 60%
6. Piştî dawiya salê, hemû qazancên salane tên hesibandin, û ofîsa bacê mîqdara dawî ya bacê û mîqdara heya niha hatiye dayîn dide ber hev. Eger ferqek hebe, ofîsa bacê şûnde dayînê dike an jî şexs heqê kêm dide ofîsa bacê.

## Mecbûriyet û mafên we

Bersiv li tabloya jêr dikarin bên dîtin.

| 1 | 2 | 3 | 4 | 5 |
|---|---|---|---|---|
| a | d | f \| g | h | j |

## Çanda kar a Fînî

1. Dîn mijareke şexsî ye. Kargeh ciheke hevpar e. Sembolên dînî tên destûrdayîn bi şertê ku qaydeyên kargehê binpê nekin. Dibe ku destûra hin sembolên dînî li kargehê tunebe.
2. Liberkirina turbanê li kargehê piranî tê destûrdayîn, dîsa jî divê hûn derbarê wê li gek kardarê xwe biaxivin.
3. Destûra duakirinê bi tenê di navberan de tê dayîn. Ji ber tercîha xwe ya çûna duakirinê hûn nikarin cihê xwe yê kar bi tena serê xwe bihêlin.
4. Bersiv diguherin.
5. Bersiv li gor xwestekên we diguherin. Bila di bîra we de be ku sembolên wek, xaç, turban, pêçe, kîrpan, tizbî, gerdeniya omkar, menora, peykera bûda, kîppa, û bazina ku stêrka Bahaî li ser, hemû jî xwedî nirxên şexsî ne ji bo bawermendên wan, û dibe ku li kargehê neyên pejirandin. Hûn çi kardar bin an jî karker, hûn dikarin niqaşa wan mijaran bikin.

| | |
|---|---|
| 10 | Ez karteke bacê û agahiyên xwe yên banqê didim kardar. |
| 1 | Ez pîlana xwe ya entegrasyonê didim destpêkirin, ku tê de perwerdehî û hîndariya min heye. |
| 9 | Ez pejirandina xwe werdigirim û peymanekê îmze dikim. |
| 11 | Ez li gel kardarê xwe eyarkirinên kar niqaş dikim, wek demên karkirinê, cilûbergê fermî, û tiştên din. |
| 3 | Ez şiyanên xwe pêşde dibim û yên nû hîn dibim, û ez hewl didim ku li gel pisporên din têkiliya torê çêbikim. |
| 2 | Ez Fînî hîn dibim. |
| 8 | Ez diçim hevpeyvîna xwe ya kar. |
| 5 | Ez li kar digerim. |
| 4 | Ez CV'ya xwe amade dikim. |
| 7 | Ez xwe amade dikim ji bo hevpeyvîneke kar. |
| 12 | Ez dest bi kar dikim. |
| 6 | Ez serlêdana kar dikim. |

# Halxweşî

**Tendurîstî û xizmetên halxweşiya civakî**



Ev modul tijî agahî ne derbarê xwe gihandina xizmeta tenduristiyê li Fînlandê, cihveqetandina ji bo randevûyekê li navenda we ya tenduristiyê, li nexweşxaneyê wergirtina tedawiyê, û mijarên derbarê halxweşiya civakî.

**Di vê modulê de, hûn ê derbarê wan hîn bibin:**

- Xizmetên tendurustiyê
- Navenda tendurustiyê
- Xizmetên tendurustiyê yên acîl
- Klînîka dayîkbûnê
- Tedawiya diranan
- Dermanxane
- Ewlehiya civakî û Saziya sîgorteya civakî
- Alîkariya entegrasyonê

**Derbarê vê modulê li navnîşana jêr bixwînin mof.fi/sections/welfare/en an jî koda QR a li jêr bidin diyarkirin**

**Vê modulê online di vê navnîşanê de peyde bikin mof.fi/exercises/welfare/en an jî koda QR a li jêr bidin diyarkirin**

# Tenduristî

Metna li jêr ji rûpela dersê hatiye wergirtin. Hûn dikarin rûpela dersê ziyaret bikin û derbarê sernavê zêdetir bixwînin ji lînka destpêka vê modulê. De ka em metnê bi hev re bixwînin.

---

Ji penaberên kotayê re wek welatiyên Fînlandê heman xizmetên tenduristiyê tên pêşkêşkirin. Muayeneya tenduristiyê ji bo hemû penaberên kotayê û malbatên wan tê organîzekirin dema ew digihîjin şaredariya xwe ya nû. Girîng e ku hûn reçeteyên xwe û belgeyên xwe yên tibî bi xwe re bînin. Li Fînlandê, hemû pisporên tenduristiyê bi veşartîhiştina pîşeyî girêdayî qanûnê ne.

Hemû şaredariyên Fînî ji bo rûniştvanên xwe xizmetên tenduristiyê dabîn dikin, û piranî xwedî navendên xwe yên xizmetê ne. Wek niştecîyekî şaredariyê li Fînlandê hûn xwedî maf in ku xizmetên tenduristiyê yên şaredariyê bi kar bînin. Eger hûn nexweş bin, li gel bijîşk an jî hemşîreyê xwe randevûyekê bistînin bi rêya serlêdanê an jî bi lêgerîna telefonê ya navendê.

Navendên tenduristiyê danê êvarê û dawiya heftiyê girtî ne. Di wan heyaman de, nexweşiyên nişkî li navendên xizmeta tenduristiyê yên acîl tên dermankirin. Ew piranî li nexweşxaneyên herêmî ne. Di rewşên ku xetereya-jiyanê de, hûn dikarin telefonê ji jimareya 112 re vekin.

Şaredarî ji niştecîyên xwe re agahî û xizmetên derbarê hemlebûnê pêşkêş dikin. Dayîk tên teşwîqkirin da ku biçin muayeneya tibî ya destpêkê li navenda xizmeta tenduristiyê beriya dawîbûna meha çaran a hemlebûnê. Tenduristî û mezinbûna dayîkê û bebikê li klînîka dayîkbûnê tê muayenekirin. Bav jî tên teşwîqkirin da ku bên hevdîtinan û beşdarî hîndariya pêşzayînê ya li klînîka dayîkbûnê û ya zarokanînê bibin. Bebik piranî li nexweşxaneya herî nêzik ya şaredariya we tên dinê.

Wek niştecîyekê şaredariyê mafê we heye ku hûn tedawiya diranan a giştî bi kar bînin.

Li Fînlandê, bijîşk dermanan dinivîse ji bo nexweşiyan. Hûnê reçeteya bijîşk wergirin ku hûn wê bibin dermanxaneyê da ku dermanên xwe bikirin. Eger nexweşiyên we yên dem-dirêj hebin, reçeteyên xwe yên berê bi xwe re bibin hevdîtina bijîşk li Fînlandê.

---

1. De ka em fêmkirina we ya metnê binêrin. Mînakên rewşan ên li jêr bixwînin û venêrin ka di her rewşê de çi bikin. Bizanin ku bersivek dikare ji bo gelek îhtimalan derbasdar be.

| | |
|---|---|
| **a** | Pêwîstiya bi cerahiyê |
| **b** | Êşa mîde |
| **c** | Êşa diranan gelek giran e û dermanê janbir bi kêr nayê |
| **d** | Serêş |
| **e** | Êş dewam dike û janbir bi kêr nayê |
| **f** | Qrîza dil |
| **g** | Qeza |
| **h** | Bêhişketin an jî dîtina yekî bêhişketî |
| **i** | Hemlebûn |
| **j** | Reçeteya bijîşkekî wergirin |
| **k** | Meqbûzê wergirin ku tê de para we ya heqdayînê hebe ji bo dermankirinê |

| | |
|---|---|
| 112'ê bigerin | **s** |
| Dermanê serêşê ji dermanxaneyê bêyî reçete bikirin | **t** |
| Li navenda tenduristiyê bigerin | **u** |
| Randevûyeke li ba bijîşkê diran cihveqetînin | **v** |
| Bi karta banqê heqê wê bidin | **w** |
| Li gel klînîka dayîkbûnê randevûyekê cihveqetînin | **x** |
| Ji dermanxaneyê bi reçeteyê derman bistînin | **y** |
| Li nexweşxaneyeke pisporiyê randevûyekê cihveqetînin | **z** |

2. Dema hûn li navenda tenduristiyê bin, divê hûn hin gavan li gor rêza wan biavêjin; bi vî awayî hûn dikarin piştrast bin ku şixul bi awayekî hêsan ji bo we û xebatkarên navenda tenduristiyê dimeşin. Ew gav dikare li jêr bên dîtin, de ka em wan bixin rêza rast.

| | |
|---|---|
| Biçin navenda tenduristiyê | **Gav** 2 |
| Dema jimare li ser ekranê be an jî dema ew hat bangkirin, biçin maseyê û karta xwe ya nasnameyê an jî karta Kela nîşan bidin | **Gav** ____ |
| Heya ku jimareya li ser bilêtê li ser ekranê xuya be an jî jimare hat bangkirin li bendê bimînin | **Gav** ____ |
| Karta nasnameyê an jî karta Kela bi xwe re bibin | **Gav** ____ |
| Bilêtekê bistînin ku jimare li ser hebe | **Gav** ____ |
| Rênîşanên hemşîreyê bişopînin | **Gav** ____ |

!

- Eger derbarê tenduristiya we fikarên we hebin, pisporekî tenduristiyê ziyaret bikin an jî lê bigerin û jê bipirsin.
- Dema hûn biçin navenda tenduristiyê, her tim karta xwe ya Kela bi xwe re bibin.

**3.** Di koman de an jî li gel mamoste derbarê pûanên li ser nîşeyên zeliqandinê de niqaşê bikin. Fikrên sereke yên her mijarê kurtebir bikin.

Berpirsyariya dêûbavan a derheqê tenduristî û halxweşiya zarokên xwe

Miqatebûna bi helxweşiya xwe

Mêrên ku beşdarî xizmetên tenduristiyê yên têkildarî hemlebûnê dibin

Serlêdana navendeke tenduristiyê

Xizmetên tenduristiyê li şaredariyan

**Peywîra zêdeyî!**
De ka em vîdeoyekê temaşe bikin derbarê kirinên li navenda tenduristiyê. Vîdeo dikare li rûpela dersê mof.fi/sections/welfare/en an jî bi diyarkirina koda QR bê dîtin.

- Herkes ji bo tenduristî û halxweşiya xwe berpirsiyar e. Miqatebûna bi tenduristî û halxweşiya zarokên we berpirsyariyeke dêûbavtiyê ye.
- Pisporên tenduristiyê girêdayî veşartîhiştinê ne; derbarê tenduristiya xwe durist bin.

# Ewlehiya civakî

De ka em metna derbarê ewlehiya civakî bixwînin û bersîva pirsan bidin.

Wek niştecîyekî şaredariyê hûn xwedî mafê ewlehiya civakî ne li Fînlandê. Ev xizmetên cuda yên civakî û sûdeweriyên civakî yên di rewşên cihê yên jiyanê de digire nav xwe. Saziya Sigorteya Civakî ya Fînlandê, Kela, ji bo hemû niştecîyên şaredariyan xizmetê dabîn dike têkildarî mijarên sîgorteya civakî.

Koçber xwedî maf e ku serlêdanê ji bo endamtiya sîstema ewlehiya civakî ya Fînî bike. Serlêdan divê li ofîsa lokal a Kela bê tijîkirin. Piştî pejirandina endamtiyê koçber ê karteke şexsî ya ewlehiya civakî bistîne ku derfetê dide wî an wê ku serlêdana berjewendiyên civakî bike û wan bi dest bixe. Di nav berjewendiyan de wek mînak berjewendiyên malbatî, bêkarî, nivîşkanî û berjewendiyên meaşê teqawîdbûnê hene. Ji bo berjewendiyên Kela mirov bi awayekî şexsî serlêdanê dike û ew her tim ji hesabê banqê yê serlêdar re tê şandin.

Agahdariyên derbarê berjewendiyên civakî li ofîsa we ya lokal ya Kela'yê û li ofîsa şaredariyê ya halxweşiya civakî, û her wisa li ser malpera înternetê ya Kela'yê peyde dibin. Gelek şaredarî bûyerên agahdarkirinê rêxistin dikin derbarê xizmetên şaredariyê û berjewendiyên civakî ji bo koçberên nû. Ji bo bidestxistina agahiyên girîng, girîng e koçber beşdarî wan bûyeran bin. Rêxistinên ku li gel koçberan dixebitin, û koçberên ku demeke dirêj e li Fînlandê dijîn, dikarin alîkariya koçberên nû bikin di kêşeyên derbarê jiyana rojane û xizmetên civakî de.

**1.** Navê du cureyên berjewendiyan bidin ku daxilî nav sîstema ewlehiya civakî ne.

**2.** Eger hûn bêyî kar bin, berjewendiyên bêkariyê ji hesabê we yê banqê re tê şandin an jî didin hevjînê we?

**3.** Karta Kela ji we re dikare çi bike?

**4.** Divê hûn çi bikin ji bo ku karteke Kela bistînin?

**5.** Navnîşana webê ya Kela www.kela.fi, ew çavkaniya tekane ye ji bo wergirtina agahiyan?

**6.** Berjewendiyên ewlehiya civakî ji bo piştgirîkirina kesên di nav rewşên xirab de heye. Hûn dikarin navê çend rewşên wiha bidin? Li gor fikra we kengê hewcehê dê bi berjewendiyên civakî nemîne?

!

- Berjewendiyên civakî di rewşên giran ên jiyanê de standarteke nizm a jiyankirinê misoger dike, û di têkbirina wan rewşên giran de alîkariya mirov dike. Berjewendiyên civakî di hemû demên jiyanê de nabe ku bên bikaranîn.
- Eger pirsên we derbarê ewlehiya civakî hebin, serlêdana kela.fi an jî ya ofîsa lokal ya Kela bikin.

# Berjewendiyên ewlehiya civakî

Koçber berjewendiyên ewlehiya civakî bi heman krîterên Fînîyan bi dest dixin.

Kesekî lêgerê kar ê bêyî kar divê bi awayekî çalak li kar bigere û beşdarî çalakiyan bibe ku di pîlana entegrasyonê ya koçber de hatine biryardayîn li gel Ofîsa Kardariyê. Di wê rewşê de, koçber berjewendiya bêkariyê werdigire.

Kesekî ku nikare bixebite ji ber nexweşiya xwe ya kronîk, birîndarî, hemlebûn, an jî sedemeke din, serlêdanê dike ji bo berjewendiyên têkildarî rewşa wî/wê. Koçberek ku kêmtirîn 65 salî ye û herî kêm sê sal e li Fînlandê dijî dikare meaşê temenê-kalbûnê bistîne.

Fînland her wisa piştgiriya dahatiyê dide da ku mirov jiyaneke rehet bijîn bêyî ku rewşa wan a jiyanê li ber çav bigire. Piştgiriya dahatê berjewendiya dawî ye. Ev tê vê wateyê ku bi şertê ku şexsek nikaribe dahat an jî berjewendiyeke din bi dest bixe tê dayîn, an jî dahatên din nikaribe têra mesrefên pêwîst bike. Mîqdara piştgiriya dahatê dikeve eger şexs dest bi standina mehaneyê bike an jî berjewendiyên din ji hêla Kela bigihîjê.

**1.** Ji koçberek bêyî kar çi tê hêvîkirin ku li Fînlandê bike?

________________________________________

________________________________________

**2.** Beşa yekê ya hevokê bi beşa duyem a eleqedar re têkildar bikin.

| | | | |
|---|---|---|---|
| **a** | Koçberek bêyî kar divê | serlêdanê dike ji bo berjewendiyên têkildarî rewşa wî/wê | **w** |
| **b** | Piştgiriya kar ew e | eger şexs dest bi standina mehaneyê bike | **x** |
| **c** | Kesekî ku nikare bixebite | bi awayekî çalak li kar bigere | **y** |
| **d** | Piştgiriya kar dikeve | berjewendiya dawî ye | **z** |

**3.** Piştî ku niha hûn derbarê halxweşiya li Fînlandê dizanin, de ka em modulê xilas bikin bi nêrîna li kartên li jêr û rola her yek kartê hîn bibin. Bi malbata xwe an jî hevalên xwe niqaş bikin.

a



b



c




d



!

- Berjewendiya herî girîng a koçberekî ya li heyama salên ewilî ya li Fînlandê alîkariya entegrasyonê ye.

# Bersiv

## Tenduristî

**1.** Bersiv li tabloya jêr dikarin bên dîtin.

| a | b | c | d | e | f | g | h | i | j | k |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| z | t | v | t | u | s | s | s | x | y | w |

**2.** Bersiv li tabloya jêr dikarin bên dîtin.

| | |
|---|---|
| Biçin navenda tenduristiyê | Gav 2 |
| Dema jimare li ser ekranê be an jî dema ew hat bangkirin, biçin maseyê û karta xwe ya nasnameyê an jî karta Kela nîşan bidin | Gav 5 |
| Heya ku jimareya li ser bilêtê li ser ekranê xuya be an jî jimare hat bangkirin li bendê bimînin | Gav 4 |
| Karta nasnameyê an jî karta Kela bi xwe re bibin | Gav 1 |
| Bilêtekê bistînin ku jimare li ser hebe | Gav 3 |
| Rênîşanên hemşîreyê bişopînin | Gav 6 |

**3.** Bersiv dibe biguherin û dikare xalên li pêş bigirin nav xwe.

- **Berpirsyariya dêûbavan a derheqê tenduristî û halxweşiya zarokên xwe:**
  Bi giştî dêûbav ji bo tenduristî û halxweşiya timî ya zarokên xwe berpirsyar in. Di nav vê de têrkirin, tenduristiya fîzîkî û derûnî û her wisa misogerkirina wergirtina zarokan a xizmeta tendurisitya ya di dema rast de jî hene.
- **Miqatebûna bi helxweşiya xwe:**
  Bi giştî, herkes ji bo miqatebûna halxweşiya xwe û lêgerîna alîkariyê ya dema pêwîst berpirsyar e. Têkiliyên civakî û jiyaneke çalak a civakî tê teşwîqkirin, ji ber ku ew ne bi tenê entegrasyonê hêsan dike li her wisa ji bo halxweşiyê jî baş e. Halxweşî dibe ku bê wateya tenduristiya fîzîkî û derûnî, ku dikare bi xwarina tam, çalakiyên fîzîkî, û bi rêyên din ên wek hevdîtina hevalan û pêkanîna hobîyan dikare bê baştirkirin ku ew jî we bextewar dike. Tiştên ku hîseke baş bi we re çêdikin peyde bikin.
- **Mêrên ku beşdarî xizmetên tenduristiyê yên têkildarî hemlebûnê dibin:**
  Bi gelemperî li Fînlandê mêr bi awayekî zêde beşdarî karên malê dibin û bi awayekî çalak zarokan xudan dikin. Ev beşdarbûna bi kontrolên tenduristiyê yên beriya zarokanînê û dema zarokanînê digire nav xwe. Girîng e ku hûn xwe bielimînin ji bo wekheviya navbera mêr û jinan, vekirî bin ji bo pêkanînên nû.
- **Serlêdana navendeke tenduristiyê:**
  Dema hûn nexweş bin, randevûyekê cihveqetînin an jî serlêdana navenda tenduristiyê bikin an jî lê bigerin. Dema hûn serlêdana navendeke tenduristiyê dikin, bila di bîra we de be ku hûn karta nasnameyê an jî karta Kela bi xwe re bibin. Her wisa tê pêşniyarkirin ku hûn hemû belgeyên tenduristiyê yên şexsî bi xwe re bibin, eger bi we re hebin. Telîmatên ku li navenda tenduristiyê tê dayîn bişopînin. Eger hûn tiştekî fêm nekin, dubare bipirsin ji xebatkarê tenduristiyê. Eger ji we re derman hatibe nivîsandin, serlêdana dermanfiroş bikin.
- **Xizmetên tenduristiyê li şaredariyan:**
  Wek niştecîyekî şaredariyê li Fînlandê, hûn xwedî maf in ku xizmetên tenduristiyê yên şaredariyê bi kar bînin. Navendên tenduristiyê danê êvarê û dawiya heftiyê girtî ne. Di wan heyaman de lazim e hûn serlêdana navendên xizmeta tenduristiyê yên acîl bikin. Xwe bi xizmetên lokal bielimînin, saetên wan ê karkirinê bizanin û bizanin ka li derveyî wan saetan û di rewşên acîl de bi ku re têkilî çêbikin.

## Ewlehiya civakî

1. Di nav berjewendiyan de wek mînak berjewendiyên malbatî, bêkarî, nivîşkanî û berjewendiyên meaşê teqawîdbûnê hene.
2. Berjewendî her tim ji hesabê banqê yê serlêdar re tê şandin.
3. Karta Kela rê dide ku hûn bikarin serlêdana berjewendiyên civakî bikin û wan bistînin.
4. Ji bo standina karteke Kela, divê hûn bibin endamê sîstema ewlehiya civakî ya Fînî.
5. Agahî dikare ji ofîsa Kela bê bidestxistin, dîsa jî malpera webê ya Kela ji bo peydekirina agahiyên ku hûn lê digerin rêya herî zû û guncav e.
6. Di nav mînakan de bêkarî, nexweşiya nişkî û perwerdehî hene. Serlêdana berjewendiyên civakî her tim bi awayekî şexsî tê kirin. Berjewendiyên civakî nabe ku timamî jiyana we bên bikaranîn, ji ber ku ew armanc dikin ku alîkariya we bikin da ku hûn zehmetiyên rewşan têk bibin. Dema kesek dest bi kar dike, xwendinê xilas dike an jî çi astengiya wan namîne da ku vegere sar kar, wek nexweşî, êdî pêwîstî bi berjewendiyên civakî namîne. Derbarê rewşa xwe li gel şêwirmendê xizmeta civakî ya lokal an jî xebatkarê Kela niqaş bikin.

## Berjewendiyên ewlehiya civakî

1. Kesekî lêgerê kar ê bêyî kar divê bi awayekî çalak li kar bigere û beşdarî çalakiyan bibe ku di pîlana entegrasyonê ya koçber de hatine biryardayîn li gel Ofîsa Kardariyê.

2. Bersiv li tabloya jêr dikarin bên dîtin.

| a | b | c | d |
|---|---|---|---|
| y | z | w | x |

3. Kart “a” karta Kela ye; wê bi xwe re bibin dema hûn diçin navenda tenduristiyê. Kart “b” karta tenduristiyê ya Ewropî ye; wê bi xwe re bibin dema hûn li Ewropayê ne an jî diçin derveyê Fînlandê. Kart “c” karta nasnameyê ye; wê bi xwe re bibin çi dema hûn pêwîstî bi îspatkirina nasnameya xwe bibînin. Kart “d” destûra niştecîbûnê ye; wê bi xwe re bibin dema hûn diçin derveyê Fînlandê. Bizanin ku destûra we ya niştecîbûnê belgeyeke derbasdar a nasnameyê nîne, ji ber vê çendê ji we re karta nasnameyê lazim dike dema pêwîst bike hûn nasnameya xwe îspat bikin.

# Ziman

**Destpêkirina bi Fînî**

Ez mirovan çawa slav dikim bi Fînî? Ez heta dehê çawa bijimêrim? Di vê beşe de, hûn ê derbarê wan û zêdetir hîn bibin.

**Di vê modulê de, hûn ê derbarê wan hîn bibin:**


- Elfabe
- Slavdayîn
- Roj
- Jimare
- Xwarin
- Reng
- Cilûberg
- Beşên gewdeyê
- Endamên malbatê

**Derbarê vê modulê li navnîşana jêr bixwînin**
**mof.fi/sections/language/en**
**an jî koda QR a li jêr bidin diyarkirin**

**Vê modulê online di vê navnîşanê de peyde bikin**
**mof.fi/exercises/language/en**
**an jî koda QR a li jêr bidin diyarkirin**

# Spartek

**1.** Herfan bixin rêza rast.




| | | | | |
|---|---|---|---|---|
| A | B | C | ___ | ___ |
| ___ | ___ | ___ | ___ | ___ |
| ___ | ___ | ___ | ___ | ___ |
| ___ | ___ | ___ | ___ | ___ |
| ___ | ___ | ___ | ___ | ___ |
| ___ | ___ | Ä | Ö | |

**2.** Nîşan bikin ka kîjan dirêjtir e.

| | | |
|---|---|---|
| PALO | < | PALLO |
| RAAHAAN | > | RAHAN |
| TULI | | TULLI |
| TULI | | TUULI |
| VÄÄRIN | | VÄRI |
| VÄÄRIIN | | VÄÄRIN |
| LAATIKON | | LAATIKKOON |
| PÄÄTY | | PÄÄTYY |
| PÄÄTYY | | PÄÄTTYY |
| TULEE | | TUULEE |
| TULLEE | | TULEE |
| ETU | | EETU |

**3.** Peyvan bixin nav koma rast.

pouta | pöytä | syöjä | suoja | suoda | syödä | kylmä | kulma

| **ä, ö, y + e, i** | **a, o, u + e, i** |
|---|---|
| käyrä | kaura |
| hylly | hullu |
| | |
| | |
| | |
| | |

**4.** Hûn ji kîjan miletî ne?

| | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|
|  | suomi | + | lainen | = | suomalainen |
|  | ranska | + | lainen | = | ranskalainen |
|  | tunisia | + | lainen | = | tunisialainen |
| | ___________________ | + | lainen | = | ___________________ |

**5.** Hûn bi kîjan zimanî diaxivin?

| | |
|---|---|
| Puhun | suomea |
| Puhun | ranskaa |
| Puhun | tamazightia |
| Puhun | ___________________________________________ |

**6.** Slavdayînên rast têkildar bikin.

| | |
|---|---|
| Moi! | Hei! |
| Hei! | Ole hyvä! |
| Kiitos! | Moi! |
| Anteeksi! | Samoin! |
| Hei hei! | Minä olen Sam.<br>Hauska tavata Linda! |
| Mitä kuuluu? | Kiitos hyvää! |
| Minä olen Linda.<br>Kuka sinä olet? | Ei se mitään. |
| Hauska tavata! | Hei hei! |
| Tervetuloa! | Kiitos! |

**7.** Peyvê binivîsin nav cihê rast.

lauantai keskiviikko tiistai viikko perjantai sunnuntai torstai

| ______ | maanantai | ______ | ______ | ______ | ______ | ______ | ______ |
|---|---|---|---|---|---|---|---|
| **44** | | 1 | 2 | 3 | 4 | **5** | **6** |
| **45** | 7 | 8 | 9 | 10 | 11 | **12** | **13** |
| **46** | 14 | 15 | 16 | 17 | 18 | **19** | **20** |
| **47** | 21 | 22 | 23 | 24 | 25 | **26** | **27** |
| **48** | 28 | 29 | 30 | 31 | | | |


eilen huomenna yö päivä ilta hyvää iltaa hyvää päivää hyvää yötä

| ______ | tänään | ______ |
|---|---|---|
| 23 | 24 | 25 |

| | | |
|---|---|---|
| 8.00 | aamu | Hyvää huomenta! |
| 13.00 | ______ | ______ |
| 18.00 | ______ | ______ |
| 22.00 | ______ | ______ |

**8.** Ji jimareyan bigerin.

| | | | | |
|---|---|---|---|---|
| yhdeksän | kymmenen | kahdeksan | kaksi | seitsemän |
| viisi | yksi | neljä | kolme | kuusi |












| | | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| V | I | I | S | I | L | H | K | N | E |
| F | O | S | E | K | Ä | K | Y | A | Z |
| Y | E | K | I | G | U | O | M | S | A |
| H | S | A | T | U | Q | L | M | K | A |
| D | Y | K | S | I | A | M | E | E | M |
| E | R | I | E | I | L | E | N | D | U |
| K | J | V | M | O | I | N | E | H | E |
| S | Ö | L | Ä | J | L | E | N | A | U |
| Ä | N | E | N | Ä | K | E | W | K | R |
| N | A | J | E | L | I | N | A | Å | O |




| | |
|---|---|
| 1 | yksi |
| 2 | kaksi |
| 3 | |
| 4 | |
| 5 | |
| 6 | |
| 7 | |
| 8 | |
| 9 | |
| 10 | |






| | | | | |
|---|---|---|---|---|
| 11 | 12 | 13 | 14 | 15 |
| yksitoista | kaksitoista | kolmetoista | neljätoista | viisitoista |
| 16 | 17 | 18 | 19 | 20 |
| kuusitoista | seitsemäntoista | kahdeksantoista | yhdeksäntoista | kaksikymmentä |
| 30 | 40 | 41 | 100 | 130 |
| kolmekymmentä | neljäkymmentä | neljäkymmentäyksi | sata | satakolmekymmentä |

**9.** Her peyvê bi wêneya wekhev re têkildar bikin.

| | | | |
|---|---|---|---|
| sokeri |  | kahvi |  |
| omena |  | banaani |  |
| leipä |  | suola |  |
| vesi |  | sieni |  |
| mehu |  | sika |  |
| muna |  | kala |  |
| tomaatti |  | lammas |  |
| maissi |  | nauta |  |
| kurkku |  | mansikka |  |
| kana |  | öljy |  |

| | | | |
|---|---|---|---|
| jäätelö |  | tee |  |
| maito |  | riisi |  |
| viinirypäle |  | pippuri |  |
| ketsuppi |  | pasta |  |
| limu |  | voi |  |
| juusto |  | sipuli |  |
| appelsiini |  | porkkana |  |










**10.** Bihayê wê çiqas e?

| | | |
|---|---|---|
|  | 3 | ____________ maksaa ________ euroa. |
|  | 2 | ____________ maksaa ________ euroa. |
|  | ? | ____________ maksaa ________ euroa. |
| ? | ? | ____________ maksaa ________ euroa. |

**11.** Çi reng?


| | | |
|---|---|---|
| | | |
| Punainen | Vihreä | Sininen |
| Red | | |
| | | |
| | | |
| Keltainen | Valkoinen | Musta |
| | | |
| | | |
| | | |
| Oranssi | Violetti | Harmaa |
| | | |
| | | |
| | | |
| Vaaleanpunainen | Ruskea | Monivärinen |
| | | |
| | | |

**12.** Peyvê binivîsin nav cihê rast.


| | | | | |
|---|---|---|---|---|
|  |  |  |  |  |
| hattu | | | | |
|  |  |  |  |  |
| | | | | |
|  |  |  |  |  |
| | | | | |
|  |  |  |  |  |
| | | | | |

| | | | | |
|---|---|---|---|---|
| laukku | huivi | mekko | housut | sateenvarjo |
| silmälasit | saappaat | aluspaita | hame | henkari |
| takki | sukka | käsineet | alushousut | kaulaliina |
| hattu | paita | kravatti | pipo | kengät |

**13.** Peyvan bi endamên gewdeyê yên rast têkildar bikin.



**14.** Hûn kî ne?


Isoisoäiti
Isoisoisä
Isoisoäiti
Isoisoisä
Isoäiti
Isoisä
Isoäiti
Isoisä
Täti
Eno
Äiti
Isä
Täti
Setä
Serkku
Serkku
Puoliso
**Minä**
Veli
Sisko
Serkku
Serkku
Veljentytär
Veljenpoika
Sisarentytär
Sisarenpoika

# Bersiv

**1.**

| | | | | |
|---|---|---|---|---|
| A | B | C | D | E |
| F | G | H | I | J |
| K | L | M | N | O |
| P | Q | R | S | T |
| U | V | W | X | Y |
| Z | Å | Ä | Ö | |

**2.**

| | | |
|---|---|---|
| PALO | < | PALLO |
| RAAHAAN | > | RAHAN |
| TULI | < | TULLI |
| TULI | < | TUULI |
| VÄÄRIN | > | VÄRI |
| VÄÄRIIN | > | VÄÄRIN |
| LAATIKON | < | LAATIKKOON |
| PÄÄTY | < | PÄÄTYY |
| PÄÄTYY | < | PÄÄTTYY |
| TULEE | < | TUULEE |
| TULLEE | > | TULEE |
| ETU | < | EETU |

**3.**

| **ä, ö, y + e, i** | **a, o, u + e, i** |
|---|---|
| käyrä | kaura |
| hylly | hullu |
| pöytä | pouta |
| syöjä | suoja |
| syödä | suoda |
| kylmä | kulma |

**6.**

| | |
|---|---|
| Moi! | Hei! |
| Hei! | Ole hyvä! |
| Kiitos! | Moi! |
| Anteeksi! | Samoin! |
| Hei hei! | Minä olen Sam. Hauska tavata Linda! |
| Mitä kuuluu? | Kiitos hyvää! |
| Minä olen Linda. Kuka sinä olet? | Ei se mitään. |
| Hauska tavata! | Hei hei! |
| Tervetuloa! | Kiitos! |

**7.**

| viikko | maanantai | tiistai | keskiviikko | torstai | perjantai | lauantai | sunnuntai |
|---|---|---|---|---|---|---|---|
| **44** | | 1 | 2 | 3 | 4 | **5** | **6** |
| **45** | 7 | 8 | 9 | 10 | 11 | **12** | **13** |
| **46** | 14 | 15 | 16 | 17 | 18 | **19** | **20** |
| **47** | 21 | 22 | 23 | 24 | 25 | **26** | **27** |
| **48** | 28 | 29 | 30 | 31 | | | |

| eilen | tänään | huomenna |
|---|---|---|
| 23 | 24 | 25 |

| | | |
|---|---|---|
| 8.00 | aamu | Hyvää huomenta! |
| 13.00 | iltapäivä | Hyvää iltapäivää |
| 18.00 | ilta | Hyvää iltaa! |
| 22.00 | yö | Hyvää yötä! |


**8.**

| | | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| V | I | I | S | I | L | H | K | N | E |
| F | O | S | E | K | Ä | K | Y | A | Z |
| Y | E | K | I | G | U | O | M | S | A |
| H | S | A | T | U | Q | L | M | K | A |
| D | Y | K | S | I | A | M | E | E | M |
| E | R | I | E | I | L | E | N | D | U |
| K | J | V | M | O | I | N | E | H | E |
| S | Ö | L | Ä | J | L | E | N | A | U |
| Ä | N | E | N | Ä | K | E | W | K | R |
| N | A | J | E | L | I | N | A | Å | O |


| | |
|---|---|
| 1 | yksi |
| 2 | kaksi |
| 3 | kolme |
| 4 | neljä |
| 5 | viisi |
| 6 | kuusi |
| 7 | seitsemän |
| 8 | kahdeksan |
| 9 | yhdeksän |
| 10 | kymmenen |


**9.**


sokeri
omena
leipä
vesi
mehu
muna
tomaatti
maissi
kurkku
kana





kahvi
banaani
suola
sieni
sika
kala
lammas
nauta
mansikka
öljy













**10.**

| | | |
|---|---|---|
|  | 3 | Mehu maksaa kolme euroa. |
|  | 2 | Banaani maksaa kaksi euroa. |
|  | ? | Porkkana maksaa ________ euroa. |
| ? | ? | ________________________ maksaa ________ euroa. |


**11.**

| | | |
|---|---|---|
| Punainen | Vihreä | Sininen |
| Sor | Kesk | Şîn |
| | | |
| Keltainen | Valkoinen | Musta |
| Zer | Spî | Reş |
| | | |
| Oranssi | Violetti | Harmaa |
| Porteqalî | Mor | Gewr |
| | | |
| Vaaleanpunainen | Ruskea | Monivärinen |
| Pembe | Qehweyî | Pirrengî |
| | | |

**12.**

| | | | | |
|---|---|---|---|---|
|  |  |  |  |  |
| hattu | huivi | henkari | hame | sateenvarjo |
|  |  |  |  |  |
| takki | aluspaita | kaulaliina | alushousut | kravatti |
|  |  |  |  |  |
| saappaat | pipo | housut | kengät | paita |
|  |  |  |  |  |
| sukka | käsineet | laukku | silmälasit | mekko |

**13.**


korva
pää
suu
silmä
kurkku
nenä
vatsa
rinta
käsi
sormi
polvi
jalka

# Lînk

**Malperên webê yên zêdetir kêrhatî ji bo serlêdanê**



Ev modul lînkên hin malperên webê yên kifşe digire nav xwe ku dibe ji we re kêrhatî bin. Lê binêrin û bibînin ka hûn ê tiştekî balkêş ji bo xwendinê an jî çalakiyeke guncav ku hûn bikarin bikin peyde bikin.

**Di vê modulê de, hûn ê derbarê wan hîn bibin:**

- Lînkên malperên webê yên kêrhatî
- Agahiyên têkiliyê yên rêxistinên kêrhatî

**Derbarê vê modulê li navnîşana jêr bixwînin**
**mof.fi/sections/links/en**
**an jî koda QR a li jêr bidin diyarkirin**

**Vê modulê online di vê navnîşanê de peyde bikin**
**mof.fi/exercises/links/en**
**an jî koda QR a li jêr bidin diyarkirin**

# Xizmetên gel û agahdarî derbarê Fînlandê

| | |
|---|---|
| **EnterFinland**<br><br>www.enterfinland.fi | EnterFinland xizmeta online ya Dezgeha Koçberiyê ya Fînî ye Li ser EnterFinland hûn dikarin serlêdanê ji bo destûrên niştecîbûnê û hemwelatîbûnê bikin. |
| **InfoFinland**<br><br>www.infofinland.fi | InfoFinlandis xizmetek e ku agahiyan ji bo koçberan li Fînlandê bi gelek zimanan berdest dike. |
| **Kela**<br><br>www.kela.fi | Kela ew rêxistin e ku ji bo sîgorteya civakî li Fînlandê berpirsyar e. Li ser malpera webê ya Kela, hûn dikarin serlêdanê bikin ji bo berjewendiyên bêkariyê û yên din. |
| **Maahanmuuttovirasto**<br><br>www.migri.fi | Dezgeha Koçberiyê ya Fînî ew rêxistin e ku derbarê biryardayînên têkildarî niştecîbûn û welatîbûnê berpirsyar e li gel ê din. |
| **Perustietoa Suomesta -opas**<br><br>www.tem.fi/perustietoa-suomesta | Rêbernameya Bixêr Hatin Fînlandê. |
| **Matkahuolto**<br><br>www.matkahuolto.fi | Matkahuolto yek ji wan vebijarkan e ku hûn dikarin bi kar bînin ji bo cihveqetandina bilêtên otobêsê yên dûrahî-dirêj. |

| | |
|---|---|
| **Poliisi**<br><br>www.poliisi.fi | Polîsê Fînî belgeyên nasnameyê çap dike. Her wisa di bûyerên pêkhatina sûcekê de jî bi polîs re têkilî dikare bê çêkirin. |
| **Posti**<br><br>www.posti.fi | Li ser malpera webê ya Posti, hûn dikarin xizmetên ku Xizmeta Posteyê ya Fînî pêşkêş dike hîn bibin. |
| **Traficom**<br><br>www.traficom.fi | Traficom ew sazî ye ku li Fînlandê veguhastinê bi rê ve dibe.<br>Ew derbarê belgeyên ajotinê agahiyan dide we. |
| **Digi- ja väestötietovirasto**<br><br>www.dvv.fi/en/individuals | Dezgeha Xizmeta Daneyên Dîjîtal û Nifûsê berpirsyar e ji bo qeydkirina daneyên şexsî û agahiyên têkildarî zewac, cudabûn, rastkirina nav, û navnîşanan. |
| **Verohallinto**<br><br>www.vero.fi | Li ser malpera Rêveberiya Bacê, hûn dikarin karta bacê bistînin û agahiyên xwe yên têkildarî bacê kontrol bikin. |
| **VR**<br><br>www.vr.fi | Li ser malpera webê ya VR, hûn dikarin bilêtên trênê û yên din bikirin. |

| Kardarî û perwerdehî | | |
|---|---|---|
| **Suomen Ammattiliittojen Keskusjärjestö SAK: Xizmeta pêşniyardayînê ya mafên xebatkaran**<br><br>www.sak.fi/en/working-life/immigrants | Xizmeta pêşniyardayînê ya mafên xebatkaran ya bi navê SAK alîkariyê dide xebatkarên biyanî derbarê pirsên wan ên li ser kardariyê. | |
| **Opetushallitus**<br><br>www.opetushallitus.fi | Dezgeha Netewî ya Fînî ya Perwerdehiyê berpirsyar e ji bo pêşdebirina perwerdehî û hîndariyê, perwerdehiya zaroktiya pêş û xudankirin û hînbûna seranserê jiyanê, û her wisa pêşxistina navnetewîbûnê. Dezgeha Netewî ya Fînî ya Perwerdehiyê berpirsyariyên Wezareta Perwerdehî û Çandê yên têkildarî perwerdehiyê parve dike. | |
| **Opintopolku**<br><br>www.opintopolku.fi | Ev malpera webê agahiyan dide derbarê derfetên cuda yên perwerdehiyê. | |
| **TE-palvelut**<br><br>www.te-palvelut.fi | Ofîsa Kardarî û Pêşveçûna Aborî vê malpera webê pêşkêş dike da ku hûn tê de kar bigerin û agahiyên xwe yên têkildarî kardariyê rojane bikin. | |

| **Halxweşî û maf** | | |
|---|---|---|
| **Kanta**<br><br>www.kanta.fi | Kanta agahiyên derbarê qeydên we yên tenduristiyê dide. | |
| **Kuurojen liitto**<br><br>www.kuurojenliitto.fi | Saziya Fînî ya ji bo Kerran alîgiriya derfetên wekhev dike ji bo mirovên kerr. | |
| **Kynnys**<br><br>www.kynnys.fi | Kynns mafên nivîşkanan pêşde dibe. | |
| **Lyömätön Linja**<br><br>www.miessakit.fi/en/frontpage/lyomaton-linja-in-english/ | Ji bo mêr û jinan agahiyan dide derbarê astengkirina tundiya navmalê. | |
| **Näkövammaisten liitto**<br><br>www.nkl.fi | Rêxistinek e ku xizmet û xebatan dike ji bo mafên nivîşkanên çav | |
| **Pakolaisneuvonta**<br><br>www.pakolaisneuvonta.fi | Rêxistinek e ku şêwirmendiya fermî dide penaberan, penaxwazan, û koçberan. | |
| **Pro-tukipiste**<br><br>www.pro-tukipiste.fi | Rêxistinek e ku agahî û destegê dide qurbaniyên qaçaxtiya mirovan, û yên din. | |

| | |
|---|---|
| **Riku**<br><br>www.riku.fi | Rêxistinek e ku destegê dide qurbaniyên sûcê. |
| **Seta**<br><br>www.seta.fi | Seta rêxistinek e ku ji bo wekheviya mirovan dixebite bêyî ku meyla wan a cinsî an jî nasnameya zayendî bigire ber çav. |
| **Transtukipiste**<br><br>www.transtukipiste.fi | Navenda Destegê ya Navzayendî şêwirmendî û destegê pêşkêş dike ji bo kesên navzayend û yên din. |
| **Turvakotipalvelut**<br><br>www.turvakodit.fi | Di rewşên tundiya navmalê an jî rewşên nişkî, turvakotipalvelut maleke ewle pêşkêşî qurbaniyan dike. |
| **Tukinainen**<br><br>www.tukinainen.fi | Ji bo qurbaniyên tundiya cinsî destegê dide. |
| **Malbat, zarok, û ciwan** | |
| **Allianssi**<br><br>www.alli.fi | Agahiyan dide derbarê ciwan, mafê ciwanan, û çalakiyan li dar dixe li gel tiştên din. |
| **Mannerheimin Lastensuojeluliitto**<br><br>www.mll.fi | Agahiyan û xizmetan dide ji bo ciwan, zarok, û dêûbavan. Xwedî şaxên lokal e li gelek bajaran. |

| | | |
|---|---|---|
| **Pelastakaa Lapset**<br><br>www.pelastakaalapset.fi | Agahiyan dide li ser mafên zarokan. | |
| **Tyttöjen talo**<br><br>www.tyttojentalo.fi | Bi vê rêxistinê, keçikên navbera 10 û 29 salî dikarin destegê bistînin û dikarin beşdarî çalakiyan bibin li gel keçikên wek-xwe. Rêxistin xwedî şaxan e li seranserê welêt. | |
| **Väestöliitto**<br><br>www.vaestoliitto.fi | Agahiyan dide derbarê malbatan, têkiliyên malbatan û cinsiyet, û yên din. | |
| **Yê din** | | |
| **Monika-Naiset**<br><br>www.monikanaiset.fi | Xizmet û agahiyan dide bi taybetî ji bo jinên koçber. Her wisa xizmetên wan ên bingeh-online jî hene. | |
| **Pakolaisapu**<br><br>www.pakolaisapu.fi | Agahî û çalakiyan ji bo penaberan dide. Bipirsin ka gelo li herêma we çalak in. | |
| **Suomen Punainen Risti**<br><br>www.punainenristi.fi | Li seranserê Fînlandê xizmetên koçber-dost didin. Lêgerînê bikin ka şaxeke wan a lokal heye ku çalakiyan li herêma we dikin. | |

Maahanmuuttovirasto
Migrationsverket
Finnish Immigration Service

IOM
UN MIGRATION

ASYLUM, MIGRATION
AND INTEGRATION FUND

Supported by the European Union